ABORÎ

## Hingivê Çewligê li cîhanê bû duyemîn



**45**. Kongreya Mêşvanî ya Navnetewî ya Apimondiayê îsal li Stenbolê hat lidarxistin. Di vê kongreyê de, di nav 120 welat û 600 pêşbazan de, hingivê Çewlîgê bû duyemîn. Em di derbarê kongre û mêşvaniya Çewlîgê de bi mêşvanan re axivîn. **RÛPEL 09**

KIRMANCKÎ


## Dewro Klasîk de Kitabê "Tarîxê Kurdan"



**SESERRA** 9. ra hetanê ewro hetê Kurdan ra derheqê dewlet, mîrîtîye û eşîran de bi Erebkî, Fariskî, Osmankî û Kurdkî mensûrî zaf kêmî bî zî menzûmî ameyê nuştene. Nê nuşteyî de, kitabê ke dewro klasîk ra hetanê seserra 20. derheqê "Tarîxê Kurdan" de nusîyayê ameyê ercnayene. **RÛPEL 10**

EDEBIYAT

## Ez ji bo lehengên xwe giriyame!



**"TEKOŞER** bûm, mîlitan bûm, zîndanî bûm û bûm pêşmerge jî... ku di vê salê min de îro jî pêwîstî bi min û şerekî hebe, dibêjim qey ez ê dîsa vê yekê bikim.." dibêje Hesenê Metê, nivîskarê Kurd ê navdar. Hesenê Metê ji me re di derbarê serpêhatiya xwe, nivîskariya xwe , lehengên xwe û pêşmergetiya xwe de axivî. **RÛPEL 13**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 38
16- 22 COTMEH 2017
www.basnews.com




HEWL Û GEFÊN DORPÊÇÊ TÊKÇÛN R2

# GEFÊN 'CÎRANAN' LI HEWA MAN

**> TIFAQA LI DIJÎ KURDISTANÊ BISERKET**

Li Herêma Kurdistanê 25ê Îlonê tevî hemû zext, fişar û gefan referandûma serxwebûna Kurdistanê pêk hat û xelkê Kurdistanê bi dengekî bilind daxwaza serxwebûnê kir. Piştî ku referandûm bi serkeftî û di nava coşeke mezin de derbas bû, cîranên Kurdistanê Tirkiye, Îran û Îraqê dest bi gefxwarinên pêkanîna amborgoya aborî li ser Kurdistanê kirin. Lêbelê heta niha yek welat ji van jî di hewldan û gefên xwe de bi ser neketiye.

**> ÎRAN DI NAVA LÎSTIKAN DE YE**

Li gor agahiyên ku Basê ji deriyên gumrikî yên Kurdistanê bidestxistine, piştî referandûmê Îranê rêjeya îxracat û bazirganiya xwe ya li gel Kurdistanê zêde kiriye, lêbelê li pişt perdeyê jî daxwaz ji Tirkiyeyê dike ku îxracat û herka petrola Kurdistanê rawestîne. Li gor agahiyên Basê eger Îran û Tirkiye deriyên xwe bigirin, herdu welat jî salane 20 milyar dolar yanê mehane milyarekî 666 milyonan wê zirar bikin.

Zekeriya Yapıcıoğlu:

## An em ê bi hev re serbikevin, an jî em hemû dê têk biçin



R03

Serokê Partiya Dawaya Hur (HUDA-PAR) Zekeriya Yapıcıoğlu, di derbarê bertekên Tirkiyê yên li dijî referandûma serxwebûna Kurdistanê, gefên bikaranîna hêza leşkerî, îdayên 'Îsraîla duyem' û 'Kurdistan umetê dabeş dike' ji Heftenmeya Basê re axivî. Yapıcıoğlu dibêje ew rexne û gotinên Tirkiyê yên li dijî Kurdistanê ji ser Îsraîlê re ji dil nabînin ku yekem welat e Îsraîl nas kir û tu kêşeya wê jî li gel Îsraîlê tune ye. Her wiha dibêje; "An em ê bi hev re serbikevin, an jî em hemû dê têk biçin."



EKREM ÖNEN >02

Sîstema Tirkiye, Îran û Sûriye dibe eyalet piştre dibe otonomî û paşê?



HOŞENG OSÊ >03

Nivîs û Nasname



FIRAT CEWERÎ >07

EVÎN

ROJHILAT R05




Tayînkirina parêzgarên Kurd;

## "Ev ne reform e, tenê xapandin e"

Komara 'Îslamî' ya Îranê heftiya borî ji bo 4 bajaran, parêzgarên nû destnîşan kirin ku di nav de bajarên Kurdistanê Urmiye û Sine jî hebûn. Di dîroka Komara 'Îslamî' ya Îranê de yekem car bo 2 parêzgehên Kurdistanê parêzgarên Kurd hatin diyarkirin. Rojnameger Selîm Zencîrî di derbarê vê mijarê û rûdanên dawîn de ji Heftenameya Basê re axivî.

ROJHILATA NAVÎN R08



## Di patînaja Îraqê ya li hember Kurdistanê de Haşdî Şabî

Îran weke pasevanê Hîlala Şîe piştgiriya Haşdî Şabî dike. Haşdî Şabî li qadê weke rêxistineke paramîlîter tevdigere. Haşdî Şabî li qadê rêxistineke ku stratejiyên Îranê bicih tîne ye û tevlî gelek sûcan bûye. Di hundirê xwe de gelek rêxistinên tundrew dihewîne.

KURSIYA AZAD R12



## Berdewamiya têkoşîna serkeftinê

25 Îlonê careke din weke tîrêjên rojê rastiya jiyanê raxist ber çavan. Oldar û çepgirên netewên serdest, dewletên dagirker û gelên wan helwestên xwe yên rasteqîn nîşanî gelê Kurd dan. Ew hêz û qewet di bin kirasê "dostanî"yê de derdiket ser dikê, di pêvajoya referandûma serxwebûna Kurdistanê de me dît ku hemû gur, keftar û rovî ne!



EKREM ÖNEN

Sîstema Tirkiye, Îran û Sûriye dibe eyalet piştre dibe otonomî û paşê?

Guhertinên li cîhanê û bi taybetî li rojhilata nêzîk û navîn. Welatên ku Kurdistan perçekirine mecbûr dike ku tedbîran bigirin. Weke aşkereye metirsiya van welatan ya herî mezin avakirina dewleteke kurd li herêmê ye. Ev dewlet nikarin texmîn jî bikin ku ev dewlet wê di perçakî tenê de mehdûd be, an Kurdistaneke mezin e, an du perçê Kurdistanê tenê ye. Van tev rê li ber wan şaş kiriye. Jiber wê, jî niha ev hersê welat ji bo bikaribin hinekî kurdên dibin destê wan de ne bisekininin. Konjukturel wê pêşî li ser esasê coxrafî van welatan dabeşî eyaleta bikin ku hinek tiştên îdarî teslîmî eyaleta bikin. Heta dikarin meclîsa eyaleta jî ava bikin. Beriya demekê li Tirkiyê ji xwe munaqeşeyên weha dihatin kirin û di yasa bingehîn de ku vê dawiyê guhertin kirin sergirtîbe jî rê ji avakirina eyaleta re vekirine. Her weha Îran formel niha jî eyalet hene lê Îran ji niha de haziriyê dike ku mafê eyaleta zêde bike. Weke em dizanin di van demên dawî de cara pêşî waliyên kurd tayîn dikin. Ev sîstema eyaleta jî, ev hersê welat, ji bo haziriya eyaletên ser esasê etnîkî û olî ye (etnokonfeditsional). Van tiştan teva wê bikin ji bo ku rê li ber bigirin da kurd ji wan veneqetin, an hinek hêzên navnetewî kurdan ji wan veneqetînin. Ev dewletê Kurdistan perçekirine a niha jî bi dana otonomî heta federasyonê ji bo kurdan razîne, bes bi şertekî ku zirhêzên navnetewî garantiya ku kurd ji wan venaqetin an venaqetînin bidine wan, bi taybetî Rûsya û DYA. Lê weha diyare ne Rûsya ne DYA tu garantiya nadin wan. Ev hinekî serdema beriya şerê cîhanê yê yekemîn tîne bira mirov, weke peymana Sykes Picot di dema Rûsya Qeyserî, Brîtanya mezin û Fransa, Împaratoriya Osmanî perçekirin. Îro ev dewletê Kurdistan perçekirine, di ne diyariyek weha de ne. Ji bo çi ev welat weha gav bi gav dixwazin rê li ber maksîmûm daxwazên kurda bigrin? Rast e ew nikarin bi cih fam bikin Rûsya û DYA di derbarê kurdan de çi dixwazin, bes wan baş fam kiriye DYA û Rûsya dixwazin sînorê navbera van welatên Kurdistan perçekirine kurd kontrol bikin, ji bo kurd kontrol bikin. Divê kurd desthilat bin, formê desthilatiya kurdan (Otonomî, federasyon, serxwebûn) wê çawa be ew ji bo van welatên Kurdistan perçekirine cihê pirsê ye.

Ji ber çi lazim e kurd sînorê navbera van welatan kontrol bikin? Ji ber DYA û bi taybetî Rûsya metirsiya wan a sedsala pêşiya me ya herî mezin îslama radîkal e. Ev welatên Kurdistan perçekirine navendê xurtkirinê ne ji bo îslama radîkal. Ji bo rê li ber van welatên Kurdistan perçekirine bê girtin û zeîf bibin bes kurd bi vê rolê dikarin rabin. Ku Kurdistan bi formên cuda yên îdarî bibe herêma tampon di navbeyna van welatên Kurdistan perçekirine de. Bi referandûma serxwebûna Kurdistanê û işaretê ku rewşa Sûrî ber bi zelalbûnê de diçe, dibe sebeb ku van welatan di pirsa eyaleta de ecele bikin. Heta ber bi avakirina otonomî de biçin pirsgirêkên herema rojhilata nêzîk û navîn çiqas nêzîkî fînalê bibe ew ê ber bi federasyonê de biçin. Wê li federasyonê bisekine an na? Ji kurdan bêhtir bi DYA û Rûsya ve girêdayî ye. Aktîvbûna Rûsya van demên dawî di pirsa Kurdistanê de hîn bêhtir metirsî xistiye dilê van welatên Kurdistan perçekirine de. Weke aşkereye di vê hefta pêşiya me de 29ê cotmehê civîneke fireh di navbera dewleta Sûriyê, opozîsyona Sûriyê û kurdan de ji bo çareserkirina pirsa Sûriyê û yasayeke bingehîn a Sûriyê li basa Rûsya a Himîmîn tê amadekirin. (Hêjayî gotinê ye di civîna ASTANA de Rûsya reşnivîsek yasaya Sûriyê amade kiribû û di wê yasayê de mafê otonomiyê ji kurdan re rê dabû) Niha jî bi zora Rûsya wezîrê derve ê Sûriyê Muelim beyan da ku Sûrî amade ye bi kurdan re pirsa otonomiyê guftûgo bike. Paşê heyeteke PYD serdana Moskow kir beriya heyeta PYDê heyeteke ENKSê serdana Moskow kir. PYD piştî serdana Moskow diyar kir ku ew amade ne bi dewleta Sûriyê re dest bi guftûgoya bikin ji bo otonomiye. Bes hêjayî gotinê ye Rûsya ji PYD û ENKSê xwest ku Rûsya dixwaze bi delegasyoneke kurd a muşterek dan û standina bike. Niha top li seha kurda ne. Niha dervî kurdên Rojava kurdên, Rojhilat û Bakur jî divê zend û bendê xwe tev bidin û xwe ji van guhertina re amade bikin. Divê ji niha de amade bin, ne ku pêl hat xwe tev bidin wê demê dikare astengî derkeve. Her weha Başûrê Kurdistanê dikare bibe alîkar ji bo perçeyên Kurdistanê yê din ku xwe bidin ser hev ji bo ku ji rewşeke weha re xwe amade bikin. Kurd bi tevayî divê xwe ji guhertinên mezin re amade bikin. Heger kurd rewşa heye baş bixwînin fereca xêrê nêzîk e. Pêşiya xwe dîtin nîvê kare. Dewleta Tirkiyê, Îran û Sûriyê ji bo kurd ji wan veneqetin amade ne sîstema federasyonê jî qebûl bikin bi şertê hinek garantiya ku perçe nabin bidine wan. Perçebûn an nebûna wan heta radeyekê ji destê wan û kurdan jî derketiye. Gelo vê garantiyê kî dikare bide wan?

# Gefên li dijî Kurdistanê biserneketin







■ RÊZAN KARWAN

Li Herêma Kurdistanê 25ê Îlonê tevî hemû zext, fişar û gefan referandûma serxwebûna Kurdistanê pêk hat ku xelkê Kurdistanê bi rêje û dengekî bilind ji serxwebûnê re gotin, 'Erê'. Piştî ku referandûm bi serkeftî û di nava coşeke mezin de derbas bû, cîranên Kurdistanê Tirkiye, Îran û Îraqê dest bi gefxwarinên pêkanîna amborgoya aborî li ser Kurdistanê kirin. Lêbelê heta niha yek welat ji van jî di hewldan û gefên xwe de bi ser neketiye. Ji îro û pê ve jî eger Tirkiye û Îran bikevin nav ambargoyeke siyasî û aborî li dijî Herêma Kurdistanê, her du welat jî bi milyar dolaran wê bikevin nav zirarê.

**Îran di nav lîstikan de ye**

Li gor agahiyên ku Basê ji deriyên gumrikî yên Kurdistanê bidestxistine, piştî referandûmê Îranê rêjeya îxracat û bazirganiya xwe ya li gel Kurdistanê zêde kiriye, lêbelê li pişt perdeyê jî daxwaz ji Tirkiyeyê dike ku îxracat û herka petrola Kurdistanê rawestîne.

**Tenê firînên bo Kurdistanê hatine sekinandin**

Piştî encamdana referandûma serxwebûnê, Hikûmeta Navendî ya Îraqê û parlamentoya wê gef li Kurdistanê xwarin ku di nav wan de girtina deriyên sînorî, rawestandina hesabên bankayan û firokeyan bo balafirgehên li Herêma Kurdistanê. Lêbelê heta niha karîne tenê biryareke xwe bicî binîn. Ew jî rawestandina hatina firokeyan bo balafirgehên navdewletî Hewlêr û Silêmaniyê ye. Sedema vê yekê jî ji ber ku hêj ne dewleteke serbixwe ye, qada hewayî ya Kurdistanê li gor yasayên navdewletî di bin kontrola hikûmeta navendî ya Bexdayê de ye.

Tirkiye û Îranê, li dijî Herêma Kurdistanê her tim gefên pêkanîna dorpêçên siyasî û aborî xwarin. Di vê çarçoveyê de piştî referandûmê lijneyên ewlekariyê yên herdu welatan bi awayekî awarte civiyan û biryarên girtina deriyan li ser Kurdistanê û di warên cuda de biryarên pêkanîna dorpêçan girtin. Lêbelê heta niha van herdu welatan jî nekarîne ku van biryarên xwe dorpêçkirina aborî û siyasî bicî bikin li dijî Kurdistanê.

**Tirkiye nikare herka petrolê rawestîne**

Tirkiye di serî de eşkere kir ku ew ê herka petrola Kurdistanê rawestîne, lê ev gotinên Tirkiyeyê rastî bertekên welatên derdorê hat û dengê herî bilind li dijî Tirkiyeyê Rûsyayê derxist û red kir ku herka petrola Kurdistanê were rawestandin. Serokê Rûsyayê Vladimir Putin li ser gefên Tirkiyeyê wiha axivîbû: "Ne di berjewendiya tu kesî de ye ku petrol û gaza Kurdistanê rawestîne. Sekreterê Lijneya Wezîran ê Kurdistanê Dr. Amanc Rehîm, di rûniştina parlamentoya Kurdistanê ya 30ê Îlonê de wiha gotibû: "Petrola Kurdistanê di çaroçoveya peymana li gel Tirkiyeyê tu awayî di bin karîgeriya kêşeyên siyasî de namîne."

**Deriyên sînorî vekirî ne**

Jibilî sekinandina herka petrola Kurdistanê, di rojeva welatên cîran de girtina sînoran jî hebû. Van welatên ku gef li Kurdistanê dixwarin heta niha nekarîne vê daxwaza xwe jî bicî bînin û deriyan bigirin, ji ber ku di bazirganiya di nevbera aliyan de ne tenê Kurdistan, berjewendiyên wan jî pir zêde ye û nikarin bigirin. Ji xeynî gotin ku ji bo malên tên Kurdistanê ew ê gumrikên Îraqê ava bikin, lê Kurdistanê jî ragihand ku di rewşeke wiha de ew ê sînoran bigire û nekarîn vê yekê jî bikin.

**Civîna sêalî di navbera 'cîranan' da**

Pişt re Îraqê ji bo cezakirina Kurdistanê civîneke sêalî xwast. Li gor agahiyên ku Basê bi dest xistine, di civîna Îrak-Tirkiye –Îranê de, Tirkiyê pêşniyaz kir ku deriyê sînor yê Xabûr bigire li nêzî navçeya Silopiyê, li Ovakoyê deriyekî din vekin. Lê ji ber ku riya diçe vî derî di bin kontrola Hêzên Pêşmerge de ye û ji ber egera şer ev pêşniyaz jî bicî nehat. Herwiha di vê civînê de li gor zanyariyên berdest Îran û Tirkiyeyê daxwaz ji Hikûmeta Îraqê kirine ku bûdceya Kurdistanê bibire. Lê ji xwe ji sala 2014an û vir ve para Kurdistanê ya bûdceyê ku ji sedî 17an pêk tê, nade û biriye. Alîkariyên leşkerî yên bo Pêşmerge û mûçeyên karmendan nade. Herêma Kurdistanê tevî vê yekê jî bi îxracata petrol û gûmrûkên xwe li ser lingên xwe disekine.

**Xetên Înternet û telefonê yên Îraqê di Kurdistanê re derbas dibin**

Li hêla din Bexdayê gefên birîna xetên înternet û telefonan jî li Kurdistanê xwarin. Lê ev biryar jî ne xwediyê bingeha bicîbûnê ye. Ji ber ku xetên telefon û înternetê yên Îraqê di Herêma Kurdistanê re derbas dibin. Di kiryareke wiha de Kurdistan dikare van xetan bibire.

**Malîkî di nav hewldan û armancên qirêj de ye**

Li gor agahiyên ku Basê bi dest xistine, Serokê Partiya Dewa Nûrî Malîkî, ku ji ber bicînebûna gefên li hemberî kurdistanê di nava şikestineke mezin de ye, dixwaze bi riya gruba Ehli Heq ku di nav Heşdî Şabî de cih digire, êrişî Kerkûkê bike, agir berde bîrên petrolê û herwiha bi derxistina aloziyê li herêmê aboriya Kurdistanê têk bibe. Herwiha tê gotin ku Malîkî ji Ebadî daxwaz kiriye ku alîkariya dermanan a bo Kurdistanê bên birîn. Ji 10 nexweşxaneyên li Kurdistanê di 7an de tedawiya koçberên ku ji başûrê Îraqê hatine tê kirin.

**Rêjeyeke kêm a dermanan ji Îraqê tê**

Berdevkê Wezareta Tenduristiyê Dr. Xalis Qadir radigihîne ku Hikûmeta Îraqê beriya referandûmê bi rêjeya ji sedî 40-45 ew alîkarî birîne û wiha got: "Ji bo tedawiya koçberên di nexweşxaneyên Kurdistanê de gelek kêm derman ji Îraqê tên. Herêma Kurdistanê bi riya sazî dezgehan hewl da dabînkirina van pêdiwiyan dike."

**1800 kompaniyên Tirkiyê li Kurdistanê**

Li gor daneyên berdest Îran salene zêdetirî 5 milyar dolaran, Tirkiye jî salane zêdetirî 10 milyar dolaran îxracat û bazirganiyê li gel Kurdistanê dike. Li Herêma Kurdistanê 1351 fîrmayên ku di warên cur bi cur de kar dikin hene û herwiha dîsa di warên cuda de 1800 kompaniyên wê hene. Wezareta Pîşesazî û Bazirganiyê ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê, ragihand ku zêdetirî 500 fîrmayên Îranê li Kurdistanê xebatên xwe dikin. Ji sedî 25ê heşyayên derbasî Kurdistanê dibin bi riya deriyê Îbrahîm Xelîl derbas dibin. Eger derî bê girtin, Îraq wê 3 caran zêdetirî Kurdistanê rastî zirarê were.

**Herikîna petrola Kurdistanê bo cîhanê di bin misogeriyê de ye**

Di warê enerjiyê de di navbera Kurdistanê û Tirkiyê de li ser îxrackirina petrola Kurdistanê peymaneke bi temenê 50 salan heye. Her du aliyan jixwe ji bo herka petrola Kurdistanê, çêkirina xeteke din a boriyan qebûl kiribûn. Herwiha li ser îxraca gaza xwezayî jî peymaneke bi derbasdariya 26 salan heye. Bi temambûna xeta boriyan a nû tê pêşbînîkirin ku Herêma Kurdistanê wê zêdetirî 10 milyar metrekupan gaza sirûştî îxrac bike. Ev rêje wê di 2022an de bibe 20 milyar metrekup. Tirkiye ji sedî 37ê bazirganiya xwe ya giştî li gel Kurdistanê dike. Malên ku hildiberîne jî ji sedî 5.9an jî dişîne Herêma Kurdistan û Îraqê.

**Îran di rêza sêyem de ye**

Îran weke sêyemîn welatê ku îxracata xwe li gel Kurdistanê dike derdikeve pêş. 4 korîdorên bazirganiyê yên ne fermî û 3 deriyên fermî hene. Herwiha jibilî wê salane zêdetirî 2 milyon turîst di nevbera Herêma Kurdistan û Îranê de geştê dikin. Li gel Tirkiyeyê ev hejmar gelek zêdetir e.

**Bi girtina deriyan salane zêdetirî 20 milyar dolar zirar**

Li gor agahiyên Basê eger Îran û Tirkiye deriyên xwe bigirin, herdu welat jî salane 20 milyar dolar yanê mehane milyarekî 666 milyonan wê zirar bikin. Serokê Odeya Bazirganiya Hevpar a Îran – Îraqê, ragihand ku rêjeya bazirganiya Îranê ya li gel Kurdistanê beriya mehane 600 milyon dolar bû.Wî berpirsî hişyariyek jî da "Divê Tehran beriya ku biryaran bide, hinekî bifikire." Wezîrê Aboriyê yê Tirkiyeyê Nihat Zeybekçi ragihandibû ku rêjeya bazirganiya wan a li gel Kurdistanê nêzî 10 milyon dolaran e.





## Tirkiye tu caran deriyan nagire

Berpirsyarê Kompaniyên Biyanî yên li Herêma Kurdistanê Dilzar Îsmaîl ji Basê re ragihand ku ji sedî 44 ê kompaniyên li Kurdistanê yên Tirkiyeyê ne û ji sedî 11 jî kompaniyên Îranî ne. Îsmaîl herwiha diyar kir ku Herêma Kurdistanê van salên dawîn piştgiriyek daye welatên din jî ku rêje wiha ne: Tirkiye ji sedî 37.280, Çîn ji sedî 15.372, Îran ji sedî 12. 503 û Koreya Başûr ji sedî 6.844.

Endamê Lijneya Rêveberiyê yê Odeya Pîşesazî û Bazirganiyê yê Kurdistanê Baqî Mihemed Hadî, diyar kir ku eger deriyên sînor bên girtin, Tirkiye û Îran wê ji Herêma Kurdistanê zêdetir zirarê bibîne. Hadî herwiha eşkere kir ku berpirsekî di nava aboriya Tirkiyê de ji wan re ragihandiye ku Tirkiye tu caran deriyên sînorî nagire û ew gotin tenê ji bo siyaseta navxweyî tên kirin.

Li gor pisporê aboriyê Karwan Rehîm jî Îran ji ber bilindbûna rêjeya bazirganiya xwe ya li gel Kurdistanê nikare deriyên xwe bigire û ku niha hecima wê gihîştiye ji sedî 8an.

Gerînendeyê Giştî yê Bazirganiyê di nav Wezareta Bazirganî û Pîşesaziyê ya Kurdistanê de Newzad Edhem jî li ser vê mijarê diyar dike: "Li gor berê hecima bazirganiya Kurdistanê ya li gel Tirkiye û Îranê gelek bilind bûye û tenê di 3 mehên dawîn de ev rêje bi sedî 20 zêde bûye."

# Li Kurdistanê amadekariyên hilbijartinan berdewam in

**HÊMIN SALIH**

Li Herêma Kurdistanê piştî referandûma 25 Îlonê ku ji sedî 93ê xelkê Kurdistanê ji serxwebûnê re got 'Erê', niha jî amadekariyên hilbijartinên parlamentoyê tên kirin. Heftiya borî rojeva civîna Polîtburoya PDKê jî hilbijartinên parlamentoyê bûn. Berdevkê PDKê Mihemed Mehmûd piştî civînê daxuyanî da û destnîşan kir ku partiyên sîyasî di heman fikrê de ne ku hilbijartin di roja ku hatiye diyarkirî de bên kirin.

Li aliyekî amadekariyên hilbijartinê berdewam dikin û li aliyê din jî pêvajoya ku partî namzetên xwe diyar bikin jî dest pê kir. Lê belê deverên Kurdistanî yên li derveyî îdareya Herêma Kurdistanê ka wê beşdarî hilbijartinê bibin an na ne diyar e. Berdevkê PDKê Mihemed Mehmûd di derbarê amadekariyên hilbijartinê de ji Heftenameya Basê re axivî û ragihand: "Em dixwazin hilbijartinên Kurdistanê di roja ku hatiye destnîşankirî de bên kirin" Mehmûd amaje kir ku sîyasetmedarên Kerkûkî dixwazin bi riya Meclîsa bajêr beşdarê hilbijartinan bibin.




> Tê gotin ku YNK û Goran ji bo diyarkirina namzetan ne amade ne. Tê diyarkirin ku ji bilî taloqkirina hilbijartinan YNK bi PDKê re di mijara beşdarkirina Kerkûkê bo hilbijartina parlamentoyê di heman fikrê de ye.

**PDK û YNK li ser Kerkûkê xwedî heman helwestê ne**

Li gorî agahiyên ku Basê ji partiyên siyasî bi dest xistine, ji ber daxwaza beşdarîkirina Kerkûkê bo hilbijartinên parlamento û serokatiyê îxtîmal heye ku hilbijartin bên taloqkirin. Beriya niha YNK û Goranê daxwaz kiribûn ku referandûma serxwebûnê bê taloq kirin niha jî daxwaz dikin ku bila hilbijartinên parlamento û serokatiyê salekê bên taloqkirin. Tê gotin ku YNK û Goran ji bo diyarkirina namzetan ne amade ne. Tê diyarkirin ku ji bilî taloqkirina hilbijartinan YNK bi PDKê re di mijara beşdarkirina Kerkûkê bo hilbijartina parlamentoyê de di heman fikrê de ye.

**YNK: Me daxwaza taloqkirinê nekiriye**

Li hêla din Berdevkê YNKê Seidî Ehmed Pîre di civîna çapemeniyê de aniye ziman ku li Herêma Kurdistanê heta niha tu aliyan behsa bi awayê fermî taloqkirina hilbijartinan nekiriye û wiha got: "YNK jî bi tu awayî nexwest ku hilbijartin bên taloqkirin." Endamê Konseya Serokatî a PDK Adnan Kerkûkî ku li Kerkûkê ye derheqê hilbijartinan de ji Basê re axivî, "Eger Kerkûk beşdarî hilbijartinên parlamentoya Kurdistanê nebe ev wê bibe şaşîtiyeke mezin û siyasî. Ji Parlamento û Serokatiya Kurdistanê plana daxwaza fermî heye ku Kerkûk jî beşdarî hilbijartinan bibe."

**Goran: Em ê piştgiriyê bidin**

Endamê Komîsyona Yasaya Parlamentoya Kurdistanê û Parlamenterê Goranê Behar Ebdulrehman amaje kir ku ji bo Kerkûk beşdarî hilbijartinan bibe divê hemû partiyên siyasî li hev bikin. Ebdulrehman ji Basê re axivî û got, "Paşê di çarçoveya vê lihevkirinê de li Parlamentoya Kurdistanê zagona hilbijartinê divê pêk were. Ger ji bo ku Kerkûk beşdarî hilbijartinan bibe, hilbijartin bi qasî çend meh û di rojek diyarkirî de bê taloqkirin, em ê wek Goran piştgirî bidin ku Kerkûk jî beşdarî hilbijartinan bibe."



> "Eger Kerkûk beşdarî hilbijartinên parlamentoya Kurdistanê nebe ev wê bibe şaşîtiyeke mezin û siyasî. Ji Parlamento û Serokatiya Kurdistanê plana daxwaza fermî heye ku Kerkûk jî beşdarî hilbijartinan bibe."

## "Hemû amadekarî hatine kirin"

Berdevkê Lijneya Referandûm û Hilbijartinan a Kurdistanê Şivan Zirar jî got, "Bo hilbijartinên Parlamento û Serokatiya Herêma Kurdistanê hemû amadekarî hatin kirin. Lijne li gorî destûrê dikare li çar bajarên Herêma Kurdistanê hilbijartinan bike. Heta ku di destûrê de verastkirin neyê kirin li Kerkûk û herêmên Kurdîstanî yên ku li derveyî îdareya Herêma Kurdistanê mane hilbijartinan nikarin bikin."

# Di Eniya Tirkmenan de derza 'referandûmê'

Serokê Eniya Tirkmenan yê Şaxa Hewlêrê û Cîgirê Serokê Meclîsa Hewlêrê Azad Küreci ji ber piştgiriya referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê ji partiya xwe hat dûr xistin. Azad diyar dike ku ev biryar ne meşrû ye û dibêje wê partiyeke Tirkmenan ava bike.

**"Ev biryar ne rewa ye"**

Azad di derbarê vê mijarê de ji Basê re wiha dibêje;"Ji bilî dayîna dengê 'Erê' di referandûma serxwebûnê de, tu pirsgirêk di navbera min û partiya min de tune bûn ku ez bêm dûrxistin. Ji ber ku min piştgiriya serxwebûnê kiriye min sucdar dikin, ev biryar ne meşrû ye. Di 19ê vê mehê de cîvîna Meclîsa Parêzgehê hebû em ê li ser du rojevan biciviyana. Mijarek piştgiriya referandûmê bû ya din jî pîrozkirina aktîfkirina Parlementoya Kurdistanê bû. Helwesta Eniya Tirkmenan boykot bû û min jî bi vê biryarê dizanibû. Ez bi îradeya xwe ya şexsî beşdarî civînê bûm.

**"Ji ber dengê 'Erê' ez hatim cezakirin"**

Azad Küreci axaftina xwe didomîne û dibêje: "Dema em di civînê de bûn Serokê Partiya Eniya Tirkmenan Erşat Salihî li min geriya. Min jî bi rêya peyamekî jê re ragihand ku ez nikarim bibersivînim ji ber civînê. Wî jî bi rêya peyamê ji min pirsî gelo bê ez ê di referandûmê de bibêjim 'Erê' an 'Na' Min bersiva erênî dayê û min got ez ê bibêjim 'Erê' Wî jî got madem biryara te ev e divê tu îstifa bikî. Min jî got ku ev fikra min a şexsî ye û divê Tirkmen jî piştgiriya serxwebûna Kurdistanê bikin. Ji ber vê biryara min ez hatim cezakirin. Ji min xwastin di nava saetekê de îstîfa xwe bidim an jî gotin em ê te derxînin ji partiyê."

> Daxwaza sereke ya gelê Kurdistanê serxwebûn e û divê em Tirkmen jî piştgiriya vê yekê bikin. Herêma Kurdistanê mafê Tirkmenan misoger kiriye. Mafên Tirkmenan li gor ku metna temînatê ya ku mafê gelan dixe bin garantiyê de hatiye saz kirin. Lê tesîrek li ser Eniya Tirkmenan heye him ji derve û him jî navxweyî.

**"Divê Tirkmen piştgiriyê bidin serxwebûnê"**

Küreci dibêje, "Daxwaza sereke ya gelê Kurdistanê serxwebûn e û divê em Tirkmen jî piştgiriya vê yekê bikin. Herêma Kurdistanê mafê Tirkmenan misoger kiriye. Armanca partiya me jî ew e ku gelê duyemîn mezin ê Herêma Kurdistanê ku Tirkmen bigihîjin mafê xwe. Pêkanîna vî karî di nav partiyê de an jî derveyî partiyê ji bo me rumet e. Mafên Tirkmenan li gor ku metna temînatê ya ku mafê gelan dixe bin garantiyê de hatiye saz kirin. Lê tesîrek li ser Eniya Tirkmenan heye him ji derve û him jî navxweyî. Lê belê divê bê zanîn ku mafên Tirkmenan li gor çarçoveya Kurdistanê li Hewlêrê, li Kerkûkê jî weke hemû gelan hatine dayîn."




# Di nava Goranê de aliyek li dijî Omer Seîd Elî tev digere

Li gor çavkaniyên siyasî komeke di nava Goranê de li dijî Omer Seîd Elî tevdigere. Ew kesên xwedî fikrên tundrew niha li mala xwe rastî fikrên tundrewî tên.

Li gor aliyê mixalîf ê tundrew ê di nava Goranê de divê hemû biryar li Komîsyona Netewî ya Goranê bê nîqaşkirin û wisa biryar bê dayîn û çareseriya pirsgirêkan jî ew der be. Ev alî piştî biryara Omer Elî Seîd ku gotibû ez ê di referandûmê de bibêjim 'Erê' li hember îdareya Goranê dengê xwe bi tundî û bilind derdixîne.

**Di nava Goranê de gelek alî hene**

Li gor agahiyên ku Basê bidest xistine di nava Goranê de bi tundî li dijî helwesta Serokê Goranê derdikevin. Dibêjin ku helwesta wî li dijî biryara Komîsyona Netewî ya Goranê ye. Di komîsyonê de biryara ji 2/3 ew bû ku her kesek li gor xwe biryara 'Erê' an jî 'Na' bide. Li gor agahiyên berdest, helwesta Serokê Goranê ya 'Erê' rastî bertekên tund ê vê aliyê hatiye. Ev yek jî di navbera aliyan de derz firehtir kiriye. Bi taybetî jî di navbera YNKyên berê û ew kesên ku Newşîrwan Mistefa ji derveyî YNKê anîbû de mesafe gelekî vebûye. Di nava Tevgera Goranê de gelek alî hene. YNKyî, ew kesên ne YNKyî û Goranî ne, Kelarî, Germiyanî, Hewlêrî, dijberên PDKê û aliyên şexsî jî hene.

Şîrovekarê siyasî Heme Reşîd Here ji Basê re axivî. Here dibêje: "Aliyên di nava Goranê de ji bo dijberiya Serokê Goranê Omer Seîd Elî bikin dayîna dengê 'Erê' weke hincetê bikar tînin. Hin aliyên vê Tevgerê ji dijberiya Ala Kurdistanê, referandûmê bigirin ta serxwebûnê çi hebe dikin. Niha ev dijberî di nav mala wan de ye."


**"Serokê Goranê bi coş çû ser sindoqan"**

Endamê Damezirêner û Parlementerê Berê yê Goranê Adnan Osman di malperên nêzî Goran û YNKê de nivîsek nivisî û di nivîsa xwe de wiha dibêje: "Goran û Komel bi hêzeke xurt li hember referandûmê derket û xwestin ku bê paşxistin. Ji kêfxweşiya referandûmê li dijî helwesta xwe tev geriyan. Komîsyona Netewî ya Goranê di 24ê Îlonê de biryara xwe da. Piraniya wan li hember dengê 'Erê' bûn, kêm ji wan digotin 'Na' ev yek dihate wateya boykotê. Serokê Goranê ligel ku boykot nekir, bi coş çû ser sindoqan û dengê xwe da. Ev mafê wî yê yasayî ye. Lê belê weke Serokê Goranê rengê dengê xwe diyar kir ev yek jî li hember biryara Komîsyona Netewî ya Goranê bû û ji bo dengê 'Erê' propagandayek bû. Ez vê yekê weke binpêkirina biryara komîsyonê dinirxînim."

## "Komîsyonê biryara azadiya herkesî daye"

Serokê Firaksiyona Goranê li Parlementoya Îraqê Sîrwe Abdulwahîd di bernameyeke televizyona El Reşîd de wiha axivî: " Rojek beriya referandûmê Komîsyona Netewî ya Goranê civînekî pêk anî û di civînê de ji 48 dengan 33 kesan got divê 'Boykot' be. Paşî jî biryara azadiya her kesekî hat standin. Serokê Goranê ji me daxwaza dayîna dengê 'Erê' kir lê me qebûl nekir. Ji ber vê yekê jî serok ji bo me kesekî ji rêzê ye, berpirsyariya wî jî tune ye û ew dengê ku bikar aniye jî nêrîna wî ya şexsî ye ne ya Goranê ye. Ev fersenda dawî ya Serok bû."

Endamê Komîsyona Netewî ya Goranê û YNKê Berê Westan Mihemed li ser hesabê xwe yê Facebookê gotarek belav kir û tê de daxwaza rawestandina bertekên tund li hember Omer Seîd Elî kir û wiha domand: "Ji dema ku Omer Seîd Elî bûye serokê Goranê û vir ve rexneyên tund û neheqî lê tê kirin. Ew kesên guherînê dixwazin divê vê yekê nekin. Divê bi aqlê selîm tev bigerin û siyasetê bikin. Divê ji ber bikaranîna dengê 'Erê' bertekên şaş neyên nîşandin. Berpirsyariyeke wî ya mezin heye û komîsyonê biryara azadiya her kesekî dabû. Divê li gor vê li hember Omer Seîd Elî miamele bê kirin."




Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

Tayînkirina parêzgarên Kurd;

# ‘Ev ne reform e, tenê xapandin e’

**MURAT ÖZDEMIR**

Komara ‘Îslamî’ ya Îranê ku bi binpêkirina mafên Kurdan û netewên din di rojevê de ye, bo cara yekem ji bo du parêzgehên Kurdistana Rojhilat, parêzgarên Kurd tayînkirin.

Komara ‘Îslamî’ ya Îranê heftiya borî ji bo 4 bajaran, parêzgarên nû destnîşan kirin ku di nav de bajarên Kurdistanê Urmiye û Sine jî hene. Di dîroka Komara ‘Îslamî’ ya Îranê de yekem car bo 2 parêzgehên Kurdistanê parêzgarên Kurd hatin diyarkirin. Ji bo bajarê Urmiyeyê Muhammed Mehdî Şehriyarî ku di konsolxaneya Îranê ya li Almanyayê kar dikir hat tayînkirin. Yekem parêzgarê Urmiyeyê yê Kurd Şehriyarî, ji herêma Xorasanê ye û ji mezheba Şîe ye. Beriya niha bo Urmiyeyê bi piranî parêzgarên Azerî dihatin destnîşankirin. Ji bo bajarê Kurdistanê Sineyê jî parêzgarê Kurd Behmen Muradinya ku ji bajarê Bîçar e, hat diyarkirin.

Hikûmeta Îranê berî niha eşkere kiribû ku ew ê parêzgarên Kurd ên ji mezheba Sunne jî tayînî bajarên Kurdan bikin, lê heta niha parêzgarên hatine tayînkirin hemû ji mezheba Şîe ne.

Rojnameger Selîm Zencîrî ku geşedanên li herêmê ji nêz ve dişopîne, di derbarê vê mijarê û rûdanên dawîn de ji Heftenameya Basê re axivî.

**“Ev tenê xapandin e”**

Diyarkirina wan her du parêzgarên Kurd ku her du jî Şîe ne, di çarçoveya soz û gotinên Rûhanî de ne ku dema di gera serokatiya xwe û him jî ji bo gera din bibe serok dane de pêk hat.



### “Îran li ser siyaseta xwe ya înkarkirin û dijayetiyê berdewam e”

Îran li ser siyaseta xwe ya ewlehiyê berdewam e û di vê çarçoveyê de li Kurdan dinêre. Siyaseta wan a bindestgirtina Kurdan berdewam e, şexs biguherin jî hişmendiya wan nagûhere. Niha tê dîtin ku ew gotin hemû soz û peymanên vala bûn û tenê ji bo xapandina xelkê bûn û ji bo parastin û dirêjkirina temenê komara xwe bûn. Hewldan û karê wan parastina rejîma heyî ye ku li ser lingan bihêlin. Rojane xelk û kolber tên kuştin. Bi hincetên cuda Kurd tên darvekirin. Bikaranîna madeyên hişber û bêkarî zêde dibe, ev hemû girêdayî rejîmê ne û rejîmê li ser lingan dihêlin. Ji ber wê yekê diyarkirina du parêzgahên Kurd ku Şîe ne, nayê wateya reform û maneya guherîna siyaseta Îranê. Îran li ser siyaseta xwe ya înkarkirin û dijayetiya Kurdan berdewam e.

Tayînkirina du parêzgahên Kurd ku yekemcar e, taybet jî li parêzgaha Sinê ku jê re dibêjin Kurdistan, heta niha 18 parêzgar hatine diyarkirin, tenê yekem parêzgarê bo Sinê piştî şoreşê pêk hat, ew jî heta ku hikûmeteke demkî hat avakirin, lê piştî demekê ew jî ji kar dûrxistin û heta vê gavê berdewam ji deverên din, kesan tînin û bi ser Kurdan de disepînin. Ev tayînirin tenê xapandin û çavboyaxkirin e. Dixwazin bi vê yekê bibêjin me sozên xwe bicih anîn. Ew kesên hatine tayînkirin ne ew Kurd in ku xelk pê bawer be. Ev kes bi her awayî girêdayî rejîmê ne.”

**“Bi qestî van kesan tayîn dikin”**

Rojnameger Zencîrî di berdewamiya axaftina xwe de dibêje bi qestî van kesan tayîn dikin, li dijî Kurdan in û taybet kesê ku bo Urmiyê hatiye destnîşankirin û gotinên xwe wiha berdewam dike: “Van kesan bi qestî hildibijêrin û tayîn dikin ku baweriya van kesan sedî sed bi nîzama Îranê heye. Tu hesteke wan a netewî nemaye. Ev tişt ne reform e û tenê xapandin e. Rûhanî qala azadiya gotin û ramanê, nivîsê û gelek sozên din dabûn. Gelek soz dabûn xelkê Kurdistanê dema ku namzetê serokatiya Îranê bû. Lê yek soz jî bicî nehatiye. Taybet jî li ser mafên kêmnetewên olî û netewî gelek gotin hatibûn kirin. Tevî ku rejîm ji hişmendiya Şîetiyê dernakeve lê qala mafên her aliyan dihat kirin. Mixabin ev ji bo hilbijartinê bû. Rûhanî gelek soz dabûn xelkê Rojhilatê Kurdistanê, lê yek ji van jî pêk nehatin.”

# Di salekê de 135 Kurd hatin darvekirin

Hat ragihandin ku li Îranê di nava salekê de 135 Kurdên sivîl hatine darvekirin. Rewangeha Mafên Mirovan a bi nave Hengaw, li ser binpêkirinên mafên mirovan li Îranê raportek amade kirin. Di raporta rêxistina navborî de ku 10ê Cotmehê di Roja Têkoşîna li dijî Sizayê Mirinê de hat amadekirin, hat eşkerekirin ku li Îranê bi hincetên cuda 135 Kurd hatin darvekirin.

**Herî zêde ji Urmiyê**

L gor raporta Hengawê ji Kurdên hatine darvekirin 62 kes xelkê Urmiyê û 73 jî ji bajarên Kurdistanê yên din in. Her dîsa li gor vê raportê 8 darvekirin li qadeke ji xelkê re vekirî û 127 Kurd jî di zîndanên rejîmê de hatin darvekirin. Ji Kurdên hatine darvekirin 2 kes jin in û 133 jî mêr in.



**KADİR KARAGÖZ**



## Ayetullah Elî Xemaneyî çima şîreta hînbûna Tirkî kir

Nuçeyek di nava medya civakî û çapemeniya Tirk de teqiya, nûçeyeke bombeyî; Ayetullah Elî Xameneyî bangî jineke Tirk ango Azerî kir û got: “Zarokên xwe fêrî Tirkî bikin”. Çiqas barekî giran e ku li pêşiya navê mirov Ayetullah binivîse, sembola Xweda… Elî Xemaneyî tevlî sîfetê xwe yê qirase Ayetulah li hemberî kamera û mîkrofona çima ev tişt anî ziman? Ji zemanê desthilata Pehlewiyan û Şoreşa Îslamî ya Îranê û heta niha zimanê Azeriyan ticarî serbest nebûye heta Orhan Bursalı di meqaleyeke xwe ya di rojname ya Cumhuriyetê de hatiye çapkirin de vê mijarê bi serpêhatiyê xwe yên li Îranê teyîd dike. Fetisandina li ser zimanê Azeriyan bûye mijara Dr.Brenda Shaffer û rojnamevan Sevil Nuriyeva jî.

Li Komara Îslamî ya Îranê 77 ziman û zaravayên cuda hene, lêbelê zimanê fermî tenê Farisî ye, mafê perwerdeya bi zimanê dayîkê ji binî de tine ye. Niha li Îranê heta ku kovarek bi zimanê Azerî tê weşandin çavê Azeriyan derdikeve. Dewleta Îranê heremên ku Azerî lê dijîn kiriye sê wîlayetên cuda bo ku negihên serhev û dawa mafên xwe yên neteweyî nekin. Dewleta Îranê gelek caran ji bo ku aboriya Azeriyan lawaz bike kargeh û febrîkeyên heremên wan jî kişandiye bajarên Farisan. Ligel vê heqîqetê çima Ayetullah Elî Xemaneyî bal kişand ser vê mijarê? Her çiqas hinek kêm aqilê qaşo zanayên Tirk gotine ‘tiştekî eceb tine ye ji xwe Ayetullah Tirk e’ jî mesele ne ewqas biçuk û bisere ye. Berî her tiştî Ayetullah Elî Xemaneyî Şîeyê sîstema Tehranê ye, weke hemşeriyê xwe Elî Şerîetî yê civaknasê navdar ji Meşhedê ye û li bajarê Qum a navênda ilm û merîfeta Şîeyan ders dîtiye. Rêhevalê Xumeynî ye, heta dest û çavê rastê yê Xumeynî bû, di her pozîsyona berevaniya Dewleta Îranê de cih standiye û yekser zilamê dewletê ye.

Di vê şîreta fêrbûna zimanê Azerî de şîfreyên mezin hene, aqlê dewleta îranê têgihiştiye ku serxwebûna Kurdên Îraqê û bi taybetî jî dijbertiya serxwebûna Kurdên Îraqê ew ê wan û Kurdên nav xwe bîne dijî hev, ji bo vê îhtîmalê çav ji Azeriyan re dişikîne. Aqilê Îranê yê dewletê fehm kiriye ku Rojavayê dinyayê niyet kiriye ku wê ji hev bixe û îro hevalbendê Rojavaya dinyayê Kurd in, dîsa aqlê dewleta Îranê zane ku %40ê Îranê Azerî ne, dema ku Îran lawaz bibe ew ê jî dawa mafên neteweyî bikin, ji niha de hewl dide gaza Azeriyan bistîne.

Serpêhatiyen dewlet a Îranê gelek in, bi rastî dewleteke qedîm û têra xwe xwedan tecrûbe ye. Dema Komara Mehabadê serxwebûna xwe îlan kir (1946) di heman demê de Azeriyan jî bi navê Azerbaycan Milli Hükümeti li Tebrîzê serxwebûna xwe îlan kiribûn, ji ber îlana vê hikumetê qeyraneke mezin (Bohran î Azerbaycan) derketibû û dewleta Îranê neçar mabû artêşeke girîng bi ser Tebrîzê de jî bişîne. Weke me got Xemaneyî ji wezareta berevaniyê tê, hesasiyeta wî ya parastinê gelek e, ez bawer im bi vê hemleya xwe xwestiye ku li dijî şerekî navxweyî ya muhtemel dilê Azeriyan bistîne û wan li hember Kurdan bîkişînê ba xwe. Îran berê ber xwe fireh nake, neçar dilê Azeriyan bistîne. Ev dilxweşkirina Azeriyan ne bê wate û biçuk e, ew ê ev hemleyên dilxweşkirinê bidomin.

Ayetulah bi vê hemleya xwe dikare dilê Azeriyên nav xwe (Azerbaycana Başûr) bistîne an na, ne diyar e, lêbelê bi rastî dilê nijadperestên Tirk ên Tirkiye standiye. Tîştekî anormal tine ye ji xwe Ayetullah Elî Xemaneyî Tirk e…

Fişarên li ser Îranê zêde dibin;

# DYA, Supaya Pasdaran xist lîsteya dorpêçan



### Îran: DYA nikare peymana nuklerî betal bike

Serokê Îranê Hesen Rûhanî jî li ser biryarên nû yên DYAyê daxuyaniyek da. Rûhanî bertek nîşanî biryarên nû da û îdîa kir ku DYA nikare peymana nukleerî betal bike û got, “Çend welatan li gel hev ew rêkeftin îmze kirin. DYA nikare şerh deyne ser wê rêkeftinê û nikare tu xalekê lê zêde bike û nikare ti xalekê jê derxe.”

### Îsraîl: Dibe ku şer pêk were

Wezîrê îstîxbaratê yê Îsraîlê Yisrael Katz di derbarê stratejiya nû ya li dijî Îranê de ji çapemeniya Îsraîlê re axivî û diyar kir ku ew daxuyaniyên Donld Trump ên li dijî Îranê gelek girîng dibînin. Katz Îran şiband Koreya Bakûr û wiha axivî: “Dibe şer li dijî Îranê pêk were.” Serokwezîrê îsrîlê benyamîn Netanyahu jî li ser hesaba xwe ya medya civakî peyamek belav kir û got: “Daxuyaniyên Serokê DYA Donald Trump girîng in ji bo rûbirûbûna terora Îranê û rêxistinên terorî ku Îran piştgiriyê didê.”




Wezareta Xeznedariya Dewletên Yekgirtî ya Amerîkayê (DYA) bi awayekî fermî Supaya Pasdaran a Îranê xist nav lîsteya mueyideyan. Bi vê yekê re DYA wê li gor madeya terorê nêzikî Supaya Pasdaran bibe.

Serokê DYAyê Donald Trump heftiya borî stratejiya nû ya li ser rêkeftina nukleerî ya li gel Îranê ku 2015an hatibû îmzekirin, eşkere kir. Trump di axatina xwe ya ragihandina stratejiya nû de dîsa dûbare kir ew xerabtirîn peyman e ku li gel Îranê hatiye kirin û diyar kir ku wî ferman daye ji bo ku kêmasiyên di derbarê peymanê de bên jinavbirin û eger ev pêk neyê ew ê peymanê bidawî bike.

**“Îran piştgiriyê dide terorê”**

Trump di gotara xwe de diyar kir ku rejîma Îranê piştgiriyê dide terorê û di vê piştgirya xwe de berdewam e. Serokê DYAyê wiha got: “ Îran li gor peymana nukleerî tevnagere. Alîkariyên zêdetir dide terorê. Ez fermanê didim kongreyê û hevpeymanên me ku li ser vê yekê bixebitin.”

Trump ragihand ku ew êdî dê vê peymanê nedomînin û diyar kir: “Encama vê peymanê (nukleerî) tê wateya zêdetir tundî, teror û terora nukleerî ya Îranê. Fermanê didim, em kêmasiyên di vê peymanê de bigirin ku rejîma Îranê careke din nikaribe bi çekên nikleerî gefan li cîhanê bixwe.”

**DYA wê li gor madeya terorê serderiyê li gel Pasdaran bike**

Wezareta Xezînedariya DYAyê jî ragihand ku wan Supaya Pasdaran xistiye nav lîsteya dezgehên ku dorpêç û sizayên aborî bi ser de hatine sepandin. Herwiha DYA wê pêdeçûnekê di peymana nukleerî de bike û Trump ku peymanê weke xerabtirîn peyman dibîne, eşkere kir ku eger kêmasî neyên jinavbirin ew ê vê peymanê betal bikin.

Wezîrê Derve yê DYAyê Rex Tillerson berî niha eşkere kiribû ku tê çaverêkirin Wezareta Xezînedariya Amerîkayê, Supaya Pasdaran a Îranê bixe nav lîsteya rêxistinên terorî.

Sala 2015an di navbera 5 welatên endamên Konseya Ewlekariyê ya Netewên Yekgirtî û Îranê de peymanek hatibû danîn û li gor vê peymanê dorpêç û ambargoya li ser Îranê sist dibû. Serokê DYAyê Donald Trump beriya niha ev rêkeftin weke xerabtirîn rêkeftin bi nav kiribû û diyar kiribû ku ew ê wê peymanê betal bikin.

Lîstikvan Zelal Dere:

# Sînema qadeke azad e

GÖNÜL GÜN



Lîstîkvana Kurd Zelal Dere wek hunermendeke ciwan û serkeftî cihê xwe di lîstîkvaniyê de girtiye û tevî rêzafîlman, di du fîlman de jî lîstiye. Di heman demê de pêşkeşvanî jî kiriye. Dere ji navçeya Gimgima Mûşê ye û beşa Radyo, Sînema û Tv, li Zanîngeha Yakın Doğu ya Qibrisê xwendiye. Lîstîkvana ciwan destnîşan dike ku zêdetir wê bi xwe hewl daye ku xwe pêş de bibe û niha plan dike ku dest bi xwendina Hiqûqê jî bike.

**"Di nav malbateke hunerhez de mezin bûm"**

Lîstikvan Zelal Dere ji bilî perwerde û tecrûbeyên xwe yên lîstîkvaniyê dixwaze dest bi perwerdeya Hiqûqê jî bike û Dere ewilî sedema eleqeya xwe ya sînema û lîstikvaniyê wiha tîne zimên, "Dema ez piçûk bûm bi kekê xwe re diçûm sînemayê. Piştî ku fîlm xilas dibû em derdiketin, kekê min ji min dipirsiya û digot, 'te ji fîlmê çi fam kir?' yanî ez di nav malbatek û hawirdorekî hunerhez de mezin bûm, helbet bandora vê yekê hebû li ser min. Lê belê 'Çima Sînema?' Qadeke wisa ye ku bi saya sînemayê mirov behsa ziman, çand û erdnîgariya xwe dike. Sînema qadeke azad e û derfetên azadiyê dide mirov û sînema amûreke çandî ya dema me ya îro ye. Îro dema ku tu fîlmekî çêdikî, ev fîlm diçe welatên wisa dûr ku heta mirov navê wan welatan jî nizane. Lê bi saya wî fîlmî xelkên wan welatan ji çand û êşên te haydar dibin û heta wî fîlmî nêzikî xwe jî dibînin."

**"Rêzafîlma Can û Ceger gelek tişt fêrî me kir"**

Dere, cara ewil di rêzefîlmên bi navên 'Can û Ceger' û 'Sebra Malan' de dest bi lîstikvaniyê kir û wiha behsa van tecrûbeyên xwe dike, "Di van rêzefîlman de, kesên populer ku Kurdî nizanin nelîstin û paşê jî dublaja wan nehat kirin. Di wan rêzefîlman de herkes bi Kurdiya xwe û devoka xwe lîst. Ji çêkerê bigire heta lîstîkvanan herkes ji ber ku di rêzefîlmê de Kurdî diaxivî kêfxweş dibûn. Ew rêzefîlma me ya ewil bû. Min di vê rêzefîlmê de wek rola sereke dilîst. Me bi çavekî bazirganî rêzefîlmê nedihênirî. 'Can û Ceger' gelek tişt hînî me kir. Bi saya vê me zimanê xwe pêş de bir, em tam sê salan li Rihayê jiyan û me çanda wir nas kir. Wekî din Kurdên Başûr eleqeyeke mezin nîşanî me û rêzefîlmê didan. Paşê ez di rêzefîlma Sebra Malan de lîstim. Baş e ku min di wan rêzafîlman de cî girt û kêfxweş im. Heta divê ev cure xebat bila berdawam bikin û zêde bibin."

> Hunermenda ciwan Zelal Dere, bi lîstîkvaniya rêzefîlm û fîlmên sînemayê cihê xwe yê di qada lîstikvaniyê de girtiye. Dere, sînemayê wek qadeke gerdûnî û azad bi nav dike û dibêje " Sînema derfetê dide ku bi ziman, çand, û erdnîgariya xwe ve ber bi çav bî û behsa xwe û êşên xwe bikî."

**Dere di fîlman de jî dilîze**

Dere ji bilî rêzefîlman, di fîlmên sînemayê de jî lîstiye û herî dawî di fîlma bi navê 'Yarının Adı Başka' (Navê Sibê Cuda ye) de cih girtiye. Dere vê tecrûbeya xwe jî wiha vedibêje: "Dema me dest bi vî fîlmî kir baweriya me bi çîroka vî fîlmî hebû. Me bi prodîksîyoneke mezin dest bi kar nekir. Di fîlm de çîrok û êşên ku niha tên jiyîn hene. Fîlm behsa sînoran dike, yanî behsa kesên ku li sînoran tên kuştin, tên birîndarkirin û malbatên ku hatine perçekirin dike. Him senoryaya vî fîlmî bo min girîng bû him ez jî ji malbateke ku wek êşên wisa dijin têm. Baş e ku min di vî fîlmî de cih girt. Ev fîlm, fîlmê festîvalî bû û li gelek welatan hat weşandin."

**"Êşên civakî rengê xwe didin sînemaya xwe jî..."**

Dere li ser pirsa 'Gelo lazim e ku sînema behsa her tiştî bike û derdê sînemayê hebe an jî civakên ku wek me pirsgirêkên wan zêde ne dixwazin sînema her behsa êş û eleman bike?' wiha dibêje "Bi ya min ev yek li gorî civakan diguhere. Lê belê civakên ku wek me pirsgirêkên wan zêde ne û şer jî hebe, divê sînema bo vê civakê tiştan vebêje. Çimkî gava ku li cihekî şer hebe tu her behsa tiştan dikî. Di hatina dinyayê de jî di hezkirinê de jî tu nav şer de yî. Mirov, mirovan ji bo ku bijîn, dikujin. Bi ya te sînemaya vê civakê dê çawa bibe? Min dixwest ez wek Zelal Dere bibêjim ku çima fîlmên me yên evîn, romantîk û fîlmên bi vî rengî zêde tune ne! Em kêfa vê yekê nikarin bikin û dixwazin bila sînema êşên civakî vebêje. Ez bawer im bo fîlman serdem jî girîng e. Li ser meselê, di fîlmên Yılmaz Güney û Behmen Ghobadî de mîzah heye lê dram zêdetir rengê xwe dide fîlman."

**"Divê Kurd li Festîvala Fîlman a Navnetewî ya Dihokê xwedî derkevin"**

Dere diyar dike ku divê Kurd ji fîlman zêdetir, li xwedîorganîzasyonên sînemayê yên xwe derkevin û wiha pê diçe, "Yanî li organîzasyonên xwe xwedî derketin çi ye? Qesta min ew e û ez diçim Festîvala Fîlman a Navnetewî ya Dihokê dibînim ku ev festîval temsîliyeta fîlmên Kurdî dike û xwe di vî warî de pêş de biriye û ji ber vê jî girîng e. Çima ev yek girîng e? Civakek bêyî huner tu carî nikare hebûna xwe berdewam bike. Pêwîst e ku civaka Kurd behsa êş û elemên xwe bike çimkî em di nav şer de ne. Li ser meselê burjuvaziya Kurdan heye û him dewlemend û him jî xwende ne. Çima vê rewşê nabînin. Divê Kurd xwedî li Festîvala Fîlman a Navnetewî ya Dihokê derkevin. Û li hin deverên din jî organîzasyonên wisa hebe dê baş bibe."

**"Lazim e sînema tu tiştî piçûk nexe!"**

Dere dibêje ji bo min qet krîter an jî tiştekî din tune ye. Sînema tiştekî gerdûnî ye û wiha pê de diçe: "Di vê gerdûniyê de mirov bibe xaleke piçûk jî baş e. Lê belê ez li dijî vî tiştî me. Lazim e ku sînema tu tiştî piçûk nexe! Ger karektera ku ezê bilîzim wê çand, zimanekî biçûk bixe ez vê rolê nalîzim. Ez vê hesasiyetê bo hemû milet û zimanan dibêjim. Divê sînema xwedî zimanekî erênî be û her wisa tu fîlmên ku tundî û cudahiyê dixe nav civakan temen dirêj nebûne. Yanî her fîlm ne sînema ye her sîname jî ne fîlm e."



## "Sînema gerdûnî ye..."

Zelal Dere li ser avabûna sînemayê û derbarê sînemaya Kurdî de jî wiha dibêje," Li gorî min encamên sînemayê gerdûnî ne. Dema ku meriv bibêje 'sînemaya Kurd' gelo çiqas rast e! Çimkî îro di sînemaya Kurdî de derhênerên Tirk jî hene. Ez nikarim gotinên reş û spî bibêjim. Çima nikarim gotinên reş û spî bikim, sedema vê jî ew e ku her çiqas di navbera me de sînor hebin jî mirov dikare behsa sînemaya Rojhilata Navîn bike. Li ser meselê, niha bêyî çanda Îranî nikarî bijî. Li Tirkiyeyê jî tu nikarî bêyî çandên din bijî. Yan bav û birayê te koç kiriyê yan xizmekî te li aliyê sînor ê din e. Divê em ji sînoran vê fem nekin, 'sînor hene û miletên cuda hene. Na tiştek wisa tune ye' Jiber ku di navbera civakan de zêdetir danûstandin heye. Ji ber ku sînema gerdûnî ye mirov nikare cudahiyê bike. Dîsa li ser meselê dibêjin ku sînemeya Ewropa, Hînd û Amerîka ev navlêkirin çandî ye. Her wisa ger êşên te hevpar bin zimanên miletan yên cuda jî nabin asteng ji bo sinemayeke hevpar. Sînemaya Kurdî dikare çiqas ji Rojhilata Navîn cudatir bibe?"

## "Bavê min bo min bûye model"

Lîstîkvan Dere ji bilî lîstikvaniyê wêneyan jî xêz dike û wiha behsa eleqe û xebatên wênesaziyê dike, "Ez ji zaroktiya xwe û heta niha wêneyan xêz dikim û di mijara wênexêziyê de min bavê xwe ji xwe re wek rol-model wergirtiye. Çimkî bavê min jî wêne xêz dikir û ez wênexêziyê wek hobî dibînim yanî bo madiyatê xêz nakim. Zêdetir wêneyên surrealîst xêz dikim. Dibe ku li pêşerojê pêşengeha wêneyan jî vekim." Zelal Dere di derbarê xebatên xwe yên niha de jî wiha diaxive," Ez niha çêkeriya bernameyeke li ser geştûguzariyê dikim. Wekî din, senaryoyên ku ji min re hatine dixwînim û li ser wan dişuxilim. Her wisa wêne xêz dikim."

---

CESÎM ÎLHANÎ

# Huner, derbirîna êşan e

Hunermendê Kurd Serkan Kanîreş destnîşan dike ku wî îlhama xwe ya hunerê ji bilî êşên Kurdan ku li Kurdistanê dijîn, ji dengbêjiyê jî girtiye. Kanîreş ku dibêje ew ketiye bin bandora gelek hunermendên Kurd û heta niha albûmek û şeş jî klîbîn wî yên profesyonel hene. Her wisa ji pênciyan zêdetir besteyên Kanîreş hene û muzîkê jî bi xwe çêdike.

Kanîreş radigihîne ku li Tirkiyeyê pêkanîna hunerê zehmet e û dixwaze li Herêma Kurdistanê hunera xwe îcra bike. Hunermend Kanîreş di derbarê jiyan û hunera xwe de ji Heftenameya Basê re axivî: "Bi ya min gava mirovek tê dinyayê jixwe di mirov de qebîliyeta hunerê heye. Di hundirê mirov de azwer/hêrs, di dilê mirov de evîn her car heye. Bi demê re li ser axa xwe bûyerên ku dijî, bihîstin û şahidiya êş û zilma ku hatiya serê miletê te ev yek bo çêkirina hunerê dibe sedem. Huner derbirîna êşan e. Ez nêrîna "xwedê deng daye wî/ê" rast nabînim. Xwedê evîn û hezkirinê dide û bi ya min ev rast e. Paşê bi gotinê re di deng de reng çêdibe. Bi vî awayî li gor dilê xwe vê dengî bikartîne. Min ji biçûkiya xwe heta niha stran guhdar kirin, jiber kirin û hunera min wisa derket holê."

**Zêdetirî 50 berhemên wî hene**

Kanîreş tîne ziman ku gelek hunermendan guhdar dike û wisa behsa hunermendên ku ketiye bin bandora wan dike, "Gava ku salên dibistana seretayî ji dibistanê vedigeriyam malê, min Şivan Perwer, Hozan Diyar û Xelîl Xemgîn guhdar dikirin. Ji bilî van Tehsîn Taha, Yelda Abbasî, Mihemed Arif Cizrawî, Hozan Kawa, Delîl, Xêro Abbas, heta min hîphopa Kurd Serhadoyê jî guhdar kiriye. Min di sala 2012an de, albûmek çêkir. Di vê albûmê de du stran yên dengbêj Şakiro, du stran yên Seydayê Cîgerxwîn, stranek jî a Feqiyê Teyranê bû. Heşt stranên din jî yên min bûn. Ji bilî van tevî stranên li piyasayê zêdetirî pêncî gotin û muzîkên min hene."

**"Ez di hunerê de êşên gelê xwe dijîm"**

Serkan Kanîreş axaftina xwe berdewam dike û dibêje, "Di hunera min de tiştên ku hatine jiyîn û êş hene. Tiştên ku gelê me dijî, tesîr li ser min dike." Kanîreş diyar dike ku berpirsiyariya hunermendên Kurd ew e ku divê êşên miletê xwe bijîn, hîs bikin û binivîsin û wiha behsa hunera xwe dike, "Min xebera şehîtbûna Doktor Saît (Çürükayayê) ji televîzyonê bihîst. Min êşa vê dilê xwe de hîs kir û di nav saetekê de bo wî zêmarek çêkir. Wexta ku ez bo xelkê xwe besteyekê çêbikim êşa xelkê xwe jî hîs dikim. Pir caran çavên min tijî hêsir dibin. Min bo Şehîd Seîd 9 deqîqe zêmarek nivîsî lê belê belkî nikaribim vê besteyê di nav sed rûpelî de cî bikim. Ev qas bi qîmet e.

Qîmeta her şehîdê me bo min heman e. Carinan nikarim qala êşên me û derdê erdnîgariya me bikim, lê di hundirê xwe de vê ya dijîm û wisa van hestên xwe dinivîsim. Carinan stranên ku li ser eşqê dinivîsim jî ji tu kesî re nikarim vebêjim lê incax dinivîsim û bi tembûra xwe distrem. Evîna azadiyê, evîna welat û evîna bo jinekê heman tişt e. Ger kesek welatê xwe hezneke nikare jinekê jî hez bike. Ev yek bo jinekê jî derbasdar e. Hestên stranekê ku bo jinekê dinivîsim bi hestên stranekê bo Kurdistanê, eynî tişt e.



Heman hisiyatê dijîm. Heke li ser axa xwe azad nebî tu nagihêjî evîn û eşqê jî. Ez ne azad im. Sedema vê bê dewletbûn e. Em wek masiyekî ku tî maye ne."

**"Ez îlhama xwe ji dengbêjan digirim"**

Li ser pirsa, 'Tu dengbêjan guhdar dikî?', Kanîreş wiha bersivê dide, "Min piştî bîst saliya xwe denbêj guhdar kirin. Bi taybet jî Şakiro zêdetir guhdar dikim. Her wisa dengbêj Reşo, Huseynê Mûşê jî guhdar dikim. Li ser dengbêjiyê xebatên min jî hene. Min bi sedan stranên dengbêjiyê jiber kirine û carinan dibêjim. Li cem min qîmeta dengbêjiyê cuda ye. Dengbêjî qet kevn nabe û dengbêjî destan e. Ez îlhama xwe ji dengbêjiyê digirim."

**"Ji bo populîzmê hunerê îcra nakim"**

Kanîreş wiha behsa stranên ku bo peşmerge û şehîdên Kurdistanê nivîsiye dike, "Bo Kurd û Kurdistanê her kî canê xwe dabe ev hemû kes bo min bi qîmet in û leheng in. Seîd, Şêx Omer û şehîdên Kurdan ên din her hene û dê hebin. Ez bo wan çiqas binivîsim jî hindik e. Ji bo min ne girîng e ku li kîjan perçeyê Kurdîstanê ne û mensûbê kîjan tevgerê ne. Jixwe bo kesekî ku vî tiştî heq nake, berheman nanivîsim jî. Lehengên Kurd vê heq dikin. Wekî din ez bo populizmê hunerê îcra nakim. Dîsa ji bo ku stranên min werin gotin jî hunerê îcra nakim. Ez êşên gelê xwe di dilê xwe de hîs dikim û hunerê îcra dikim."

**"Mem Kurd û Zîn Kurdistan e"**

Hunermendê Kurd Serkan Kanîreş pirsgirêkên navxweyî yên Kurdan di stranên xwe de tîne ziman û ji dîroka Kurdan mînakan dide û wiha diaxive, "Pirsgirêkên Kurdan ên navxweyî ne meseleya niha ye û gava ku meriv dîrokê dinihêre dibîne ku ev rageşî her hebûne. Şêx Ehmedî Xanî beriya çend salan ev gotiye. Ehmedê Xanî, di berhema xwe ya Mem û Zînê de aniye ziman ku çima Kurd nebûne xwedan dewlet. Bi awayî çima yekitiya xwe pêk nayênin behsa vê mijarê dike. Heta di berhema xwe de dibêje Mem gelê Kurd e û Zîn jî Kurdistan e. Beko dijmin û fesad e û nahêle ku Mem(Kurd) û Zînê(Kurdistan) bigihêjin hev. Bi taybet niha ber bi serxwebûnê ve diçin di pêvajoya ku piştî referandûmê neyarên Kurdan li dijî Kurdan dibin yek divê Kurd hevûdu rexne nekin û yekitiya xwe pêk bînin. Ger em bibin yek emê zûtir bigihîjin Kurdistanê."

**"Sedema êşên me bê dewletbûn e"**

Li ser pirsa, 'Tu wek Kurdekî xwe çawa pênase dikî?' Kanîreş wiha bersivê dide, "Ez Kurdekî netewperwer im. Ez dibêjim bila hemû partî û tevgerên Kurdan yekitiya xwe pêk bînin. Ez dixwazim di bin siya dewleta Kurdistana Serbixwe de hunera xwe îcra bikim. Dê înşallah xwedê ji me re van rojan nesîp bike. Ger dewleta me hebe wê demê dê qîmeta pênûsa me jî hebe. Xerîb tên Kurdistanê û li ser Meleyê Cizîrê, Ehmedê Xanî lêkolînan dikin lê em Kurd vê nikarin bikin. Sedema vê jî bê dewletbûn e. Sedema êşên me jî bê dewletbûne.

## "Min bo pêşmerge 3 stran nivîsîn"

Kanîreş destnîşan dike ku li Herêma Kurdistanê bi awayekî azad dixwaze hunera xwe îcra bike. Di dema referandûmê (hê jî ) ji ber ku qedexeya derketina derve heye nikaribûye beşdarî xebatên referandûmê bibe û ji ber vê xemginiya xwe tîne ziman. Kanîreş diyar dike ku bo pêşmerge jî stranê ku nivîsîne hene û behsa van stranan dike, "Ez dixwazim li Herêma Kurdistanê hunerê îcra bikim, her xeyala min heye ku li wir bijîm. Ji ber ku qedexeya derketina derve ya min hebû ji loma dema referandûmê de neçûm Kurdistanê. Heta hin dostên ji wir xwestin û ez vexwendim ku bo referandûmê derkevim ser dikê lê belê ji ber ku qedexaya min hebû min nikarîbû biçûma. Dixwazim klîba sê stranên ku min bo pêşmergeyan nivîsîne li Herêma Kurdistanê digel pêşmergeyan bikişînim. Ez wek hunermendekî ji bo ku beşdarî xebatên referandûmê nebûme xemgîn im. "

---

# Nivîskarê me Hoşeng Osê mezintirîn xelata cîhana Erebî ya romanê wergirt

DARA BANDÎNÎ

Nivîskar Hoşeng Osê ku di heman demê de nivîskarê Heftenameya Basê ye mezintirîn xelata cîhana Erebî ya romanê wergirt. Osê wergirtina xelatê diyarî miletê Kurdistanê ku di 25ê Îlona 2017an de di referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê de gotin 'Erê' kir.

Îsal sêyemîn pêşbirka xelata romana cîhana Erebî li paytexta Qatarê li Dewhayê hat lidarxistin. Di pêşbirkê de 470 romanan cih girtin û tenê 5 ji wan romanan hatin hilbijartin û bi madî û manewî hatin xelatkirin. Ew pênc roman jî di heman astê de hatine nirxandin û tevî 60 hezar dolarê Amerîkî, mafê wergerê ji bo zimanên sereke yên cîhanê Fransî û Îngilizî hatin dayîn.

Di pêşbirkê de ligel romana Hoşeng Osê ya bi navê "Bargiraniya Yeqîniyê, Aloziya Pirsê û Dilbijokiya Xeyalan" romanên Semîha Xirîs, Şakir Nûrî, Mihemed Berade, Seîd Xetîbî jî hêjayî heman xelatê hatin dîtin.

Hoşeng Osê ji Heftenameya Basê re piştî diyarbûna xelatgiran, hest û nerînên xwe vegotin. Osê dibêje, "Ez serbilind im ku wek Kurdekî xelata herî mezin a romana cîhana Erebî werdigirim. Ez vê xelatê diyarî gelê Kurdistanê û ya Qetelonyayê dikim ku beriya heyamek niha ji bo azadiya xwe referandûma serxwebûnê pêk anîn."

## "Bargiraniya Yeqîniyê, Aloziya Pirsê û Dilbijokiya Xeyalan"

Romana xelatgirtî ya bi navê "Bargiraniya Yeqîniyê, Aloziya Pirsê û Dilbijokiya Xeyalan" sala 2016an li Beyrûda Libnanê ji Weşanên "Dar Sou'al" derketiye û ji 380 rûpelan pêk tê.

Naveroka Romanê jî wiha ye: "Kesê ku e-maila Hagob girtiye, ango "Hayder Loqman Sincarî" bersiva wî dide û bi dirêjahî jê re behsa destpêka Bihara Erebî dike bê ka çawan li bajarekî piçûk ji Tûnisê, M. Bouazîzî agir berdide canê xwe û wisa jî ew rê li pêşiya şoreşa belengazên cihanê, bi taybetî stûxwarên welatên Ereban vedike. Ew çar rûpelan ji helbesta helbestvanê navdar yê Ereb Abû Al-Qasim Alşabî jê re dişîne, çûnku ew bi hêvî ye ku agirê şoreşa Tûnisê dê li her derê belav bibe û guhertinên mezin bi xwe re bîne û pût û peykerên dîktator û zordaran birûxîne." Di hemû romanê de, Welat û Katrîn dê gelek caran hev bibînin û bi saya hevdîtinên wan, xwendevan dê beşên ji dîroka Ereban, Cihûyan, Rojhilata Navîn û heta ya cihanê jî nas bike. Tiştek tune ku ev her du leheng behsa wê nakin. Katrîn bixwe dîroka Belcîkayê, cihanê û tevliheviya danûstandinên di navbera jin û mêran de bigewde dike. Ew sê salî bû, gava şerê Cihanê yê Duyem dest pê dike û heta ku dibe 77 salî, Xwedê dizane wê çiqas mirov naskirine û li çiqas welatan geriyaye (Belcîka, Spaniya, Fas, Israil, Siwîsre, Amerîka, Tunis, Sûriye, Iraq, Yemen, Misir, Tirkiye...hwd). Ew hemû dinyayê û siyasetên wê, bi taybetî yên welatên Ereban li bin guhên hev dixîne, erê, ev jina 77 salî ku hîna hezkirina jînê û têkoşînê di dilê wê de pêl didin, lewma dibe piştgira şoreşa li dijî rêjîma Sûrî. "

Piştî DAIŞê rêxistinieke din a paramîlîter;

# Di patînaja Îraqê ya li hember Kurdistanê de Haşdî Şabî

MÎSTEFA PÎRAN



Haşdî Şabî ku bi armanca alîkariya artêşa Îraqê di şerê li dijî DAIŞê de hatibû ava kirin bi piştgiriya maddî manewî ya Îraq û Îranê bû hêzeke bi pergal.

Bê îstîkrariya siyasî û ewlekariyê ya Îraqê ya bi salan e didome di Hezîrana 2014an de piştî ku rêxistina terorîst DAIŞê Mûsil dagir kir derbasî asteke din bû. Piştî hilbijartinên 30ê Nîsanê 2014an de, ligel hemû bertekan jî Nûrî El Malîkî ji bo serokwezîriyê cara sêyem bi înyad û bi israr bû. Ev yek li hember avakirina hikûmetê bû pirsgirêk û vê yekê jî cihê DAIŞê sexlem kiribû. Artêşa Îraqê li hember pêşketina DAIŞê li ber xwe neda an têr nekir ku li ber xwe bide an jî tevgera bê dildarî bû sedem ku DAIŞ Mûsil, Anbar, Tîkrît, Diyala, Başûrê Kerkûkê, Bakur û Başûrê Bexdayê dagir bike û ji 3ê yekê Îraqê bixe bin serweriya xwe. Piştî ku DAIŞ him ji bo Îraqê him jî ji bo Rojhilata Navîn bû tehdîdeke mezin, li Îraqê dengeyên siyasî û ewlehî hatin guhertin, veqetînên nû, tifaq û aktorên nû dest birêvebirina siyaseta Îraqê kirin.

Ev rûdan polîtîkayên navxweyî yên Îraqê û destkeftiyên leşkerî, netewî, herêmî û navnetewî yên Îranê mijarên herî zêde dihatin nîqaşkirin bûn. Bi taybetî jî têrnekirina artêşa Îraqê li hember şerê DAIŞê an jî bê dildariya wan di şerê li hember DAIŞê de bû sedem ku rêxistinên paramîlîter derkevin holê. Piştî fetwaya pêşengê Şîe yê olî Ayetullah Alî El-Sîstanî “Cîhada li hember DAIŞê” bi piştgiriya hikûmetê re deriyê birêxistina Şîeyên Îraqê bi navê ‘Doza li hember DAIŞê’ vekiribû. Di vê xalê de Îrana ku bi gelek saîkan tevdigeriya li hember doza DAIŞê di nava axa Îraqê de ketibû rojevê. Di vê bereyê de ew kom û hêzên bi dildarî piştî fetwaya Ayetullah El Sîstanî civiyabûn, komên milîs jî di nav wan de cih girtibûn û bi rasterast bi piştgiriya Îranê, Haşdî Şabî (Komên Gel- Komên Xwebexş) li qadê serdemeke nû vekiribû.

Di bingehê de armanca Haşdî Şabî li hember şerê DAIŞê  piştgiriya Artêşa Îraqê  be jî, di şerê li hember DAIŞê de xwe li qadê weke hêza sereke nîşan da û bi piştgiriya maddî û manewî ya hikûmeta Îraqê bûbû rêxistineke bi sazî.

Lê belê di proseyê de milîsî berfireh bû ligel wê gelekî pirsgirêk jî anîn. Rikberiya di navbera hêzên cuda de, tevgera van hêzan li herêmên Sûne û ji aliyê fermandarên ku Îranê rasterast ew li Îraqê kirine berpirsyar bûne weke rêxistineke paramîlîter. Mijara sereke ya nîqaşê di dahatûya herêmê de Haşdî Şabî bû.

**Têkiliya Haşdî Şabî û Hikûmeta Îraqê**

Sedeme mezin a nîqaşên li ser Haşdî Şabî ew bû ku rêxistin bi piştgiriya Hikûmeta Îraqê û pereyên ku Îraqê dida wan li qadê tesîra xwe berfireh kir lê belê ev rêxistin ne bin serweriya Hikûmeta Îraqê de bû.

Li gor lêkolînan beşek ji gelê Îraqê Haşdî Şabî hêzeke li hember DAIŞê têdikoşe dibîne, Sûneyên Îraqê jî Haşdî Şabî hêzeke mezhebî dibînin heta hin aliyên Şîe yên Îraqê jî ji ber têkiliya Îranê Haşdî Şabî rexne dikin.

Di dema azadkirina Tîkrîtê ji destê DAIŞê de ji ber mafê mirovan bin pê kiribû ev rêxistin ji aliyê Neteweyên Yekgirtî ve jî hatibû rexnekirin.

Berpirsyarên Herêma Kurdistanê jî Haşdî Şabî weke tehdît dibînin, Serok Barzanî jî di nêrîneke xwe de bilêvkiribû ku piştî DAIŞ ji holê rabe Haşdî Şabî ji bo Kurdistanê weke DAIŞê metirsîdar e.

**Têkiliya Haşdî Şabî û Îranê**

Hêzên di nava Haşdî Şabî de ne bi piranî têkiliyên wan ligel Îranê hene. Li gor gelek pisboran rêxistin ji aliyê Sûpaya Pasdaran ve hatiye rêxistin, hêzên di bin serweriya Haşdî Şabî de ne jî serokê wan bi giştî ligel Tehranê û serokên olî yên bajarê Qûmê re di têkiliyê de ne. Bingeha van analîzan jî ew e ku endam û birêvebirên rêxistinê tim û daîm ziyareta Îranê dikin, pare û çekan ji Îranê tînin e.

Li gor nivîskarê pirtûka ‘Tsûnamiya Erep’ Basbous ku plana Îranê ya Hîlala Şîe di sala 2011an de nivîsandibû, Îran dixwaze bi destê Haşdî Şabî stratejiyên xwe yên herêmî pêk bîne. Li gor Basbous, Îran bi armanca vekirina korîdorekê ye ku ji ser Îraq, Sûriye û ji wir jî ji ser Lubnanê re xwe bigihîne Deryaya Spî. Haşdî Şabî jî weke bingeha vê planê tê qebûl kirin.

Dr. Yasîn Mahmood ji Basê re mijara Haşdî Şabî dinirxîne û wiha dibêje: “Haşdî Şabî ne yasayî û ne jî fermî ye. Haşdî Şabî ji aliyê Îranê ve tê piştgirîkirin da ku plana Hîlala Şîe pêk bîne. Him di warê çekan him jî di warê aborî de Haşdî Şabî bi rêk û pêk dike. Niha jî di mijara Kerkûkê de Îran wan birêve dibe. Îran ji wan re fermandariyê dike. Îran wan li hember Kurdan bikar tîne. Dewleta ku piştgiriya vê rêxistinê dike jî Îran e. Him di warê çekan him jî di warê aborî de Haşdî Şabiyê bi rêk û pêk dike. Ev rêxistin ji parastina Îraqê zaftir ji bo belavkirina mezheba Şîe li herêmê hat ava kirin. Ji aliyê din ve jî Îran ji valahiya ku li Îraqê derket holê sûd wergirt û ev rêxistin ava kir. Haşdî Şabî berjewendiyên gelê Îraqê nafikire. Tekane armanca wan pêkanîn û berfirehkirina plana Hîlala Şîe ye. Haşdî Şabî him li dijî Kurdan him jî li dijî Sûneyan hatiye ava kirin û ne qanûnî ye. Di nav xwe de disîplînîze nabe. Hikûmeta Îraqê ji aliyê mezheba Şîe ve tê birêvebirin, ev jî bi fikra Haşdî Şabî re paralel e. Ew dixwazin ku destkeftiyên Kurdan ji Kurdan bistînin.”

**Nêrîna Kurdan li rêxistinê**

Çawa Sûneyên Ereb û Tirkmen ji Milîsên Şîe bi metirsî ne Kurd jî wisa xwedî gumanê ne. Şer û pevçûnên di Mijdara 2016an de li Tuzxûrmatû ya Selahaddînê di navbera Haşdî Şabî û pêşmerge de hê jî di hêşê gel de ye. Kurd her demê bilêv dikin ku niyeta Milîsên Şîe ne baş e û nêzîkatiyeke pêşdîtin tevdigerin. Kurd dibêjin Haşdî Şabî bi daxwaza li herêmê di warê leşkerî de bibe xwedî hêz tevdigere û vê yekê jî bi destê Tirkmenên Şîe yên li Telaferê pêk tîne.

**“Rêxistineke paramîlîter e”**

Tê gotin ku Haşdî Şabî ji aliyê hêzeke herêmî ve tê birêxistin lê weke şebekeya suc tevdigere, kiryarên bê hiqûqî û dij mafê mirovan ên vê rêxistinê tim û daîm di rojevê de ne. Analîstê siyasî Enes Atila Pay dibêje, Haşdî Şabî dijminahiya Îraqê ya li hember Kurdan a dîrokê vedikole û axaftina xwe wiha didomîne: “Rêxistina Haşdî Şabî ku li Îraqê bi awayekî asîmetrîk hatiye avakirin ev yek jî bêhêzbûna dewleta Îraqê derdixe holê. Haşdî Şabî li hember DAIŞa ku di nava bloqa Sûne de derket, derketiye holê. Rêxistineke Şîe ye. Îran ji bo him Îraqê û him jî herêmê qontrol bike piştgiriya Haşdî Şabî dike. Piştgiriya lojîstîk dike, ev rêxistin wê li Rojhilata Navîn bibe sedema şer û pevçûnên mezintir. Haşdî Şabî belkî jî herî zêde ji bo Tirkiyeyê metirsî ye. Îhtîmal e ku Îran di dema ortê de Tirkiyeyê jî bike nav vê gengeşiyê û Haşdî Şabî ji bo vê armancê bikar bîne. Aqûbeta Hêza Operasyona Dîcleyê ya Malîkî li hember Pêşmerge divê ji vê rêxistinê re jî bibe mînak.”

Hêzên Paramîlîter, di bin siya dewletekê de weke nîv leşker tên tarîf kirin. Ji bo îstîhdamkirina sûcdaran an jî kar û berên dewletê yên li derveyî hiqûqê ji aliyê van hêzên paramîlîter ve birêve diçin. Dewlet jî bi vê niyetê van hêzan ava dikin. Pêşengê Olî yê Şîe yê Îraqê Mukteda es – Sadr li hember qetlîam û kuştina sivîlan a bi destê Haşdî Şabî bangî hikûmeta Bexdayê kiribû ku milîsên Haşdî Şabî belav bikin. Sadr ji Serokwezîrê Îraqê Haydar El Ibadî daxwaza belavkirin û beşdarkirina milîsên Haşdî Şabî nava artêşa Îraqê kiribû. Di axaftina xwe de Mukteda es-Sadr daxwaz ji berpirsyaran kiribû ku dest deynin ser hemû çek û cebilxaneyên di destê milîsan de. Mukteda es-Sadr di axaftina xwe ya rojek berê de wiha gotibû: “Divê çek tenê di destê dewletê de û di bin qontrola serokwezîr de bin.”

Haşdî Şabî bi modela Supaya Pasdaran a Mihafizê Şoreşa Îranê birêxistin dibe û li Îraq û Sûriyeyê bi tevahî di bin emrê Îranê de tevdigere. Rêxistin ji bo Îran li seranserê Îraqê serweriya xwe zexim bike dixebite. Di Berfanbara 2016an de li Parlementoya Îraqê weke saziyeke girêdayî serokwezîr hat qebûl kirin û statûya yasayî bidest xist. Milîsên Haşdî Şabî ji 16 welatan ji 100î zaftir çekên cûr bi cûr bikar tîne.



Îran weke pasevanê Hîlala Şîe piştgiriya Haşdî Şabîî dike. Haşdî Şabî li qadê weke rêxistineke paramîlîter tev digere. Haşdî Şabî li qadê rêxistineke ku stratejiyên Îranê bicih tîne ye û tevlî gelek sûcan bûye. Di hundirê xwe de gelek rêxistinên tundrew dihewîne.



Di bingehê de armanca Haşdî Şabî li hember şerê DAIŞê  piştgiriya Artêşa Îraqê  be jî, di şerê li hember DAIŞê de xwe li qadê weke hêza sereke nîşan da û bi piştgiriya maddî û manewî ya hikûmeta Îraqê bûbû rêxistineke bi sazî.

## Hêzên di nav Haşdî Şabî de

Zêdetirîn endamê Haşdî Şabî Şîe bin jî di nav rêxistinê de milîsên Sûne jî cih digirin.

Li gor Kovara Economist ku rastiya wan nehatiye pesend kirin di nava Haşdî Şabî de 120 hezar Şîe, 16 hezar milîs jî Sûneyên Îraqî hene.

Hin daxûyanî hene ku li gor wan daxûyaniyan hejmara van zaftir jî endam hene.

Komên di nav Haşdî Şabî de derdikevin pêş ev in: Koma Bedir, Asaib Ahl El-Hak, Tugayên Aşitiyê Barış (Hêza Mukteda El Sadr), Tugayên Hîzbûllahê, Tugayên Seyyid El Şuhada, Kataib El İmam Ali, Ebu El-Fadl Hêza El-Abbas, Harakat Hizbullah El-Nucaba.

Di nav Haşdî Şabî de komên ji Tirkmenan jî pêk tên hene.

## Sucên ku Haşdî Şabî kiriye

Endamên rêxistina Haşdî Şabî li sivîlan îşkence dikin, bêyî lêpirsînê înfaz dikin û gelekî sûcê şer dikin. Îdareya Bexdayê çavê xwe ji van sûcan re digire. Haşdî Şabî qurbaniyên xwe li malên wan, li cihên karê wan, hetta li kampên xwe sipartinê de an jî li baregehên leşkerî yên sikakan jî bindest dike. Bi piranî van qurbanî û girtî demekê di zindanan de dimînin û paşê jî mirî tên dîtin. Bi hezaran kes jî piştî hatine girtin û di ser girtina wan de bi mehan dem derbas bûye jî aqûbeta wan nayê zanîn. Saziyên navnetewî di raporên xwe de tespît kirin ku Haşdî Şabî li Îraqê bi niyeta întîqamê êrîşê dibe ser Erebên Sune û hemû pêkhateyên din. Ev sûc jî bê ceza dimînin.

## Provakasyona Haşdî Şabî li Kerkûkê

Di 13ê Cotmehê de milîsên Haşdî Şabî êrîşa bi topên hawanê birin ser taxên ku Kurd û Tirkmen lê dijîn. Li gor agahiyên Qaymeqamê Xurmatûyê Şelal Ebdul daye Basê, Haşdî Şabî li Xurmatûyê çend gavên provakatîf avêtin, sengerên Pêşmerge, ofîsên YNK û PDK û li taxên ku Kurd û Tirkmen lê dijîn teqe pêkanîn.

Qaymeqamê Xurmatûyê Şelal Ebdul  dibêje: Doh bi şev saet derdora 23:00an endamên Haşdî Şabî bi motoran bombeyên destan avêtin sengerên Pêşmerge. Pêşmerge da pey wan lê ew zeft nekirin. Doh bi şev bi hawan û çekan êrîşî gelek deveran kirin.”

Qaymeqamê Xurmatûyê Şelal Ebdul dibêje ku Haşdî Şabî li herêmê bi niyeta derxistina gengeşî û pevçûna ye û wiha didomîne: “Pêşmerge û hêzên asayîşê bi aqlê selîm tevgeriyan û rê li ber provakasyoneke mezin girtin. Pevçûna bi koma Bedir a girêdayî Haşdî Şabî re 4-5 saetan berdewam kir û li ser daxwaza lihevhatinê pevçûn û şer rawestiya. Di şer û pevçûnan de Pêşmergeyek û 3 endamên Haşdî Şabî birîndar bûn.”

# Hingivê Çewligê li cîhanê bû duyemîn

**BENGÎ BAWEŞAN**

Hin bajar hene bi xwezaya xwe balê dikişînin û yek ji van bajaran Çewlig e. Bi saya xwezaya Çewligê ya hêşîn û curegiha û kulîlk, li her deverên vî bajarî mêşvanî bi awayekî tê kirin û hingiv li vî bajarî zêdetir çêdibe. Wekî din,

Di navbera 29ê Îlonê û 4ê Cotmeha 2017an de, li Stenbolê 45. Kongreya Mêşvanî ya Navnetewî ya Apimondiayê hat lidarxistin. Ev kongre ji sala 1890an û vir ve çar salan carekê li welatekî tê lidarxistin û ya 45. jî li Tirkiyeyê hat kirin. Di vê kongreyê de, di nav 120 welat û 600 pêşbazan de, hingivê Çewligê bû duyemîn. Mêşvan Bilal Salcı ji Heftenameya Basê re di derbarê vê kongre û mêşvaniya Çewligê de axivî.

"Li Çewligê mêşvanî ji zû ve tê kirin"

Mêşvan Bilal Salcı ku ew bi xwe ev 8 sal in karê mêşvaniyê dike, dibêje ji ber hezkirina mêş û xwezayê dest bi vî karî kiriye. Salcı dibêje mêşvanî li Çewligê ji zû ve tê kirin û heta sed sal û dibe ku ji sed salî zêdetir, mêşvanî tê kirin û wiha pê de diçe, "Ji ber ku xwezaya Çewligê hêşîn û curegiha û kulîlk hene, ev yek jî dibe sedem ku li her deverên vî bajarî mêşvanî bê kirin û hingivên bi qelîte jî bên bi dest xistin. Berê hema gelek malbat bo xwe mêşvanî dikirin û bi qasî 5-10 kovan hingiv datanîn. Lê van 40 salên dawîn êdî mêşvanî ji bo bazirganiyê tê kirin. Li cem me avûhewa zû diguherê û lewma mêşvan di meha Gulanê de li deştan in û di meha Hezîranê de jî kovanên xwe hildidin derdikevin zozanan. Herî dawîn derdikevin bilindahiya 2200-2500an. Em di nav 350 rojan de amadehiyan dikin û di nav 15 rojan de jî hingiv çêdibe. Ev amedehî çi ne? Piştî ku zivistan xilas bû û bihar hat mêşvan amadekariyê dikin ku mêşan xurt bikin. Niha bo tendurîstiya mêşan paqijî pir girîng e û ji loma divê kovanên mêşan baş bên paqijkirin. Bi saya vê paqijiyê mêş xurt dibin. Mêş jî bi hatina biharê re dixebitin û zêde dibin. Ji ber ku mêşek di nav salekê û dema hasada hingiv de incax bi qasî kevçiyekî çayê hingiv çêdike û nîvê wê dixe û yê mayî jî dihêle li nav kovanan. Her wisa hemû mêş di nav kovanan de naxebitin hinekên wan jî derveyî kovanê kar dikin. Ji ber van sedeman divê hejmarên mêşan zêde be û peywira mêşan yên di nav kovanê de jî cuda ne. Ji ber ku emrê kulîlkekê 15 roj e mêş jî di nav 15 rojan de hingiv çêdikin. Di vê wextê de mêşvan li hêviya çêkirina hingiv disekinin. Mêş nema hingivê hildidin û dikin hilm û hilmê di nav kovanê de di astekê de dihêlin. Êdî dema hesadê hat mêşvan ji mêşan hingiv digirin. Em jî vê yekê re 'dotina hingiv' dibêjin."

> Hingivê Çewlîgê di 45. Kongreya Mêşvanî ya Navnetewî ya Apimondiayê de ku 120 welat û 600 pêşbaz (nîmûne) beşdar bûbûn de bû duyemîn. Mêşvan Bilal Salcı dibêje, " Me dizanîbû hingivê Çewligê bi qelîte ye lê bi vê yekê re cardin hat dîtin ku hingivê me bi rastî jî bi qelîte ye."

"Hingivê bi qelîte, salê carekê çêdibe"

Salcı amaje dike ku li Çewligê herî dereng di 30î Îlonê de hingivê kovana reş tê bi dest xistin. Ev cure hingiv ê herî bi qelîte û tabî ye. Çimkî him ji ber ku mêşan ji cure kulîlkan polen berhev kirine û qelîteya polenan jî baş e. Him jî ji ber ku hingiv di nav wexteke dirêj de bi hemdê xwe çêdibe. Ev yek derfetê dide mêşê ku mêş çiqas di nav kovanê de bixebitin ew qas hingivê baş çêbikin.

Salcı axaftina xwe wiha berdewam dike, "Ji ber ku di piyasaya mêşvaniyê de kontrol nayên kirin û ev yek jî dibe sedem ku hingivên bêqelîte çêbibin. Mirov bikaribe hingivê bi qelîte çêbike divê şekir û tiştekî din nexe nav hingiv. Cihên ku derfetên çêkirina hingiv ne baş bin, yanî xweza ji aliyê giha û kulîlkan ve ne evqas dewlemend be, li van cihan ji bo ku hingivê zêde bi dest bixin hin tiştan dikin. Hin mêşvan diçin dema ku kulîlk bo çêkirina hingivê musaîd e şekir didin mêşan. Vê carê mêş him stoka şekir dikin, him jî bo hingiv nektarê ji kulîlkan berhev dikin. Yanî dewsa 10 kîloyan dixwazin 20 kîlo hingiv bi dest bixin. Bi malîyeteke hindik mêşvaniyê dikin û ev yek jî dibe sedem ku li Tirkiyeyê hingiv erzan bê firotin. Hingivê bi qelîte salê carekê yê ne bi qelîte jî salê 4-5 caran çêdibe. Lê belê tiştekî wisa heye ku divê baş bê zanîn; Niha di payîz û bihara zû de polen hene lê di xwezayê de nektar yanî ava bi şekir di nav kulîlkan de tune ye û di ser de jî polen ziwa ne. Ev yek bo mêşan ne baş e. Vê demê, bi qasî îskana çay ava bi şekirê helandî ji sê rojan carekê didin mêşan da ku mêş xurt bibin. Her wisa dema ku li payîzê ger bê dîtin mêş nektarê nikaribin peyda bikin wê demê jî ji bo ku mêş di zivistanê de bê quwet nemînin, şekir bo mêşan tê dayîn. Yanî dayîna vê ava bi şekir, di wextê hasada hingiv de nayê kirin. Kîjan mêşvan be jî bi mecbûrî vê dike. Em vê yekê 'xwedîkirina bihara pêşwext' bi nav dikin. "



## Hingivê Çewligê di nav 120 welatên cîhanê de bû duyemîn

Bilal Salcı li ser 45. Kongreya Mêşvanî ya Navnetewî ya Apimondiayê ku hingivê Çewligê tê de bû duyemîn jî wiha dibêje; "Ji Çewligê ji heft zozanan heft nimûne hingiv beşdarî pêşpirkê bûn. Ji van heft nimûneyan yek ji ber qelîta xwe di nav 120 welat û 600 pêşbazan de, bû duyemîn. Ji me re madalyaya zîv û plaket dan. Bi rastî ev paye bo me gelek girîng e çimkî ev kongre, kongereyeke muhîm û kevn e û ev paye jî li her deverê cîhanê derbasdar e. Jixwe me dizanî bû hingivê Çewlîgê bi qelîte ye lê bi vê yekê re cardin hat dîtin ku bi rastî hingivê me bi qelîte ye."

Kîloyek hingiv bi 150 lîre ye

Mêşvan Salcı diyar dike piştî ku hingiv ji kovanan hat derxistin divê hingiv di pîleya 5 û 20 germahiyê de bê mihafezekirin. Di bin 5 pîleyê de hingiv diqerise û ger germahî ji 20 pîleyî zêdetir be hingiv zêde xira dibe. Her wisa, divê li malê di sarincan de hingiv neyê mihafazakirin di germahiya odeyan de ev yek bê kirin.

Salcı di derbarê biha û rewşa firotina hingivê Çewligê de jî van agahiyan dide, "Kiloya hingivê kovana reş zêde biha ye. Bi rastî bo kîloyek hingiv ji kîsê me 80 lîre diçe. Lê em wek mêşvan ji bo ku derfetên xelkê me zêde ne baş in hingiv hinekî erzan difiroşin. Me kîloya hingiv ji 200 lîreyî daxist 150 lîreyî. Wekî din ji ber ku hingivê kovana reş gelek bi qelîte ye ji loma piranî di nav Çewligê de tê firotin. Dixwazim bi riya rojnameya we bangî karsazên me yên başûrê welatê me bikim. Ger karsaz bixwazin hingivên bi qelîte bikirin em dikarin bikevin têkiliyê. Dîsa em dikarin ji wan re hingivan paket bikin û bişînin."

# Tameke Wolkanîk: Birincê Qerecdaxê

**BILAL ADLIĞ**

Çiyayê Qerecdaxê ji dîroka qedîm ve ji bo kesên li der û dora wê dijîn re bûye perestgeh û bingeha debarê. Piştî zuwabûna wolkanên wê, axa der û dora wê bi mîneralên xwe pir bi dewlemend bû. Li herêma Qerecdaxê gelek cûre berhemên cotkariyê tên çandin. Herçiqas Qerecdax ji bo koçeriyê bi nav û deng be jî çandina birincê li wê herêmê gelekî hêsan e û pir berhemdar e. Li Diyarbekira Bakurê welêt gelek gundî û cotkar bi saya vê herêmê û berhemên wê debara xwe dikin. Meha cotmehê li seranserê Kurdistanê meha cotkirina erd û zeviyan be jî li herêma Qerecdaxê dema dirîtina birincê ye. Birincê Qerecdaxê di vê mehê de tê dirîtin û ji bo fabrîqeyan derdikeve rê. Weke hûn jî dizanin em her heftî berê xwe didin dewlemendiyeke erdnîgariya Kurdistanê û dengê cotkar û gundiyên Kurdistanê digihîjînin we. Vê heftiyê jî em ê we bibin der û dora çiyayê Qerecdaxê ku ji gelek dengbêjan re bûye gencîne, ji cotkaran re jî bûye îdareya jiyane rojane. Em bi Îhan Avcı re (xwediyê Emin Karacadağ Pirinç) di derbarê taybetmendî, çandin û firotina birincê Qerecdaxê de axivîn.

**"Birincê Qerecdaxê berhemdar e"**

Îlhan Avci taybetmendiya birincê Qerecdaxê wiha tîne ziman: "Sedema tercîha birincê Qerecdaxê ew e ku li gor birincê Baldo û Osmancikê gelekî berhemdar e. Dema hûn birincê xwe dipijînin ji birincê baldo û osmancikê ji îskanekî îskanek derdikeve lê dema hûn yên Qerecdaxê çêdikin ji îskanekî 3 îskan derdikevin. Bi saya çandin û firotina birincê Qerecdaxê gelek malbat debara xwe dikin. Ji ber vê jî birincê Qerecdaxê gelekî bi qîmet e."

**"Bi taybetî Kurd bikartînin"**

Avci di derbarê xwarin û firotina birincê Qerecdaxê de wiha dibêje: "Birincê Qerecdaxê bi taybetî ji aliyê Kurdan ve tê tercîhkirin. Li Bakurê Kurdistanê birincê me tê firotin an jî em difiroşin Kurdên ku li metropolên Tirkiyeyê dijîn. Salane 10-12 hezar ton birincê Qerecdaxê tê hilberandin. Riha, Mereş, Dîlok, Meletî, Batman û bajarên din ên Bakur vî birincî dixwin"

**"Dahateke baş dide aboriya Diyarbekirê"**

Îlhan Avci di derbarê bazirganiya birincê Qerecdaxê de jî wiha diaxive: "Birincê Qerecdaxê salane 10 hezar ton dide û li du fabrîqayên Diyarbekirê tê amadekirin. Herçiqas birincê Qerecdaxê balê bikşîne jî ji ber ku kêm e em nikarin bifiroşin derveyî herêma Kurdan. Ji xwe encax têra vê herêmê dike. Di aboriya bajêr de jî xwedî girîngiyekê ye."



> "Divê li Diyarbekirê û bi taybetî jî li herêma Qerecdaxê bê çandin. Rêjeya nîşastaya birincê me li gor ên din gelekî zêde ye. Birinc nebateke narîn e, berhevkirin û dirîtina wê zehmet e. Hin dever ji aliyê bîçeran ve tên dirîtin, hin alî jî ji aliyê gundiyan ve bi destan tên dirîtin. Bi dasan, gundî didirin."

## Li Diyarbekir û herêma Qerecdaxê tê çandin

Yek ji cotkarên hilberînerê birincê Qerecdaxê Yehya Nacî ji me re taybetmendiya birincê Qerecdaxê wiha dibêje: "Dema hûn vî birincî li herêmên din datînin vê tamê jê nastînin. Divê li Diyarbekirê û bi taybetî jî li herêma Qerecdaxê bê çandin. Rêjeya nîşastaya birincê me li gor ên din gelekî zede ye. Birinc nebateke narîn e, berhevkirin û dirîtina wê zehmet e. Hin dever ji aliyê bîçeran ve tên dirîtin, hin alî jî ji aliyê gundiyan ve bi destan tên dirîtin. Bi dasan, gundî didirin. Bi taybetî jî li erdên bi kevir tê çandin. Li gor birincên din gelekî cuda ye. Tama wê jî cuda ye, ne weke baldo, akel e. Dema hûn dixwin tehmê jê distînin."

# Îraq nahêle Seyranben bibe navdewletî

**RAVYAR PÊNCWÊNÎ**

Ev du sal in hewldanek heye da ku deriyê Seyranben a li Pêncwênê bibe deriyê navneteweyî lê hê encamek nehatiye bi dest xistin. Cigîrê rêvebir ê Seyranbenê destnîşan dike ji ber ku rayedarên Hikûmeta Iraqê tasdîq nakin ji loma encamek nayê bi destxistin û wiha diaxive, "Em li hêviya lijneyeke paye bilindin a Hikûmeta Navendî ne da ku vê pirsgirêkê çareser bikin. Rayederên Îranî girîngiya hatiniya aborî ya ji Seyranbenê dizanin."

Qeymeqamê Pêncwênê Zana Rehman di derbarê vê mijarê de ji Basê re axivî, "Di Berfanbara 2015an û Sibata 2016an de yanî du caran parêzgarê berê yê Silêmaniyê Dr. Aso Ferîdûn û rayederên Herêma Kurdistanê, parêzgarê Sine, Konsolê Silêmaniyê yê Îranê serdana Seyranbenê kirin. Seyranbenê wek deriyê sînor ê 4. yê navnetewî a di navbera Kurdistan û Îranê de îlan kirin. Ev yek dê piştî temambûna karên asayîş, gumrik, kontrol û pasaportê pêkbihata. Niha ji ber qeyrana aborî li bazaran jî rewş nebaş e. Ev deriyê sînor ji bilî bandoreke erênî li ser aboriyê bike dê derfet çêbike ku li herêma Pêncwênê gelek kes kar bidest bixin."

> Deriyê sînor Seyranben hê ne fermî ye. Lê rojane di navbera Herêma Kurdistanê û Îranê de li vir bazirganî tê kirin. Ev derê bi qasî 18 km ji Baneya Kurdistana Rojhilat dûr e ji aliyê Pêncwêna Kurdistana Başûr jî nêzî 35 km dûr e.

**Xwedî potansiyeleke mezin e**

Zana Rehman dibêje, "Ev yek ji bo têkiliya me û bajarên Kurdistana Rojhilat jî baş e û wiha pê de diçe: "Ger di demeke zû de Seyranben bibe deriyê navnetewî dê bo her du aliyan hatineke baş pêk bîne. Di nava du salan de du hevdîtin çêbûn. Em li benda biciânina tiştên ku di van hevdîtinan de hatibûn axaftin in. Her carî hincetek dîtin û dest ji vê berdan. Girîngiya Seyranbanê ew e ku bajarê Bane ku ji aliyê bazirganiyê ve xwedî potansiyelek baş e, nêzîkî Herêma Kurdistanê bikin.

**"Em li benda biciânîna biryaran e"**

Berpirsê deriyê sînor ê Seyranbenê ji Basê re axivî û got "Heta niha lijneyek bi awayê fermî çar caran serdana Bexdayê kir. Me bi Serokomar û Gerînendeyê Giştî yê Deriyên Sînoran re li ser biryara vekirina Seyranbenê ya dawî hevdîtin kir. Rayedarên Îranê erê kir û xebatên pêwist jî anîn cî û li hêviya me ne ku bi awayekî fermî dêrî bê vekirin. Lê heta niha Hikûmeta Iraqê tasdîq nekir. Hinceta wan jî ew e ku xebatên deriyê sînor Kêlê yê Qelazdizê temam nebûye. Ev jî bê temamkirin ji bo ku tasdîq bike dê van her duyan wek dosyayekê nîşanî Serokê Iraqê bikin. Lijneyeke pispor a Hikûmeta Navendî li deriyê sînor Kêlê zîyaret kiriye û tespit kirine ku ev derî şert û mercên navnetewî tîne cî. Em li bendê ne ku ev lijne bo deriyê Seyranbenê jî biryarekê bide û ev mesele jî bê çareserkirin.



## Li Sineyê 2 deriyên fermî hene

Di serdana 21 Îlonê ya lijneya rayedarên Îranî de Parêzgarê Sîneyê ji çapemeniya welatê xwe re di derbarê deriyê Seyranbenê de wiha axivî, "Li Sîneyê du deriyên fermî Seyranben û Başmax hene. Deriyê sînor yê Başmax ya Merîwanê di îxracat û îthalatê de wek deriyê sînor yê 3. e û girîng e. Dîsa deriyê sînor Seyranben yê Bane digel Iraqê fermî hatiye naskirin lê hê wek deriyê navnetewî nayê bikaranîn. Li gorî rêvebirê îdarê yê deriyê sînor Seyranbenê yê Bane a Rojhilata Kurdistanê îsal di nav 8 mehan de 96 hezar û 240 ton berhem birine Herêma Kurdistanê. Piraniya van malzemeyên înşaetê ne.

**LEWEND PALÎYÎJ**

## Îhtîmalêko Bîn: Korîdorê Urdun-Hayfayî

Wexto 2011î de Sûrîye de şerê birakujî dest pêkerd, Kurdan zî eynî wextan de Rojawan de dest bi protestoyan kerd. Protestoyê sîvîl û aşitîyane, dest de pankartî û zaf rey zî ala Sûrîye ke hetê muhalîfan ra ameybî qebulkerdene. Kurdî hîna zaf rojanê îne ameyêne pêser û verba zorbazîya Esadî slogan eştêne. Labelê PYD -ke o wext Rojawan de partîya tewr girde nêbî- wina nêkerd. Hetgîrê xo organîze kerdî û amadekarîya şerê çekdarîye kerd. Çimkî sosyolojîya komelanê Rojhelatê Mîyanênî zanayêne: "Mor kamî de bo Silêman o yo." Zafê partîyê Rojawanî çekgirewtişê PYD ra nerehet bîyê. Goreyê înan ganî Kurdî çeke nêgêrî xo dest, tena sloganan bierzî û bi no hewa heqê Kurdan bigêrî. Labelê wexto El Nusra –ke grûbêka ser bi El Kaîde bîye û nika nameyê xo kerdo Heyet Tahrîr El Şam- hêrişê Serê Kanîye kerd û leşkerê Esadî bajar ra vetî, nê partîyan ra yewe zî orte de nêasay. Çimkî seba El Nusra ke bi serebirnayîşê merdiman ameybî sinasnayîş, qet qîmetê sloganan çin bi.Û Kurdan zî o wext vateyê"mor kamî de bo Silêman o yo"newe ra fehm kerd û xo da PYD ser. Xora tîya de "mor"î ra qesdê mi "çek" o. Partîyanê bînan zî na rastîye dî û dest bi çekgirewtişî kerd, labelê na rey PYD destûr nêda înan. Xo rê reqîb nêwaşt; vat "Ya şima binê ala mi de şer kenî ya zî şima çeka xo teslîmê mi kenî." No helwesto negatîf yê PYD, Rojawan de vernîya "artêşê netewî" girewt û bi semedê gelek serebûtanê xiraban.

Esadî 2012î de bi hemleyêka aqilane leşkerê xo Rojawan ra peyser antî cayê merkezî û bi no hewa PYD dest na îdareyê çend qezayanê Rojawanî ser. O wext çewî texmîn nêkerdbi ke Kurdî panc serran ra dima Reqa gênî û hetanê Deyrezzor şinê. Rojawan de wexto Kurdan bi hetkarîya Amerîka, Girê Sipî girewt û Kantona Cizîre û Kobanî best yewbînan a, tayênan termê Korîdorê Deryayê Sipî cemedxane ra vet û vist fekê şarî. Û serrêk ra dima, wexto bi hetkarîya Amerîka Menbîç zî amegirewtiş, êdî fekê her kesî de Korîdorê Deryayê Sipî estbi. Labelê no korîdor bi "Tirsê Feratî" qefilîya. Artêşê Sûrîyeya Azad bi hetkarî û beşdarbîyayîşê artêşê Tirkîye dekewt Cerablus. Badê hetanê El Babî şîy û rayîrê Menbîç û Efrîn ame girewtiş.

2015 de HSD (Hêzê Sûrîyeya Demokratîke) bi beşdarîya nê grûban awanbîyayîşê xo îlan kerd: YPG, YPJ, Konseya Leşkerî yê Sûryanîyan, Burkan El-Ferat, Suwar El-Reqa, Şems El-Şemal, Lîwa El-Selçuqî û Tûgaya El-Cezîre. Xora HSD bi pêşnîyaz û hetkarîya Amerîka îlan bîbî. Selahîyetdarêkê Amerîka çend aşmî verî na rastîye nîşan kerdbî, wina vatbi: "Ma pêşnîyazê YPG kerd ke wa nameyê xo bivurno, û bi no hewa ma eşkayî hîna asan hetkarîya înan bike." Roja verêne ra ala HSD bala mi antbî; serê zemînê zerdî de xarîtaya Sûrîye, labelê robarê Feratî bi hewayêko dîyar nîşankerde. Mi gore na xarîta derheqê sînoranê Mintiqaya Otonom a Vakurê Rojhelatê Sûrîyede fikr dana ma. Eke no fikrê mi rast bo, ganî ma cewabê nê persî zî bide: Amerîka seba çi çolanê Ereban zî bestena Mintiqaya Kurdan a?

Amerîka xo rê Sûrîye de di mutefîkî dîyar kerdbî. Vakurê Sûrîye de Kurdî û Verarojê (başûrê) Sûrîye de, serê sînorê Urdînî de zî çend grûbê Artêşê Sûrîyeya Azad. Wexto vakur de korîdorê Planê A bi operasyonê Tirsê Feratî qefilîya, dîqetê xo hîna zaf na Planê B ser o. Yanî Korîdorê Urdun-Hayfa. Amerîka sînorê Urdunî de di qerargahî awan kerdbî: Qerargehê Tanîf û qerargehê Zekefî. Tîya de muhalîfî perwerde kerdî û çekî dayê înan. Amancê Amerîka, hetanê robarê Feratî kontrolkerdişê verarojê rojhelatê Sûrîye bi. Bi no hewa mintiqaya verarojê rojhelatê Sûrîye û Mintiqaya Otonom a Vakurê Rojhelatê Sûrîye bîyêne cîranê yewbînan. Bi no hewa korîdoro ke Hewlêr ra dest pêkerdêne, hetanê Hayfa dewam kerdêne. No plan hêverî hol xebitîya. Muhalîfan cayêko hîra vist binê kontrolê xo. Labelê dima ra, Sûrîye bi hetkarîya Rusya û Îranî tîya de zî vernîya Amerîka girewt. Artêşê Sûrîye, Palmîye ser o ame û hetanê sînorê Iraq girewt binê kontrolê xo û Amerîka qerargehê Zekefî ra leşkerê xo antî û oca teslîmê Sûrîye kerd. Bi no hewa vernîya muhalîfanamegirewtişû îhtîmalê Korîdorê Urdun-Hayfa zî kêmîya.Yanî nika vernîya her di korîdoran zî qefilîyayo.

2015 ra hetanê ewro Amerîka bêmabên Kurdan de pîya xebitîyena. Çekanê giranan erşawena, mîlîtananê HSD perwerde kena, qerargahan awan kena. Rojhelatê Feratî de qetîyen destûr nêdana teyarayê şerî yê Esadî hêrişê hêzanê Kurdan bikerî. Astana de mintiqayê ewle îlan benî, labelê qala mintiqayê Kurdan nêbena. Tirkîya ronişena-warzena qala rojawanê Feratî kena; labelê seba rojhelatê Feratî çîyêk nêvana. Seke Amerîka, mintiqaya ke mi cor de qala ci kerdbî, bi hewayêko de-fakto îlan kerda û her kesî zî –qe nêbo nika- qebul kerda. Bêşik Amerîka seba ma wina nêkena, ha menfaetê xo dima. Labelê ez do tîya de nêkewî na babete. Goreyê fikrê mi Amerîka hende rîsk û masrafî ra dima, Kurdan wina canêverdena û nêşina. Çîyo ke dest pêkerdo bena sere. Petrol û gazo tebîî yê Kurdan miheqeq resenê Deryayê Sipî.

# Fîlmo Tewr Verên yê Kurdan: Zerê* (1926)

Zerê yan zî Zarê, sey filmo tewr verên yê kurdan yeno qebulkerdiş. Fîlm, naye ra tam 91 serrî verê cû yanî 1926 de hetê rejîsoro armenî Hamo Beknazaryanî ra Koyanê Elegezî yê Armenîstan de ancîya. Senaryoyê filmî, hîkayeya Hakob Gazaryanî (1864-1926) ke ey bi nameyê "Qederê Zerêyî" nuşta ra awan bîyo. Fîlm de, sey M. Todasîan (Zerê), Hrochîzn Nersîsyan (Seydo), Avet Avestyan (Silo) kaykerdoxê namdarî yê Armenîstanî rolî kay kerdê. Zerê de tekilîya eşqî ke mîyanê Zerê û Seydoyo şiwanî de dest pêkerdo û Temûr Bego ke çim kerdo Zerê û coka na têkilîye ra nêrehet beno û serebûtê ke derûdormeyê înan de qewimîyênê vajîyeno. Beknazaryan xatirayanê xo yê ke serra1968î de weşanîyayê de vano: "Verê ke ez fîlmî bianca ez şîya çend aşmî mîyanê kurdan de menda û mi kultur û ciwîyayîşê înan tehlîl kerd. Wextê ancîyayîşê fîlmî de ma înan ra eleqeyo germin û destek dîy. Kurdan berê xo heta bi peynî akerdî. Kurdî, merdimê zaf mêmanperwer ê. Gama verêne ke ma şîy Koyanê Elegezî înan zaf qiymet da ma. Înan, mêmanî sey "Mêmanê Homayî" name kerdenê û vatenê ganî ma mêmanan winî mêman bikîmê ke wa zerrîya Homayî xo ra weş biverdîme."

Kaykerdoxê serrolan yê fîlmî ra teber heme kaykerdoxî (nêzdîyê 500 fîguranê weçîniteyî) dewijê kurdan yê koyanê Elegez û dewa Saribulaxî yê. Dewijî, hendê zerrî ra beşdarê fîlmî benê ke zaf rey xo vîr ra kenê antişê yew fîlmî de yê. Wextê ancîyayîşê fîlmî de serebêtê balkêşî qewimîyenê. Bi gorêyê edetanê kehenan yê dewe, eke cinîyêk bênamûsîye bika, aye nanê rê yew herî/e ser, kuçe bi kuçe gêrnayenê û danê rezîl kerdenê. Gama ke kaykerdoxe M. Todasîan a ke bi gorê senaryoyî rolê Zerê kay kena nanê rê here ser û dewa kurdan de danê gêrnayenê, çend cinîyê kurdan rast a zî kaykerdoxe rê hêrîş kenê. Ê aye edî sey cinîyêka xirabe hesibnenê. Goreyê înan Zerê cinîyêka bênamûs a. Rejîsor û ekîbê fîlmî cinîya kaykerdoxe deste înan ra zor xelisnenê û lebitîyenê ke fîlm bîyayêna ney rê bidê bawer kerdene.

Hakob Gazaryano ke hîkayeya ey (Qederê Zerêyî) bingêhê senaryoyê Zerê kerda semedo ke mîyanê kurdan de zaf ameyo heskerdiş hetê înan ra sey "Lazo" yan zî "Apo" ameyo name kerdene. Derheqê ciwîyayîş, kultur û edetanê kurdan de melumatê ey xorîn bî. Gazaryan, 1921de alfabeya armenkî xebata xo rê esas girewto û bi nameyê Şems'î afabeyêka kurdan nuşta û weşanaya. Taybetmendîya na alfabe, çimeyo tewr verên yê kurdkîya Armenîstanî bîyayîş o. Ey eynî wext de bajarê Tiflîsî de seba domananê kurdan wendegehêk akerdo û uca dersa kurdkî daya.

Fîlm (Zerê), sipî-sîya yo û bêveng ameyo antiş. Mudetê xo 72 deqa yo. 1926 de Moskova û sewbîna bajaranê Rûsya (YKSS) de kay dîyayo. Goreyê vatişan J. Stalînî fîlm temaşe kerdo û dima şîroveyêko winasî kerdo: "Naye ra pey fîlmê kê derheqê cuyê şaranê rojhelatî de yê, tena armenîyî înan biancê, ê no ware de bêemsal ê." Fîlm, 1970 de hetê bestekaro armenî Aleksandir Spendîarovî ra şeklê biveng rê ameyo agêrnayîş. Xebata agêrnayîşê (vengpêdîyayîşî) filmî de Casîme Celîl û kênaya ey Cemîla Celîl şêwirmendî û ardimkerdoxîye kenê. Versîyono biveng zafê şaristananê Armenîstanî de kay dîya û eleqeyêko pîl dî. Na çarçewa de nika di kopyayê fîlmî arşîvê dewleta Armenîstanî de estê. O yewin, kopyaya bêvenge ya orîjîn a ke 1926 de virazîyayo, o dîyin zî kopyaya ke 1970 de vengpêdîyayo. Zerê, Tirkîya de reya verêne çarçewaya F! (!F) Îstanbul 2011 (Festîvala Fîlmanê Xoseran ya







> Fîlm (Zerê), sipî-sîya yo û bêveng ameyo antiş. Mudetê xo 72 deqa yo. 1926 de Moskova û sewbîna bajaranê Rûsya (YKSS) de kay dîyayo. Goreyê vatişan J. Stalînî fîlm temaşe kerdo û dima şîroveyêko winasî kerdo: "Naye ra pey fîlmê kê derheqê cuyê şaranê rojhelatî de yê, tena wa armenîyî înan biancê, ê no ware de bêemsal ê."

Mîyanneteweyî) Îstanbul de kay dîya. Eynî serre (Sibate 2011) bi cêrnuşteyê tirkî-kurdkî û muzîkê ganî yê Tara Jaffe reyde Dîyarbekir de ame kay dayene. Ma peynîye de naye îlawe bikîme ke goreyê tayê otorîteyanê sînema fîlmo tewr verên o ke kurdan ser o ancîyayo Grass o. (Rejisorî: Merîan C. Cooper, Ernest B. Schoedsack, 1925, 71 dq.) Fîlm (Zerê) herçiqas sey fîlmo tewr verên yê kurdan ameyo qebulkerdiş û no qayde ci ra yeno behs kerdene zî eke merdim bîyaro xo vîr ke rejîsor û kaykerdoxê ey ê profosyonelî armenî yê vajo Zerê fîlmo tewr verên o ke tede kurdan ra yeno qalkerdiş yan zî babeta xo cuya kurdan a seke hîna rast bo.

*Nameyê rastikên yê fîlmî Zarê nîyo, "Zerê" yo. Semedo ke armenkî û rûskî de herfa "ê"ya kurdkî çin a, Zerê bîya Zarê.

## Mewzû û temaya Fîlmî

Zerê, her çiqas taybetmendîya dramî de bibo zî eslê xo de yew fîlmê eşqî yo. Zerê (Marîa Todasîan) kênayêka rind û ezeb a ke şiwaneyê dewe; Seydo (Hrochîzn Nersîsyan) ra hes kena. Axayê dewe Têmûr begî çim kerdo Zerê ke aye xo rê sey cinîya dîyine bîyaro. Têmûr beg seba ke bireso nê amancê xo şexê dewe û burokrasîya Sovyetîstan reyde tewir bi tewir entrîkayan îcra keno. Peynî de bi destê merdimanê xo Zerê remneno û veyveyêk keno. Temûr beg wextê veyveyî de şino kîşta Zerê ke tecawuzê aye bikero. Zerê vera ey xo ver dana. Têmur beg nê hereketê aye ver zaf hers beno û îftîra erzeno vileyê Zerê ke "A (Zerê) bakîre nîya, cinîyêka bênamûs a" Naye ser o dewijî kom benê, Zerê nanê herêk ser û seba ke dewijî rîyê aye rê tu bikere aye dewe ra fetilnenê. Tam o wext Seydo û embazê ey kî yenê dewe û Têmur beg (axayî) kişenê. Axir Zerê û Seydo resenê yewbînan.

Çarçewaya tematîk ye fîlmî de axatî, qalind, wesnîtîye (hewîyetîye), namûs, edetê kehenperest yê kulturkî û dînî vajîyenê. Plano peyên de zî pêrodayîşê feqîran û zengînan, sîstemê axatî, edetê kulturkî û dînî, Şero Yewin yê Cîhanî, rişwetwerdena sinifa burokrasî yenê rexnê kerdene.

# Dewro Klasîk de Kitabê "Tarîxê Kurdan-I"

**ŞÎRKÛH AMEDÎ**



Seserra 9. ra hetanê ewro hetê Kurdan ra derheqê dewlet, mîrîtîye û eşîran de bi Erebkî, Fariskî, Osmankî û Kurdkî mensûrî zaf kêmî bî zî menzûmî ameyê nuştene. Nê nuşteyî de, kitabê ke dewro klasîk ra hetanê seserra 20. derheqê "Tarîxê Kurdan" de nusîyayê ameyê ercnayene.

Eke kitabê Alîmê Kurdan Ebû Henîfe El-Dînawerî (M. 895) "Ensabu'l-Ekrad (Sereceya Kurdan)" ke bi Erebkî nusîyayo û vînde yo nêhesibîyo, na babete de hetanê nika kitabo ke yeno zanayene "Şerefname"yê Şerefxanê Bîtlîsî yo ke serra 1597an de bi Fariskî nusîyayo. Xercê ney, kitabê Hazrecî "Tarîhu'l-Devletu'l-Ekrad (Tarîxê Dewleta Kurdan)" ke bi Erebkî nusîyayo û nika tena Kitabxaneyê Suleymanîye yê Îstanbulî de esto zî mîyanê kitabanê verênan ra hesibîyeno ke derheqê tarîxê Kurdan de yo.

### 'Ensabu'l-Ekrad (Sereceya Kurdan):

Dînewerî eserê xo yê bi nameyê 'Ensabu'l-Ekrad (Sereceya Kurdan) de derheqê nesebê Kurdan de cigêrayîşan keno. Estbîyayîşê eserî hetê alîm û cigêrayoxan ke badê Dîneweri ciwîyayî, vejîyeno orte. Her çend hetanê nika tu nûshayê ci nêginayê ma dest zî, bêşik derheqê neseb û ziwanê Kurdan de wayîrê malumatanê muhîman o. Oryantalîsto Rus Romankevîc cigêrayîşanê xo de vano ke mi Muzeya Asya yê Saînt-Petersburgî de kitabêko bi nameyê 'Risatei Ensabi'l Ekrad dîyo; labelê dîyar nêkerdo ke kitab yê kamî yo.

### Tarihu'l-Fariki, Ed-Devletu'l-Mervaniyye:

Hetê Îbnu'l-Ezrak El-Farîkî (1117-1181?) ra serra 1176î de bi Erebkî nusîyayo. Nûshayê "Tarihu'l Meyyafarikin" Londra de Muzeya Brîtanya de yo. Wexto merdim goreyê nê her di eseran ewnîyeno tira, edîsyon hetê Dr. Karîm Farouk El-Khouly û cigêrayox Yusuf Balukenî ra ameyo kerdene. (Weşanê Nûbiharî, 2014) Nûshayêko bîn zî Kitabxaneyê Budlînî de yo. Nûshayo tewr hîro 418 rîpel o.

Îbnu'l Ezrak eserê xo de, tarîxê Merwanîyan ke dewrê Tarîxê Îslamîyetî de Meyyafarqîn û dormaleyê ci de hukm kerdo, nuşto. Dewleta verên a ke Kurdan awan kerda. Sewbîna qala dewleta Kurdanê Şeddadîyan, Ebbasîyan, Selçûqîyan, Artûkîyan û Emewîyan zî kerdo. Erzakî wexto eserê xo amade kerdo, tecrûbeyanê tarîxnasanê Îslamî ra zî îstîfade kerdo. Şerefxanî zî Şerefnameyî de, beşa "Zirkan" de nê eserî ra îstîfade kerdo. Beşa Merwanîyan yê nê eserî, hetê M. A. Bozarslanî ra seba Tirkî ameyo tadayîş û bi nameyê "Tarîxê Kurdanê Merwanî /Mervani Kürt Tarihi (Weşanê Koralî-1990)" ameyo weşanayîş.

### Tarihu'l-Devletu'l-Ekrad:

Kitabo ke 400 rîpelî yo û nûshayê ci tena Beşa Hekimoglu (No: 695) yê Kitabxaneyê Suleymanîye yê Îstanbulî de yo, derheqê tarîxê Dewleta Kurdanê Eyûbîyan de nusîyayo. Eser hetê M. Emîn Narozî ra çape bîyo û bi eynî qayde seba Kurdkî ameyo atadayene. (Weşanê Azad, 2005, 856 rîpelî)

### Metnê Şikarî:

Sernuşteyê nê metnan çin o. Labelê seba ke hetê Ehmed Heyderî ra (M. 1506 yan zî 1584) ke mahlasê Şikarî bikar ardêne nusîyayê, wina name benî. Nê eserî ke hetê Şikarîyê Dîyarbekirî ra bi Tirkîya Kane yê Anadolî nusîyayî, Kitabxaneyê Camîya Yusuf Axayî yê Konya de yê (Klas: 946.6, Sername: 0000000562). Goreyê texmînan babîyê Tarîxnas Murat Bardaxçî, Cemal Bardaxçî nê eserî berdî Konya. Çapa ke serra 1940an de hetê midûrê Muzeya Konya ra çape bîya de, beşê derheqê Kurdan tira ameyê vetene. Nê eserî, tarîxê Kurdan yê Anadolîya Mîyanêne ke seserranê 13-14. de derbaz beno, keno roşn. Eserî bi ameyişê Selçûqîyan dest pê kenî û hetê Osmanîyan ra bidestvistişê Anadolîya Mîyanêne qedîyenî. Nê 400 serran de dîyar beno ke Kurdî mintiqa de aktorêko sereke yê. Munaqeşeyê ke derheqê Kurdbîyayîşê mîrektîyanê Dulkadîr, Eşref û Germîyanî de beno, bi nê eseran beno zelal. Sewbîna nê eseran de, şerê Kurdan ê verba Selçuqî, Osmanî û Moxolan û hetê Kurdan ra girewtişê Konya û Enqera zî bi hewayêko hîra ameyo nuştene. Sedat Uluganayî beşê nê kitabî ke derheqê Kurdan de yê, pêro arê dayê û weşanayê: Anadolî de Artêşê Kurdistanî (Anadoluda Kürdistan Ordulari, Do Yayınları, 2013)

### Şerefname:

Eserê "Şerefname" yan zî "Tarîxê Kurdistanî" ke hetê Şerefxanî ra serra 1597î de Bîtlîs de bi Fariskî nusîyayo, tarîxê Kurdan de esero tewr muhîm o. Şerefxanî, seba ke keyeyanê arîstokratan ê Kurdistanî bido naskerdene, no eser nuşto. Eser bi girîzgehêk, çar beşanê serekeyan û peyine; pêro-pîya şeş beşî yo. Çimeyê Şerefxanî: Çimeyê Fariskî; Şahnameyê Fîrdewsî, Nuzhetu'l-Kulûbê Hamdullah Mestevfî, Zubdetu'l-Tevarîh û Zeyd Ala Cami'it Tevarîhê Hafîz Abrû, Zafernâmeyê Şerefudîn Elî El-Yezdî, Metlau's-Sadeyn û Mecmua'u'l-Bayreynê Ebdulrezzâq Semerkandî. Çimeyê Erebkî; Futûhu'ş Şamê Muhammed B. Omer El-Vakîdî, Futûhu'l-Buldanê Ehmed B. Yahya El-Belazurî. Çimeyê Tirkî; Tezkiretu'ş-Şuara yê Latîfî.

Beşa yewin a kitabî de nê dewletî-mîrektî ca genî. Merwanî, Hasanveyhî, Lûra Pîl û Qije û Eyyûbî; û Erdelan, Şenbo, Bahadînan, Azîzan û Melîkanî ke nameyê xo ser o pereyî vetî û xutbe dayo wendene; û Melkîşî, Mîrdasî, Hazzo, Nemiran, Kilîs, Şîrvan, Zirrkî, Suveydî û Suleymanî ke binê îdareyê Osmanîyan de estbîyayîşê xo dewam kerdo. Beşa dîyine de zî: Sohran, Baban, Mukrî, Biradostî, Mahmûdî, Dunbulî, Zerza, Istûnî, Tasînî, Kelhor, Bane, Terza û yê ke erdê Sefawîyan de yê sey Mansûro Sîya, Cegnî, Zengine, Pazûkî ca genî. Eser, seserra 17. de seba gelek ziwanan ameyo tadayene û gelek îlaweyî girewtî.

Çime: basnews. com
Kurmanckî ra çarnayox: Lewend Palîyij



# Penceraya Fransa ra -I-

HACER PETEKKAYA



Sima do nê nuşteyî de dewamê nuşteyê verênan biwanê ke wa ne sanika ma nêmcet bimano ne zî karê ma. Ma 9ê sibate de resayê bajarê Grenobleyî. Verê ameyîşê ma bi Fransa, ma ra amebi vatêne ke semedê kursê ziwanî ma do şirê bajarê Grenoble, no semed ra zî ez tayn ra bol înternet ra ewnîya ke hele kotî yo, bajarêko senîn o ? Ameyîşê ma bi Grenobleyî her çiqas yew roja zimistanî de vera şanî bo zî yew roja wisarî raya ma pawitêne ke seke bajar binê na roje de beriqîyaynê. Wexto ke ma berê garê trêne ra vejîyayî, otêlo ke semedê roja maya sifteyine amebi eyarkerdene hemberê ma de bi; "Hôtel Suisse et Bordeaux " ...

Enstîtu serra 2013-2014î de şeş kesan rê burs dabi ke, nînan ra hîrê kesî vakurê Kurdîstanî ra, di kesî rojhelatê Kurdîstanî ra û yew kese zî rojawanê Kurdîstanî ra bîy. Her çiqas raywanîya ma ya Fransa di kesan a dest pêbikero zî raywanîya Grenobleyî de ma bîbî çar kesî. (Nuşteyanê verênan de mi nameyê embazan nêdaybî, semedo ke mi zî nêzanayêne gelo embazê raywanîya mi do nuştena nameyanê xo ra memnun bibê yan nêbê. La semedê zelal bîyayena nuşteyî ganî mi yew çare bivînayêne û mi xo bi xo va : eke ti tenya herfa sifteyîne nameyanê înan binusê hem kes do rehetsiz nêbo hem zî nuşteyê to do çekuyanê embaz û embaze ra bixelisîyo û hina akerde bo.) Ez û embazo Syo ke ma pîya ameyîbî Fransa û embaza B û pîyê embaza B ap Ayî ya pîya resayîme Grenoble. Her çiqas wexto ke mi ap A otelê Port Royalî de dî û naskerdişî de mi zana pîyê embaza Byî yo ez vajî ez şaş nêbîya zurî kena. Mi xo zerrî de va: way liminê babo ! Na kênaya nê serranê xo de hewna pîyê xo ya pîya geyrana. La sohbetê ap Ayî zaf weş bî û dima zî pexeleya mi amê. Çike min û pîyê xo ya qet wina yew ca pîya nêşî û embazîya ma qet wina nêbîye. Belkî zî o semed ra mi rê hinî ecêb amebi la helbukî çiqas çîyo do weşo hena embaz bîyayena kêna û pîyî. Tenya sohbetê ap A weş nêbi, destê ap Ayî to zî zaf derg bi ke her ca de yew nas û dostê ci bi.

Garî verdê çîyo sifteyin o ke bala mi ante no bi ke hem otelê ma bin de hem zî bînayanê bînan bin de loqanteyî bî ke nê loqanteyî qet nêmanayê loqanteyanê ma. Mevajê ke ma Xecê loqante loqante yo. Ez şima rê vajî, mesela maseyê nê loqanteyan qilor û werdîyekî bîy, kursîyê masayanê ci bi reng û reng bîy, qatine nê masayan de nanê xo werdênê, qatine bîraya xo yan zî şarebê xo şimitênê û qatine zî fîncananê sipîyan ra bellî bîyêne ke ya çayê xo yan zî qehweyê xo şimitênê (mixabin tîya qedexê çayî çin ê û fîncanan de çay danê ke qet hesê mi neyî rê nêno). Yanê şîrîneya nê loqanteyan, yew ca de pîya bîyayen û rehet bîyayen û memnun bîyayena merdîman zaf weşê mi şî. Eslê xo de yew çî tenya yew çî nîyo, yew çî zaf çî yo, yew çîyî nîşanê zaf çîyan dano ke tîya loqante nîşanê çi tewr çîyan dano dahanî şima bifikirîyê. Fina Kurdîstan amebi xeyal û mi zerrîya xo de va : çira Kurdîstan de zî tabloyêko winayin nêbo.

Ma ke kewtî otêle mîyan, bi ardimê ziwanê ingîlîzkîya embaza Bye odeyê ma ameyî eyarkerdene (lal bîyayena mi dest pêkerde). Ma kerdê ke şirê odeyanê xo, Ap Ayî to va : eger şima xelet fehm nêkerê emşo yew nasê ma, ma dawetê keyeyê xo kerdê û ma do nanê şamî pîya biwerê. Ez wazena ke ma pîya şirê. Ma zî va : temam, beno. Ez hinî bawer kena ke na dinya de "tayn merdimî estê ke semedê cuye werd wenê la qatê zî estê ke semedê werdî ciwîyenê." Rasta ci vajê ez bi xo, xo grûba dîyine ra vînena û birehetî nêeşkena werdî rê vajî nê.

Otelê Suisse et Bordeaux qasê otelê Port Royalî weş nêbo û pencera da ci ra kuleya Eyfelî nêaso zî penceraya ey ra zî koyê Alpî sey veyveke aysayênê. Ez hinî pencera verde pay ra ewnîya koyan ra û homa bizano fina çi fikirîyaya, embaza E (mesula bursîyeranê enstîtuyî) telefonê mi kerd û va meşte şewdir saete new de embaz A do bêro şima otêle ra bigîro û şima rê alîkarî bikero. Ez tayna bîya rehet...

Di saeten dima kek I (nasê ap Ayî) ame ma otêle ra girewtî. Ma ke vejîyay teber, teber bibe tarî la pê çilanê kuçana bajar dahanî xemilîyaye bi. Serweşî dima kek Iyî va : keyeyê ma tayn dûrî yo û ganî ma tramway a şirê, la qet meraq mekerê tramway zaf nêzdî ya. Ma ke niştê ro tramway bajarê Grenobleyî berê xo ma verde akerd û tramwaya to xo sey marî ya bajarî mîyan ra tadayê ke zerrîya mi tayna dahanî bîbî germ nê bajarî rê. Ma ke tramway ra amey var, bînayanê berzan bala mi ante ke qet hesê mi nînan rê nêameyê û ez dayê dima bimusayî kesê ke nê bînayanê berzan de ronişenê taybetî nê kesan teber ra ameybî yanî koçer î. Xora tayn pay şîyayena ma dîma merdiman zî nîşanê profîlê mehla dayênê.

Berê keyeyî waya M ya rîhûyaye akerd ke aye pey ra zî yew lajekê çar yan panc serreyî sereyê xo hena kerd ra derg û hema fina ant. Waya M, ma girewtî zerê serweşî dima, vengê do heycaninî va : şima nika vêşan ê, se beno qusûrê mi meewnê mi nêşa zaf çî hedre bikerî û şî mitbaxe. Tabî Fransa de bo zî edet nêno vurnayene, camêrdî şîy roniştî cinî kewtî zere. Waya Mya ke va : qusurê mi mewnê, mi nêşa çîyê hedre bikerî çend quşxaneyî day ra ma dest ez nêzana. Ez fina ewnena la masa ser o mercû, sarmeyî û dolmeyî, tirşê fasulya huşke, riz, selate, turşû estê (Kurd şiro kotî meymanperwerîya xo ya xo bellî keno ke na rehet rehet nêvurîyena û hewl ke nêvurîyena.) Werd hewadîya, çayo qaçax pîya findiqî, fistîqî û dendikana verê ma de ronîyay, ê hewadîyay na rey fekîyî. Werdişê înan û soxbeto şîrin wext senî bî nêmeyê şewe ma fehm nêkerd. Xora nê çend seatan mîyan de mi xo vîr a kerdbi ke ez ha Fransa de ya. Ez şima ra rica kena ke mevajê ke Xecê kar û barê to tenya werd o, ti şina yena qalê werdî kena. Çike mi destpêkê nuşteyî de va ke ez kamcîn grûbe ra ya û çiqas werdî ra hes kena. Ez vana xora merdim çîyî ra hes bikero tewr zaf qalê ey keno.

Kek I fina meywanperwerîya xo kerde û ma her çiqas va gerek nêkeno, xora ma do tramwaya ageyrê zî qebul nêkerd û hetanî otêle ma rê embazey kerd û va : rica kena çi gerek keno telefonê mi bikerê.

10 sibate de çimê ma, yewna bajarê Fransa de Grenobleyî de abîy, saate new de telefonê oda cinîya ke embazo A cêr ma paweno. Ma hema des deqayan mîyan de valîzê xo girewtî û cêr de ameyîme pêser. Xoş-beşî dima embazî va : ewro ma do şirê yurdê şima eyar bikim. Embazo A rojawanê Kurdîstanî ra, sempatîk, biaqil û zafziwan zanaye bi (ey kurmanckî, franskî, ingîlîzkî, erebkî û tayn zî tirkî zanayêne). Rayîr de soxbetê ma ge bi kurmanckî ge bi tirkî bîye. Çike nê panc kesan mîyan de tenya ez zaza bîya, ê bînî kurmanc bîy. Xora înan zazakî nêzanayêne mi zî kurmanckî. Semedo ke embazê Ayî tirkî zaf baş nêzanayê û kurmanckîya ey zaf baş bî, embazanê kurmancan a kurmanckî min a tirkî qisey kerdêne ke o wext kurmancîkîya mi hema-hema qet çin bîye.

Sey ewroyî weş yeno mi vîrî, bi embazê Ayî ya tirkî qiseykerdişê ma çiqas zorê mi şibi. Sima do vajê: çira Xecê, ma to bi embazanê kurmancanê vakurê Kurdîstanê kamcîn ziwan de qisey kerdenê ? Cewabê mi do fina tirkî bo. La nêzana, herçiqas hem verî, hem wexto hem zî nika embazanê Vakurî de tirkî qiseykerdiş hende mi rê çetin nêro zî bi embazanê parçeyanê bînan yê Kurdîstanî de tirkî qiseykerdiş zorê mi şino. Semedê ney belkî zanayena psîkolojîyê parçeyê Vakurî û musabîyene bi. Çike sey awe zelal bi ke heyf ke dewleta Tirkîya polîtîkayanê xoyê asîmîkerdişî kurdan de serkewte bîbî û ziwanê tirkî tenya mabeynê yew kurmanc û yew zazayî mîyan de ziwanêko ortax nêbibi, di kesanê kurmancan yan zî zazayan mabeyn de zî bibî ziwano ortax. Rast a, çimê mi zî, goşê mi zî musayeyê ney bîy la ne çimê mi ne zî goşê mi nêmusayîbi ke tirkî mabeynê di kesanê di parçeyanê Kurdîstanî de zî bibo ziwanêko ortax. Bifikirîyê wendoxê delalî, yew zazaya Vakurî û yew kurmancê Rojawanî welatêko sey Fransa de ; yewna welato ke Tirkîya ra bi hezaran kilometre durî bî de yewbînan reyde bi tirkî qisey bikerê. Çi heyf !...

Mabeynê kurdan de, kurdkî ra teber yewna ziwan de qiseykerdiş helakê zerrîya min o. Hela qafikê nê helakî ra do çend û çend qorî bêrê cira kerdene ma do nuşteyanê bînan de bivînim.

# Qas Kosî / Kuesî

EHMEDÊ DIRIHÎ

Hela ke Şêx Seîd 1925 sibate de yeno Licê, birayê xu Şêx Mehdî şaweno DÎyarbek, Dr. Fuad het. O zî ci rê xeber şaweno ke, wa çekdarî ke dormaleyê ey de yî vila bikero û hetan aşma gulanî, şêro hetê Sîwanî de biareso / xu binimno. Û Şêx Evdirehîm serrê 1932 de mayina xu Leylon, aşîrê Sîwanî ra Qas Kosî rê emanet keno. Ma nînan rê fehm kenî ke; Kirdone de çew gan û malê xu emanetê sîwanijan bikero, çimê kî pey de nêmanenî.

Qas Kosî, hereketê kurdan de; wareyê Qarabegan, Pîran, Hênî, Sîwan û Darahênî de sey yew efsaneyek hema zî ho sinasîyeno. Çîyo ke ma pê zanî, çirey nêbîyo eskerê dewletî.

Şêx Evdirehîm mayina xu seba miqate bîyayiş a şaweno, dewa Sosin / Suesin de Qas Kosî yê Sîwûnî het. Efendîyê Fata Delal tehsildar bi, rojek pê hesiyeno ke mayina Leylon ha ça da, şino mudirê nahîyeyî Şewqî Beg het û ci rê gerre keno. Xeber ginena Elî Heyderî, o Aldûn ra Îbîş Îbîşûn û Mih Eyş ra xeber şaweno vano, 'Leylon bigerên û mi rê bîyarên'.

Qas eşnaweno ke gerreyê ey bîyo, Leylon geno xu het û xu dano kişt. Pa birazayê xu Wis Mih Kosî ya, vecîyeno koyan ser o. Dewa Aldûn ra Îbîş Îbîşûn û Mih Eyş, birayê ey Mih Kosî tepişenî, destûn ey gire danî û şanenî xu ver, hê benî hetê nahîyeya Tînig a . Qas û birazayê xu Wis mabeynê Sosin û Serwî de vernîyê înan genî. Îbîş û Mih Eyş kişenî û benî fîrarî. Xeylûnê Sîwûn ra Hus Mih Eyşûn, xu leyr keno înan vera remeno, Qas zî qey xatirê embazîyê hepsî ya ey dima nêkuweno. Demek Qas û biraza Wis, fîrarîyan het pîya manenî.

Gere bîyayîşê Qasî ra pey Şêx Evdirehîm yeno Melekûn, koşkê Mela Xelîl vêşneno û 8 kesan dano kiştiş: Mela Xelîl, Fata Delal, Mela Ehmed, Mih Qadirî, birayê Qadirî, Efendîyê Fata Delalî, Mela Reşîd. Mihê Fata Delali çarşefa cinîyan dano xura û o teşqela mîyan de, înan ra remeno xu xelesneno.

Gome / Qule Viraştiş

Gazican vateyê Elî Heyder ser o, bîyî çeteyê hukmatî û şîyî Şela Heydûn de nîyayî Nadîr Yuzbaşî het a. Qas binê Zixirî, Xirabayê Kurtnagi yê Cahîd de qule / gome viraşto (Gomeyê Kewi). Tiya de pa Sad Murtezî, Wis Kosî, Mih Mist Kosî, Zeyneba Qasî, Eyşa Keçî û qicanê xuwa manenî. Gome di qat o, qata corîn de camêrd, binîn de cinî û gedeyî tede mendên. Hetahetê gomeyî, gemê mazêrano û kes kesî nêvîneno.

Wis hema azeb bi, demek cuwapey apê xu Qas ra heredîyeno û gome ra abiryeno, şino. La Xarpêt de serrê 1992î de gerreyê ey beno ke 'o birazayê Qas Kosî yo'. Ney sero, dewlete o mehel pê îşkenceya Wis Kosî kişto.

Elî Heyder seba tepiştiş û xeber dayîşê cayê Qas Kosîyî, xela wad keno.

Mezraya Şela Heydan Cahîd ra Mih Kêk şuwaneyo, ho dewar xu çirîneno. Rojek geme de pê arqilîyeno ke cinîyan mexmelanê xu şutî û eştî dar û biran ser o ravistî. O şino çeteyo sîwanij, Evdî Şêrûn pê hesneno, gome mojneno ci û uca ra remeno şino. Xeber ginena Elî Heyderî; o Evdî Şêrûn, Dowrêş Sadiq, Hus Ehm Wis dima silehan şaweno. Vano 'Ganî yan laşê Qas Kosî mi rê bîyarên'!

Esker pa gazican a dormaleyê gomeyî genî û heta serê sibay gulê nê pîya. Hus Ehm Wis uca de kişîyeno. Qas vendeno Evdî Şêrûn, tira bext wazeno. 'Tu de bext esto yan çino'? Evdî vendeno, 'Mi de bext esto'. Qas vano, 'Ez ha cinîyan û tutan şawena teber, bêbextî mekerên pê '! Evdî vano wa bo, bişawi. Zeynebê Qasî , Eyşê Keçî, laco qic û di keynayan şaweno teber. Keynayan ra Zuleyxa ling ra pê şilê bombaya darb girota, hetan peynîyê omrê xu pa na darba ciwîyena. Dadîya Eyşê Keçî çeteyan ra ver dest nana keynayê xu ser o, bena keyeyê xu. Lacê Qasî o qic Ehmed, uca ra sax vecîyeno û şino.

Qas darba giran giroto, tena laco pîl ey het de mendo. Uca Ehmed Ehmedî yê Gaz ra vendeno 'Eke şima Tîmasorij nêameynî, wa ga alayîyê eskeran pêro biameynî ma ser o'.

Mih Mela Xelîlî Melekan, 4 zerd / altûn dano Mih Xuerî. Mih zî şino cinîyê Qasî, Zeynebe kişeno pê qesasê daya xu Fata Delal geno.



Beşdarvanê Serewedaritişê Şêx Seîdî

## Kerdinê Eli Heyderî

Qas Kosî bîyo darbice teslîmê Yuzbaşî Nadîr kenî. Nadîr zî beno, teslîmê bînbaşî Elî Heyder keno. O Qas geno û beno Bîrcikê Qerebegan. Tîya de halê ey teşhîr keno ke, şarê Kirdoneyî pê înan a bitersno. Tira perseno,'Qaso bu ne haldir', o vano 'Heydo / Heqo no halê camêrdan o'! 'Yewbînan ra vanî 'Qas o' yan 'Haq/ Heyd o'. Peynî de hêrs beno û tira vano, 'Ti çira mi ra nêvanî, Elî Heyder Beg'? Qas zî vano 'Ê la ti çira mi ra nêvanî, Qasim Axa'?

Bedenê ey pê şîşana daxnenî, pê kelpetin a dindanan û nenguyan ancenî, hakan pocenî danê binê çengan, bestenê boçê astoran a çarnenî. Elî Heyder sekeno nêkeno, Qas Kosî aman nêkeno. Peynî de bêzar maneno û Dereyê Bazdûn (mabeynê Nêrîbê Axayan û Bîrcikê) de pa guleyan a, Qas Kosî dano eskeranê xu kiştiş.

Sey efsaneyê heme kurdan ê bînan, cayê mezelcayê Qas Qosî, hema zî kes pê nêzano!

# Aîle û Merdimîye ser o Vateyê Verênan

FÎRUZE DEMÎR

Aîle bingeyê komelan o û zewaj a yeno meydan. Kirdî vanê ke "Ciwîyayîşê bextîyarîn de şertanê bingehî ra yew zî zewaj o û aileyê rê wahirbîyayîş o". Û no babeta zewajî bol kenê muhîm û zewajî rê teşwîq kenê.

**Vateyê verênanê ke muhîmîya zewajî vanê**

•Camêrd bê cinî nêbeno.
•Camêrdo bê zewaj ocaxkor o.
•Cinî bê serdar nêbena.
•Keyna do şiro nandê xo ser.
•Keyna do şiro keyê şarî.
•Keyna keye de nêbena.
•Keynaya ke keye de resê, o keye de roj sereyêndê xozî peyşeno.
•Aîleyê to ke çinê bî wa malê dinyay pêro to rê bo...
•Laj ke resa ci rê tîyogeyrê.
•Lajo ke resa seno se hero xam.
•Muraya qulkerdî zî keye de nêmanena.
•Pêşê keynere dişmenê keyner o.
•Wa ti xo rê tewr de şarî bîyayê, wa no pirênê mi zî xincirin bîyayê.

Kes nê vateyan ra fehm keno ke keyna tim se nîmerdim hesibîyena û nêzewijîyo nêbeno û hetanî demê keyeyê pêrdê xo de heqê ci çin yo bimano. Ganî zewaj semedê lajan a zî şert o, hema hetê psîkolojî ra heqê keynan hendê lajan çin yo. Ney ra aseno ke cinî û camêrdî mîyan de heq tay pê nîyo.

Yapîdê kirdan de fikrê esto ke, vateyanê verênan de zî keyî mîyan de muhîmîya cinî û camêrdî vejeno meydan.

**Vateyê ke muhîmîya cinî û camêrdî vanê**

•Camêrd istûna keyî yo.
•Camêrdo bênamus cinêra xo zî roşeno.
•Camêrd camêrd bo cinêra xo keno xanima sûkan.
•Camêrd camêrd bo aîleyê xo rê wahîr vijyeno.
•Camêrd şiro parse zî aîleyê xo mehtajê kesî nêkeno.
•Cinî camêrdî kena rezîl zî kena wezîr zî.
•Cinî cinî bo şina embirîyanî ra deyn kena meymanî het camêrdî bê şeref nêkena.
•Cinîya bêare halînê xo vaydana.
•Cinîya bêare şilwalanê xo ancena xo sere.
•Derd û qesebatê keyî cinî ancena.
•Ellah* çiçî dano kê xeyr bido.
•Halînê keyî cinî virazena.
•Maxa kesî eyb botranê. /Maxa kesî eybê kesî nimnena.
•Memanî Memanî, Meman ronişt a, koçik tepişt a, eşîr wazena.
•Nan bûre qenhat, bigeyre kok û binyat.
•Nan bûre qenhat, bigeyre kok û binyatê cinîyêr.

Nê vateyanê verênan ra zî fehm beno ke; camêrdî wexto ke zewjênê, cinîya ke anê a cinî pergelê ê camêrdî nêvaydo! Hetê cinî ra zî winî yo. Camêrdo xirab zî cînêr keno ar û rezîl. "Ellah çi çî dano kesî xeyre bido. Ellah çaredê kesî ya bokarê hewle binûso." Cinî yan zî camêrd rind nêbo pîya beşe nêbenê, o keyê tam û roj nêvîneno. Tim û tim lej û dehweyî benê, qeçê ke înan ra bibê, ê zî tam û roj nêvînenê. Ê qeçekî zî winyênê înan û sey înan a benê edûyê serî û komelandê zî merdimê rindî nêbenê. Yanê;

•Engre winyena** engur bena bîyayê.
•Kutik çi çî bûro ey keno.
•Ti çi çî bikarê ti dê ey hewadê.
•Vaş kokdê xo ser o beno kiho.
•Vato pişk! ci ra kewto/a.
•Pişk! vato, ci ra kewto.
•Pişk! vato çilm dê ci mîyande erzîya o.

# Rê, Yılmaz Güney

**MARÎA AYAZ**

*''Em ê serbikevin! Teqez em ê serbikevin... ''*

Duh ji min hate pirsîn; Gelo fîlmên Yılmaz Güney dikeve kategoriya sînemaya Kurdî yan na?

Her çiqasî naxwazim ku siyasetê tevlî estetîkê vebêjim jî dagirkerî û hovîtiya hemberî civaka Kurdan min derdest dihêle. Ne tenê ji hêla hêzên derve ve, Kurd bi xwe jî nezan û zalim in li hember hevûdu. Ne tenê ez dibêjim, fîlmê me Rê jî wilo dibêje.

Min xwest ku rexneya min a ewil bi fîlmê Yılmaz Güney dest pê bike. Rê, trajedî û kurteçîroka Kurdistanê vedibêje ji ber ku. Di her planê de mirov dikare vê bibîne.

Sînema, awayekî berxwedanê ye. Ji bo vegotina kul û êş û derdan amûreke pir bihêz e. Çekeke bîst û çarxwir e.

Em vegerin ser mijara xwe; Rê ya Yılmaz Güney. Rê ya Yılmaz Güney 35 salî ye. Hovîtiya 35 sal berê ku di vî fîlmî de hatiye vegotin û nîşandan, îro jî bi hemû awa û şiklê xwe berdewam e.

Naxwazim tenê bi gotinên sloganîk derdê Yılmaz Güney (derdê me) vebêjim. Dîmen bi dîmen, bi hemû jêrnivîs û psîkanalîze ez ê bibêjim, gelo Yılmaz Güney divê çima di nava sînemaya Kurdî de were nirxandin?

Di Rê de, dîyalog û replîk gelemperî bi Kurdî ne. Jixwe muzîkên fîlm hemû dengbêjî û stranên Kurdî ne. Erdnîgarî û mekan, gund û bajarên Kurdistanê ne. Leheng Kurd in. Hemû rezaletên sînemaskop, civaka Kurdan û bêwetaniya wan nîşan dike.

Serdema ku fîlm tê kişandin, darbeya leşkerî ya 12 Îlona 1980î ye û bandora wê ya li ser hemû bûnewarên li ser ruyê wê axê vedibêje. Dengê çekan, zarok û dayikên çav bi hêsir, tadeya tund ya li hember xelkên gund û bajaran û mehkûmên di girtîgehan de, kuştiyên di romorka terektorê de û hwd. mînak dikarin werin zêde kirin. Jixwe hemû sahne û hemû hêma bixwe mînak in.

Bi ser hemû hal û ahwala hêza dewletê, civak bi xwe jî di nava gengeşî û gerînekeke hovane de ye. Jin amûrek e, ajalek e. Di sekna Zînê û Seyît ya li ser berfê de, rola jinê ya wê serdemê tê nîşandan. Tu ferqa Zînê û hespê li ser berfê qefilî tune ye di çavên civakê de. Hetta hespek ji jinekê bi qîmettir e. Hestiyarî di lûgata mêrên Kurdan de tê wateya qelsî û hetîketiyê.


Jixwe ceribandina bihevşabûna jin û mêrê di trênê de trajediyeke devasa ye. Tu metneke Lacan jî Freud jî Spinoza jî nikare wê rewşê îfade bike...

Civakeke ku ji mêjiyê xwe kevzgirtî, bi tu avan jî bi tu agirî jî nikare helal û zelal bibe.

Yılmaz Güney, bi fîlmê xwe yê Rê di sala 1982an de xelata Cannesê girtî, muneccîmiya serdema me ya îro jî kiriye. Mînak, komkûjiya Roboskî. Çi qaçaxçiyên di romorka terektorê de çi kuştiyên li ser pişta hespan. Ez bi xwe tu ferqê di navbera wan de nabînim.

Dema ku qala fîlmên Yılmaz Güney, bi taybetî jî qala Rê tê kirin, apolîtîkmayîn ne gengaz e. Ji ber ku ciwamêr bixwe sînemayeke polîtîk temsîl dikî.

Tirs û xofa di çavên jin û zarokan de û perîşanî û tenêtiya mêran, di Rê de hemû derdê Kurdan vegotiye. Hewcedarî bi tu gotinê namîne. Jixwe sînema ji bo wilo heye; gotin têra vegotina hinek rewşan nake, dîmen û tevger pêwist in.



> Di Rê de, dîyalog û replîk gelemperî bi Kurdî ne. Jixwe muzîkên fîlm hemû dengbêjî û stranên Kurdî ne. Erdnîgarî û mekan, gund û bajarên Kurdistanê ne. Leheng Kurd in. Hemû rezaletên sînemaskop, civaka Kurdan û bêwetaniya wan nîşan dike.

Piştî Rê ya Yılmaz Güney, gelek fîlmên mijara wan rê ye hatin kişandin. Lê êdî tu fîlmê ku mijara wê rê li rojhilata navîn were kişandin vê bandor û hêza Rê ya Yılmaz Güney nikare bike. Rê ya Yılmaz Güney, bi qasî romaneke dûvdirêj mirov dixe nava ramanên kûr. Di dilê Kurdekî neçar û belengaz de çi hebe ew hatiye vegotin di fîlm de.

Ji bo wilo, rojekê hinekan ji we pirsî; gelo Rê bi Kurdî ye yan na?

Halo bibêjin; Erê. Lê bi qêrînekê bêdeng.

# Berdewamiya têkoşîna serkeftinê



**CANO AMEDÎ**

Piştî vegera me ya ji başûrê Kurdistanê, min di derheqê giştpirsiya serxwebûna Kurdistanê de, çavderêyên xwe bi xwendevanên Basnews re parve kir. Gava min dest bi nivîsê kir bîranîneke min a dema zaroktiyê, ez birim salên 1970î. Wêneyên wan salan di mêjiyê min de weke rêzefîlman bîranîn geş kirin. Ji wan rojan heta niha nakokiyên civakî, guhertina jiyana civakî û tofanên bi serê me de derbas bûne di ber çavên min de xuya bûn. Em ji ku hatin ku.

Di 1972an de, li gundê Xirûcê (Pasûr-D. bekir) ez diçûm pola sêyem. Rojeke payizê, meha îlonê, di nav gund de nûçeyekê deng da: Kurê Hecî Mihemed hatiye! Ji mala "Bedew"an burokratek derketibû û di wezerata derve ya Tirkiyê de kar dikir. Biqasî tê bîra min A. Bedew li Baxdayê di seferata tirkan de karmend bû. Demeke dirêj bû li xêrîbiyê bû. Ji ber wê yekê dîtin û sohbeta wî bûbû mijara meraqê. Lê belê meraqa me zarokan jî ne kêmî ya mezinan bû!

Em ji mektebê derketin hatin malê, bavê min got: "Rabe emê herin mala Hecî Mihemed, kurê wî hatiye." Em çûn mala Hecî Mihemed, min dît ku hemû gundî li gel wî camêrî rûniştine û jê pirsan dikin. Civat germ bû. Em zarok jî li ber derî li ser çokan rûniştin û bi balderiyeke mezin me civat gohdar dikir. Camêr karmendê dewletê bû û xwedî erk bû. Demekê şûn de kalemêrekî bang kir got: Ka wê radyoya "kurmancî" vekin em "hawadîsan" gohdar bikin. Radyo vebû û dengê Keremê Seyad li odê belav bû. Giraniya nûçeyan di derheqê şoreşa îlonê û Mela Mustafa Barzanî de bûn. Dengê Xarabetê Xaço û nûçêyên rojê rûyê gundiya ronî dikir. Piştî bername qediya gundiyekî ji A. Efendî pirsî; "A. Efendî tu ji Baxdayê teyî, ev hadîseya Mela Mustafa Barzanî çiye? Divên bûye xwedî dewlet, teyarên wî hene, tank, top û leşkerên wî hene, ev 'xeber' rast in an na?"

Camêr A. bi balderiyeke mezin li kesên di odê de kom bûne nihêrî û dest bi axaftina xwe kir: "Belê, ew tiştên hûn dipirsin hemû rast in. Tanq, top, esker û balafirên wî hene, firokxane û qeweteke wî mezin heye." Rûyê kalemêran ronî bû, bi ken di nav xwe de dest bi şîroveyan kirin.

Me bi aqilê zarokatiyê, tiştên ji şevbêrka gundiyan dibihîst şîrove dikir û bi zarokên gund re parve dikir. Kelecanî, hêvî, hîsiyata "dewleta me" coşiyeke mezin dida me. Bi kelecaniya zarokatiyê, me dizanibû li 'binxetê', li rojhelat, li başûr beşên welatê me, hemwelatiyên me hene. Çîrokên sînornenasan ku ji wan re digotin "qaçaxçî" me pirî caran gohdar kiribû. Qala Baasiyan, Şah Rıza Pehlewî, Hafiz Eshed dihat kirin. Gava navê wan dihat gotin weke qala keftarekî bikin awurên xwe tirşo dikirin. Me fam dikir ku ew kesên hanê û dewletên wan neyarên me ne. Li xwişk û birayên me zilmê dikin.

Dem derbas bû, sal li pey salan pêl da. Şoreşê, bi peymana Cezayîrê derbeyeke mezin xwar û paş ve vekişî. Êrîşên siyasî, rexneyên bê bingeh dest pê kiribûn. Ez wê demê diçûm dibistana navendî, rojekê mamosteya me Nurten Baltacı di dersê de, rexne li siyaseta Emerîka girt û qala bêbextiya dewletên emperyalîst kir, pişt re axaftina xwe anî ser şoreşa 1975an û îxaneta Emerîka û Şahê Îranê. Piştre rexne li Mela Mustafa Barzanî kir ji ber ku bi wan re tevgeriyaye. Ji nişka ve ez ji cîhê xwe rabûm û destûra axaftinê xwest, mamoste ji min hez dikir. Got; "Fermo Can tu dixwazî çi bêjî?" Min bi kurtayî got: "Mamosteya min Mela Mustafa Barzanî serokê me ye, jê re tiştekî nebêje!" Li min nihêrî û keniya: Got: Temam! Ez têgihîştim, rûnê cîhê xwe!

Dem derbas bû, di 1976an de, min li Amedê dest bi lîseyê kir. Bi piştgirî û alîkariya hevalan pêşmergeyên birîndar, li hinek malan hatibûn bi cîh kirin. Gelek pirsgirêkên wan hebûn. Nasname, derketina derveyî welat û vegera başûr. Dermankirina birînan û problemên ewlekarî û debara jiyanê gelek zehmetî bi xwe re dianîn. Cara yekem me ew kesên ku me ji wan re digot "apo-xalo" ku egîdên xewn û xeyalên me bûn, me didît. Pêşmerge bûn, xwedî nav û deng bûn. Pirî caran hevalan bangî me dikir û digot: "Vî apê xwe" an jî "xalê xwe bibin nexweşxanê bila doktor wî mûayane bike û dermanê wî bigirin." Li nexweşxaneyan doktor û kesên welatparêz bi hişmendiyeke netewî alîkarî dikirin. Me jî pêşmergeyên birîndar re li ser navê apê xwe, xalê xwe derman peyda dikir... Me baş dizanibû karê em dikin karekî pîroz û xebateke netewî ye, bi kêfxweşî û bi kelacaniya xortaniyê, me erka xwe bi cîh dianî!

Mizgîniya şoreşa Gulanê, careke din bayê hest û hişmendiya netewî geş kir. Li seranserê Kurdistanê bayê şoreşê belav bû. dewletên dagirker him bi hev re, him jî di nav xwe de ketin taya mirinê. Ji bo pêşî li doza Kurd bigirin defîkên nû çêkirin. Bi tovê îdeolojî û cûdahiyên vala neqep xistin nav hêzên Kurd. Bi bertek û aloziyan rê li ber organîzasyonên tarî vekirin. Di bin navê "manîfesto" û "têgihiştina riya rast" de tevna civata Kurd serûbin kirin. Wezîfedarên tirk careke din weke "keyayê siyasî" bûn rêber û desthilatdar. Ji bo berjewendiyên dewlet û netewa xwe birînên civata Kurd xurandin û nakokiyên hene li hev zêde kirin. Di wê demê de bi giranî li dijî Mela Mustafa Barzanî û Qiyada muwaket êrîşên îdeolojî û dijmînatiyek hebû. Ew derûdora ez bi wan re tevdigeriyam li dijî wan êrîşan weke mertalên zîndî tevdigeriyan û helwestên siyasî yên tund nîşan didan. Nameya naveroka wê li ser gilî û gazinan bû û bêbextî, rûreşî û xayintiya bi gelê Kurd re hatibû kirin dianî ziman weke benîşt li ser zimanê wan bû. Di kovar û rojnamên xwe de digotin: "A ji we re belgeya îxanetê!"

Iraq û Îran şerê navxwe anîn li ser axa Kurdistanê domandin. Pêvajoya Enfalê bi qirkirina 182 hezarî di dîrokê de cîh girt. Mirovahî li ber çavên "dinya medenî", bi piştgirî û alîkariya wargehên "demokrasî"yê careke din li Halepçeyê hat kuştin. Dîrokeke bi xwîn, bi êş û elem, jiyaneke di bin bombardîman û jenosîdê de, di nav gola xwînê de vejîyaye!

Ji 1980î û vir ve, ba û bahozek bê sînor bû sedema tofaneke mezin. Partî, rêxistin û rewşenbîrên bakûr di nav toz û dûmana tirsê de berê xwe dan "binxetê". Kîjan partî û rêxistin çû Şamê û ava wir vexwar, bihevketin, şerê hev kirin, bûn du perçe, hevdû bi tirsonekî û li dijî şoreşê tawanbar kirin. Perçe bûn dijîtiya hev kirin. Lê çi hîkmet bû hemû alî dawiya dawî çûn Ewropa. Li xerîbiyê nakokiyên nav wan her çû kûr bû û bi salan silav li hev qut kirin. Di 1983an, 1 Gulanê hêzên dewleta tirk êrîş birin ser wargehên pêşmergeyan. Kuştin, birîndar çêbûn. Dewletên dagirker di nav xwe de peymanên derbasbûna "sînoran" çêkirin.

1984-1990î pêvajoyeke din li bakûr dest pê kir. Destekî kûr rê li hemû newal, çem û rûbaran girt û berê potansiyela welatparêzan ber bi bendaveke gerînek ve kir. Pêvajoyeke bi xwîn, bi kuştin û bê pivan dest pê kir. Salên 1994-2000î, pişt re guhertina meqesê çêbû. Çîrokên biratiya gelan, benîştê aştiyê, nexşerêya xwelîseriyê jiyana me xemiland... Vê projeyê bandoreke xirab li civata Kurd kir û tevna civatê serûbin kir. Demsalê tirsê li seranserê bakûr desthilat bû û rê li ber hestên netewî girt. Ez hêvî dikim bayê referandûmê ya serxwebûna Kurdistanê wê rê li ber demsala netewîbûnê veke!

25 îlonê careke din weke tîrêjên rojê rastiya jiyanê raxist ber çavan. Oldar û çepgirên netewên serdest, dewletên dagirker û gelên wan helwestên xwe yên rasteqîn nîşanî gelê Kurd dan. Ew hêz û qewet di bin kirasê "dostanî"yê de derdiket ser dikê, di pêvajoya referandûma serxwebûna Kurdistanê de me dît ku hemû gur, keftar û rovî ne! Referandûm ji bo hemû alî û kesan, ji bo hemû desthilatdaran bû kaxizê tûrnesolê! Pêvajoya referandûmê careke din riya rastiyê nîşan da! Gelê Kurd li ser astên berjewendiyên netewî bi helwestên hevpar dikare kirasê dagirkeran lê kiriye biçirîne û zincîra stuyê xwe biqetîne. Weke pêşiyan gotî "ger hûn nebin yek, hûne herin yek bi yek!" Ev rastiya îro em hemû bûne şahid divê em baş binîrxînin û li gor wê tevbigerin! Ger em bi hestên berjewendiyên netewî di nav xwe de pergalên îtîfaq, dostanî û biratîyê pêk bînin û bi hevre hişmendiyeke netewî derxin pêş wê dost û piştgirên me bê tirs û bê şik hevalbendiya me bikin.

Hêvîdar im rûpeleke nû, zimanekî çêkir, helwestên avakir wê rê li ber demsala Kurdî veke û cîh li dagirker û neyarên gelên Kurdistanê teng bike.



> 25ê îlonê careke din weke tîrêjên rojê rastiya jiyanê raxist ber çavan. Oldar û çepgirên netewên serdest, dewletên dagirker û gelên wan helwestên xwe yên rasteqîn nîşanî gelê Kurd dan.



**FIRAT CEWERÎ**

## Tehdîd li ser kîjan astê ye?

Berî çend rojan Asayişa Kurdistanê ragihand ku hin liv û bizavên Heşda Şaabî wek amadeyiyên êrîşên ser başûrê Kerkûkê û bakurê Mûsilê dixuyên.

Tirkiye jî bi hevkariya hin yekîneyên Iraqê tetbîqatan li ser hidûdê Kurdistanê dike. Îran gefan dixwe, esker li ser hidûdên Kurdistanê kom dike.

Lê rûdan bi giranî ber bi wê ve diçin ku ihtîmala şerekî di navbera Heşda Şaabî û Pêşmerge de ji ya êrişeka Tirkiye an Îranê a Kurdistanê bêtir e.

Ku rasyonel bifikiriya, diviya Tirkiye dûrî krîzeka li gel Herêma Kurdistanê buya. Kurdistan dost û ciranekî biewle yê Tirkiyeyê bû (hê ji di vê mihaweleyê de ye), ji Îrana ku malxwetiya PKKê dike, li Suriyeyê û Libnanê bi hilaleka şîe dorlê dipêçe û li hundur bi riya Ergenekonî û Avrasyayiyan dest tê werdide ji bi ewletir bû.

Tirkiye bi Rusya û Îranê re li hev kiriye ku li Suriyeyê mittefikên xwe bêçek bike, bi desthilata Esed re li hev bine. Vê siyasetgorînê berê wê daye xetera şerekî dûvdirêj jî.

Krîzên wê yên li gel DYAyê û Ewropayê kûrtir dibin, gihiştine qutbûna peywendiyan, heta pevçûnên aborî, diplomatîk û siyasî yên waren stratejîk. Serokkomar rasyoneli daye der, xwe sipartiye hêzên Ergenekonî – Avrasyayî - MHPyî ku li pey derxistina Tirkiyeyê ji Rojava ne û şerekî li gel kurdên herçar parçeyan pêj dikin.

Îran li pey hegemoniya mezhebî ye, li Iraqê, li Suriyeyê, li Libnanê û li Yemenê gelek çeper bidestxistine, rabûna îşteha wê nahêle ew bi aştiyê û asaniyê vekişe. Lê îdareya Amerîkayê ya nuh amadeyiyên tengavkirina Îranê ji bo vekişiyana ji welatên binavkirî dike. Ev, daxwaza Îsraîlê, Siûdiyê û hevbendên wê, Misirê û Urdunê, Erebên sunne yên Iraqê û Suriyeyê ye jî. Tehdîdeka aktîf a mezin û nêzîk li ser Îranê derbuye. Tehdîd, her çendîn Ewropa ne li gel be jî dikare bigihîje asta abloqeyeka din a aborî, diplomasî û siyasî, hetta bêîstîqrarkirina wê, mihaweleyên serhildanên miletên bindest, şerekî navxweyî û teşebusên hilweşandina rejîmê.

Îran biewletir dibîne ku ji dêlva li nav welat, li derve; li Iraqê, li Suriyeyê û welatên din ên binavkirî pêşwaziya van tehdîd û êrîşan bike. Loma pijkirina Heşdê Şaabî ya şerekî ser Kurdistanê nêzîktirîn û xetertirîn tehdîd e li ser Kurdistanê. Bi hêviya ku deverên nakok ji Kurdistanê bên standin Tirkiye û Suriye jî dikarin veşartî û biwasite piştgiriyê bidin vê pijkirinê.

Mixabin, li Kurdistanê bi xwe jî du-sê navenden ciddî yên hessas êdî bi aşkereyî piştgiriya vê planê dikin, çi ji ber berjwendiyên aborî û siyasî yan jî hustuxwarkirina li Îranê be, çi ji ji hêviya xapînok a ku belkî ev rê veke da Kurdistan li gel Bexdayê bimîne û ev ji bo kurdan baştir be.

Helbet pijkirineka şer bo ser kurdan di destpêkê de ê bêîstîqrariyeke tirsdar têxe nav Iraqê û Herêma Kuristanê. Kurdistan naxwaze têkeve nav şerekî çekdarî. Hemû mihaweleyên wê ew in da pirsa serxwebûnê ji tê de hemî bi awakî aştiyane û riya diyalogê çareser bibin.

Lê hilbijartina Rêûdirban yekalî nayên tayin kirin. Gava Bexda riya şer bide ber xwe, ji bo parastina ax û rumeta xwe şer bivênevê dibe.

Lê piştî destkeftiyên de facto yên rapirsiyê, Kurdistan êdî gihaştiye qonaxeka xwedan roleka stratejîk a global ku civata navneteweyî; bi DYA, Rusya û YE û bi asta NY nema tehemula têkdana wê dike. Çawa be jî ê rê li ber êrîşeka ser vê statuya nuh-bilindbuyî bê girtin û eger guh neyê dayin ê bi şiddeteka ku di demeka kurt de bitepisîne, bê pûçkirin.

Rol û potansiyela Kurdistana nuh lazim e di du astan de bê dîtin. Yan na, hesab ê şaş bên kirin: Yek jê asta statuya Kurdistana federe ya van deh-panzde salên dawiyê ya bi de factoyiyê bilindbûyî û bi rapirsiyê tehkîmbuyî ye. Di vê statuyê de giraveka, hê rasttir penageheka ewleyî, aramî, aştî û azadiyê peyda buye ku netewe, etnîsite, dîn û mezhebên cuda tê de dihêwirin.

Ev penageh nêzîktirîn çepera liberxweder û pêbawer a şerê dijî DAIŞê û eniya şerê hevpeymenan a şerê germ e. Ew hevkarê esasîn ê şerê dijî terora global û deverî ya civaka navneteweyî ye. Pêgeh her wiha li hember belavbûna hegemoniya mezhebî ya hin navendan û terorora wan e jî, çi niha, çi di êbêyê de. Kurdistan keleya serhedîn ya parastina welatên Ewropayê ji terore ye.

Kurdistan bi enerjiya xwe ya petrol û gazê, ya avên çemên gurr, bi potansiyela çandinî û coxrafyaya xwe jî xwedan nirxeka stratejîk e. Têr pêşçav nebû lê serokê hêzeka global a wek Rûsyayê Putin berî du hefteyan li konferanseka zanistî a ser enerjiye bal kêşa, got ger rê li ber petrola Kurdistanê a derketina bazarên cîhanê bê girtin, ê fiyetê petrole hilkişe. Ev îlana rola global a stratejîk a Kurdistanê ye. Planên Rûsyayê li ser birina gaz û petrola Kurdistanê bo bazara Ewropayê ciddiyeta vê îlanê radixe ber çavan. Ji alî enerjiyên ji avê jî Kurdistan xwedana eynî rolê ye.

Demokrasiya pêkvejiyana hemû etnîsîte, dîn û mezheban jî rola statuya heyî ya Kurdistanê derdixe asta global û qîmeteka stratejîk didiyê. Mixabin Kurdistan tevî rewşeka hêja, gavên xwe yên vî warî di warê hiqûqî de temam nekirine, qîmeta wê baş nayê dîtin. Kurdistan êdî ji bo cîhana misilman baştirîn nimûneya pêkvejiyana demokratîk a xwedî lê derketinê ye.

Statuya asta heyî xwedan roleka stratejîk a global e. Asta duyê, ya serxwebûnê ye ku Kurdistanê dixwazin bigihijinê, wan ji bo wê rapirsî kir. Lê di civaka navneteweyî de hê dudilî û guman li ser vê astê hene. Derket, wext divê heta amadeyiyên vê astê temam bibin û bi gaveka xurt Kurdistan hilkişê. Piştgiriya navneteweyî qels e, gavên avêtî hêrsa ciranan radike, deverê dihejîne.

Ku herdu ast bên dîtin, ê xuya bike ku dudiliya navneteweyî ya li ser asta duyê nayê maneya ku asta yekê bêxwedî û bêparastin e, wek miya avêtiya ber gurên har e.

Kurd divê hey ji van herdu astên xwe hebin, lê dijmin bira bêhtir hay ji wan û ji xwe hebin.

Hesenê Metê:

# Ez ji bo lehengên xwe giriyame!

DARA PORXELEK

“Tekoşer bûm, mîlitan bûm, zîndanî bûm û bûm pêşmerge jî... ku di vê salê min de îro jî pêwîstî bi min û şerekî hebe, dibêjim qey ez ê dîsa vê yekê bikim..” dibêje Hesenê Metê, nivîskarê Kurd û berhemdêr. Di roman û çîrokên xwe de Hesenê Metê teswîreke îlahî dike û mirovan dişîne cîhaneke xeyalî. Dema mirov nivîsên wî dixwîne geh li vê dinyayê ye geh jî li cîhaneke bê sînor e. Xeyal hêmana nivîsa wî ye. Weke mînak: “Ku ruhekê şairane bi min re hebûya min ê ji we re bigota cîh û warekî wekî sîngê diya meriv e... Zarokatiya xwe bifikirin, biçin xwe li ser singê diya xwe dirêj bikin serê xwe danin ser wan pêsîrên tije şîrê pak û sipî... Û bikevin xew.” Hesenê Metê ji me re di derbarê serpêhatiya xwe, nivîskariya xwe , lehengên xwe û pêşmergetiya xwe de axivî.

**Hesenê Metê di dirêjahiya emrê xwe de tim têkoşer bûye, ji Ergaxî ber bi Silêmanî, li wir doza pêşmergetî û nivîsandin...**

Belê... Tekoşer bûm, mîlitan bûm, zîndanî bûm û bûm pêşmerge jî... ku di vê salê min de îro jî pêwîstî bi min û şerekî hebe, dibêjim qey ez ê dîsa vê yekê bikim. Lê ev hemû periyodên ku ez jê bihurîm, wer bawer dikim ku ji bo min bûn dewlemendî. Bifikire ku meriv bi hemû awayî jiyana Kurd û Kurdistana li her çar parçeyan bibîne.

**Lehengên Hesenê Metê tim di lêgerînê de ne. Bi giştî jî li hember civakê serhildêr in. Gelo Hesenê Metê dema lehengên roman û çîrokên xwe diyar dike û wan dide axaftin di çi derûniyê de ne?**

Ez nikanim bahsa lehengekî bikim ku ji jiyana xwe, ji jîna xwe, ji hebûna xwe û ji rewş û gidîşata dinyayê razî ye. Lehengekî bi van xisûsiyetan pêwîstî bi min û nivîskariya min nîne. Çi dimîne? Lehengên nerihet, lehengên nerazî. Lehengên ku kêmasiyan dibîne an jî kêmasiyên xwe hene... lehengên ku weke herkesî nafikirin û naxwaze weke herkesî bijîn, ew dewlemendtir in. Lehengên mîr û mezinan, maqûl û kamilan zêde bala min nakişîne. Dibe ku derûniya lehengên min zêde ne baş be, lê bawer dikim eva ji ber dilpakiya wan e û ji ber kêmasî û ehmeqiyên der û dora wan e. Û ew jî ji bo min ezîzên hêja ne ku ew bibin leheng.

**Kurteroman ango novel, Hesenê Metê ji ber ku bi xwe re nabîne dirêj binivîse kurtenovelan dinivîse an ev tercîheke edebî ye?**

Baş nizanim ka bê tercîhek e an stîlek e. Lê ku pêwîstî pê tunebe, ma çima meriv tekstê xwe bi çep û rast, bi jêr û jor ve vekêşe û dirêj bike? Di nivîsandinê de gotin û vegotinên zêde tekstê sist dike, xêra xwe tuneye... ne ji bo xwendevan û ne jî ji bo nivîskêr. Nivîsên konsantre, kurt û giran gelek baştir e, ez wusa dibînim, wusa dizanim.

**Tu dibêjî: “Min bi Kurdî nivisî ku ji bilî Xwedê û Kurdan kes nikaribe bixwîne” mebest çi bû di vê gotinê de? Û em dibînin pirtûkên te ji bo Îngilizî, Tirkî, Swêdî hatine wergerandin ev yek li zora xwedê neçe?**

Ew hevokek ji kitêba “Li dêrê” ye. Çend gotinên ji bo Xwedê ye, di deftera dêrê de tê nivîsîn. Ku meriv bixwîne, bawer dikim qest û mebesta wê hevokê jî ew ê were fahmkirin. Lê pêwîst nake ez bibêjim bê mebest çi bû.

**Di hevpeyvîneke te de tu dibêjî nivîs ji ber kêmasî û qisûrên xwedê derketiye holê, ev gotin li gor civaka Kurdî ne zaf tundrew /radîqal e û kîjan qisûr mesela?**

Qest û mebesta ji “civaka kurdî” fahm nakim bê tu dixwazî çi bibêjî. Lê dîsa bibêjim: Dema Xwedê kaînat afirand, welê bawer kir ku her tişt bêqisûr çêbûye. Lê piştî demekê qisûra keç û lawên ademî ferq kir, poşman bû, hêrs bû û tofan jî rakir. (“Û Xwedê pê êşiya û poşman bû ku Wî însan li rûyê dunyayê afirand.” Tewrat: Tekvin 6:6) Dû re gotin daxistin, kelam dan nivîsandin ku keç û lawên ademî li gor destûra wan gotinan tevbigerin. Yanî pêwîstiya gotinên nivîsandî ji ber qisûra keç û lawên ademî dest pê bû, dibêjim. Ku ne ji ber qisûr û kêmasiya însanan bûya, belbî Xwedê kitêbên pîroz jî neşanda. Îcar çima ev dibe radîkalî, çima ev dibe tundrewî û asêwarî? Ma kitêbên pîrozwer ji bo çi daketine? Ji bo ku em pê pezê xwe av bidin? Bêguman ji bo însan qisûr û kêmasiyên xwe sererast bikin, ew kitêbên pîrozwer daketine. Û loma dibêjim, lehengên mîr û mezinan, maqûl û kamilan zêde bala min nakişîne. Lehengên kêmaqil, derewîn, saxik, sextekar û gunehkarên şîrîn, lehengên xwediyê qisûr û kêmasiyan bala min bêtir dikişînin. Nivîsê ew heq dikin, karakterên dewlemend in ew. Belbî Xwedê ji wan ne razî ye, lê ez razî me û ji wan hez jî dikim.

**Hesenê Metê dema karakterên xwe dixe nav guneh û sucdariyê dilê wî naêşê?**

Ji bo novelekê ez tenezûl nakim ku karakterên xwe bixim nav gunehkariyekê û sûcdariyekê li wan bar bikim... Naxwazim ew rûreş û şermezar jî bibin. Lê ew bi xwe welê ne. Ez tenê katibiya wan karakteran wan dikim.

**Em werin ser mijara pêşmergetiya te. Te sê salan pêşmergetî jî kiriye, heta li gor zanîna me, te yekem şanoya xwe jî li Silêmaniyê nivîsandiye û dema ku şano li ser dikê hat lîstin, Mam Celal û Hevjîna xwe jî li wir bûne... Tu dikarî ji me re qala serpêhatiyên xwe û Mam Celal bikî?**

Mam Celal... Xwedê jê razî, du bîranên min ên xweş hene, tenê ji bo min xweş. Min ti carî bahs nekiriye lê bi minasebeta wefata Mam Celal, ez ê tenê bahsa yekê bikim. Ez dîsa vegerim ser ewê şanoya xwe û temaşekirina wî û Hêro xanê. Di şanoyê de min li sazê dixist, sazbend bûm. Saz dibêjim lê ne saz bû. Li ba me saz tunebû. Min bi xwe çêkiribû. Min postê gîskekî kişandibû rûyê beroşekê, min darek lê xistibû weke piyê sazê, min tayên naylon (tayên ku meriv pê masiyan digirin) pê ve şidandibû û min perde lê çêkiribûn. Lê dengekî gelek xweş û dilşewat ji ewê enstrûmanê derdiket... enstrûmana ku min bi xwe îcat kiribû. Piştî ku perdeya şanoyê daket û dawî lê hat, min ev enstrûmena xwe girt, ez çûm pêş Mam Celal û (ji bo ku heval û temaşevan bikenin) bi henekî min gotê:

-Mam Celal, tu î ku dibêjî tu serokê Kurdistana siberojê ye, ma ne şerm e ku ez beroşa Xecê (Hatice Yaşar) didizim, postê gîskekî dikêşime ser û têlên naylonên masîgiriyê pê ve dişidînim?

-Mam Celal yekî welê bû ku bi mîran re mîr, bi zarokan re zarok û bi yekî wekî min re jî yekî wek min bû. Li ser evê pirsa min, destê xwe dirêj kir û got:

Bêyne, wereqeyekê bêyne.”

Min çû kaxizek hanî û da ber. Wî li ewê kaxizê tişt nivîsên û got:

-Biro, beyanî biro be layî tîpî mûziqî.

Grûpeka wan a muzîkê hebû. Sibetirê min ew kaxiza Mam Celal girt û çûm meqera tîpî mûzîqî. Wan bi min dan zanîn ku Mam Celal di kaxizê de daxwaz kiriye: sazek, tembûrek û sentûrek bi çiqas pere ye, agahiyê bidin mektebî darayî (malîye an jî banke). Meqera tîpî mûzîqî jî kaxizek nivîsîn, tev kaxizan Mam Celal dane min ku ez biçime mektebî darayî.

Li wir sî û du hezar tûmenên îranî di kîsekî de bi cîh kirin û dane min. Sî û du hezar tûmenên 1981-82an perekî gelekî zêde bû. Min kîsê peran hanî meqera me. Ji bo ku ez bi serbestî biçim bajarên îranê û li sazekê bigerim, Mam Celal kaxizeke destûrê jî ji min re da çêkirin (weke pasaportê) ku ez biçim îranê û ji xwe re wan enstrûmenan bikirim û bînîm.

Çogeke min bi problem bû. Dema ku bi heft heyşt saetan rê diçûm, gelek dêşiya. (Li Swêdê min emeliyet kir) Bi wî pereyî hevalan ji min re qantirek kirî û ez ketim rê. Bi qasî rêya şev û rojekî min xwe gîhand rêya bajaran. Min qantira xwe teslîmî gundiyekî kir, bi otobusê ketim rêya bajarên piçûk û heta nêzî Tebrîzê çûm. Lê wan hemû cîhên ku ez çûm, min li sazekê pirsî. Lê ji min re bahs kirin ku saz û ew hemû enstrûmanên bi sîm (bi têl) peyda nabe. Ji ber ku heram e, qedexe ye. Ji min re bahs kirin ku şimşat (bilûr) hene. Lê bilûr jî min nexwest, ji ber ku bi kêrî min nedihat.

Di vegerê de, berfekê da rûyê erdê, bûk û bagereke welê li hawordorê peyda bû ku kesekî nikanîbû têkeve rêyan... Pêşmerge jî nedikanîn derkevin rêyan. Asê mam, li meqereke Komela Zehmetkêşan bûm Pêşmergeyê rojane û di demên xwe yên vala de min xwest ez Farisî fêr bibim. Diçûm mekteba zarokan û li ber destê mamoste Rehîmê ji Komela Zehmetkêş fêrî Farisî dibûm. Piştî meh û nîvekê destvala û bêyî saz, bêyî tembûr û bêyî sentûr vegeriyam. Tenê ew zimanê farisî bi min re ma. Mam Celal yekî welê bû... do ew jî çû.

Xwedê bi dilovaniya xwe şa bike û ji buhuşta xwe cîhekî bi qasî çar parçeyên Kurdistanê bike para Mam Celal. Amîn!

**Em dizanin jiyana Kurdan tim bi êş û elem e, lê belê pênasekirina nivîskarekî bi nivîskariya êşê ne giran e? Ji te re dibêjin nivîskarê êşê, ev yek li ser milê te barekî çawa çêdike?**

Belê, hinek welê dibêjin. Nizanim ji bo çi dibêjin lê ez bawer nakim ku ew dixwazin barê êşekê li ser milên min deynin. Dibe ku ew bi xwe êşeke welê ji nivîsên min hîs dikin.

**Çi bi serê evînê hat, çima baweriya Hesenê Metê şikest?**

Bawer nakim xêra bersiva vê pirsê ji kesekî re hebe.

**Dema meriv “Gotinên gunehkar”, “Li dêrê”, “Tofan”ê dixwîne... pirs bi meriv re çêdibe. Gelo Hesenê Metê bawermend e, bawermendekî çawa ye?**

Min ti carî Xwedê înkar nekiriye lê ti carî jî min bawerî pê nehanîye. Bawermendiya min di rewşeke welê de ye.

**Romannûsên Kurd ên ciwan ji otosansûrê şikayetdar in, gelo ev otosansûr li gel we jî heye?**

Ez bawer nakim ku otosansûreke min heye.

**Partîzanî, berjewendiyên partiyan ji pêşketina wêje û hunera Kurdî re astengî dernaxîne?**

Ez nizanim bê berjewendiyên partiyan çi astengiyan ji bo edebiyat û hunerê çêdikin, lê dizanim ku xêra partî û partîzaniyan li hunerê nebûye.

**Li gor te edebiyata Kurdî di kîjan astê de ye?**

Asta edebiyata Kurdî ez bi asta civaka Kurdî dipîvim. Asta kultura civaka Kurdan di çi rewşê de be, huner û edebiyata me jî di wê rewşê de ye. Asta edebiyatê bi hebûna çend şaîr û nivîskarên baş, bi çend dîwan û kitêbên baş cîhê xwe nabîne û hebûna wê jî di siya gelek mefûmên din de wenda dibe. Hene... me şaîrên pir baş hene, me novelîstên pir baş hene, ne zêde be jî me edebiyatnasên pir baş hene.

Lê ku civakek ji aliyê kulturî ve negêhîştibe asteke pêwîst, asteke ku em bahs dikin... em ê nikanibin pîvaneke rast bidin huner û edebiyata xwe jî. Ez ti kesekî gunehkar nakim, tenê bahsa rewşekê dikim. Dezgeh û dewlet tuneye, dezgeh û îdareyên ku hene, ez dibînim ew jî bi siyaseta xwe ti rûmet û rewacekê nadin ziman û edebiyata kurdî. Ku îro weşanxaneyeke me nikanibe hezar liban ji kitêbekê belav bike, ew asta ku em bibêjin jî pere nake. Asteke nivîskariya baş heye, asteke berhemên bilind jî heye... li gor rewşa heyî.

**Eger tu bimirî û ji te bê xwestin ku careke din vegerî dinê lê vê carê di rûhê lehengekî de ev leheng dê kî be? (Lehengên te jî dibin yên nivîskarên din jî)**


Ez qet li tiştekî wusa nefikirîme.

**Dema tu dinivîsî, tu ji bo êşên lehengên xwe digirî? Ev yek qet hatiye serê te?**

Belê. Anuha sê kurtenovel têne bîra min ku di nivîsîna wan de dilê min gelek tenik û zîz bûye.

**Jorge Luis Borges dibêje eger min nenivîsanda minê nikarîbûya bijiyama, Hesenê Metê ji bo nivîsandinê çi dibêje?**

Ez nabêjim min ê xwelî li serê xwe bikira û xwe bikuşta. Bêguman min ê tiştekî din bikira, lê nizanim çi?



“Ev hemû periyodên ku ez jê bihurîme, wer bawer dikim ku ji bo min bûn dewlemendî. Bifikire ku meriv bi hemû awayî jiyana Kurd û Kurdistana her çar parçeyan bibîne.”

## Jiyan û berhemên Hesenê Metê

Hesenê Metê di sala 1957an de li Erxeniya Diyarbekirê hatiye dinyayê. Di yanzdeh saliya xwe de terka gundê xwe kiriye. Demeke dirêj tekoşerî kiriye. Zindanî bûye. Piştî zindaniyê berê xwe dide Silêmaniyeya Başûrê welêt. Li wir demeke dirêj jî Pêşmergetiyê dike. Ev zêdeyî bîst salan e jî li Swêdê dijî. Pirtûkên Hesenê Metê yên ku heta niha çap bûne ev in:

Smîrnoff, novel, 1991.
Labîrenta cinan, roman, 1994.
Epîlog, novel, 1998.
Ardû, çîrokên gelêrî, 1991.
Tofan, novel, 2000.
Keça Kapîtan, Pûşkîn (werger) 1998.
Merivên reben, Dostoyevskî (werger) 1991.
Jiyana rastîn, Göran Tunström (werger) Weşanxana Apec, 2004
Ansîklopediya Zarokan, Weşanxana Apec, 2004
Gername, Weşanxana Apec, 2005
Gotinên Gunehkar, roman, Weşanxana Avesta, 2007
Li Dêrê, roman, Weşanxana Nûdem, 2011
Pêsîrên dayê, novel, Weşanxana Apec, 2013.
Îşev û çîroka dawîn, novel, Weşanxana Peywend, 2014.

## Dixwazim xwendekar di nava bûyerê de be

**Di romanên te de tu bi giştî bi xwendekarên xwe re diaxivî û şîretan jî li wan dikî, gelo ev yek dibe pirek di navbera te û xwendekarên te de?**

Ez baş nizanim... dixwazim xwendevan bêtir di nava bûyerê de be û bûyerê ji nêzîk ve bibîne, hîs bike û bi samîmiyeta gotinên min bawer bike. Lê hêvî dikim tiştên ku ez dinivîsim weke şîret neyên qebûlkirin û qest û mebesta min jî ne ew tişt e ku şîretan bikim û rê bidim ber hinekan. Daxwaza min tenê vekirin û raxistina rewşekê ye... rewşeke veşartî, rewşeke vedizî. Ku xwendevan ji xwe re tiştekî ji vê rewşê derxe, lê hûr bibe, li ser bifikire û jê kêfxweş bibe... ew karê wan e, ew daxwaza wan e. Ma ez çima bixwazim xwendevan ji êşa min kêfxweş bibe? Ma kêfa kê ji êşa yekî din re tê?

---



CIWANMERD KULEK

Penaber

Di nav welatan de ê ku di vegera wê de herî pirr li baholên xwe dimînim heyirî Brîtanya ye. Heta roja min î çûnê tê, dîtina ku dibînim min lodek pirtûk kirrîne û li xwe kirine bar. Sebra min pirr lê tê ku li nav kitabfiroşên ingilîzî bigerim. Bi min kitabên herî xweşik bi ingilîzî tên çapkirin. Qesda min ne yekser naveroka kitaban e, behsa berg û kaxet û dizayna wan dikim. Şêwe û nîgar û kalîteyeke wiha anîne ji kitaban re ku dema li nav kitabfiroşxaneyên mezin digerim, bêyî ku neçar bibim li navan binerim, pêjn û bêhna kitaba baş dikim, ciyê kitaba bi dilê xwe tavilê dibînim. Cûrbecûrî û dewlemendî mirov ji ser xwe dibe, zîrekiya artîst te pê dihesîne ku li naverasta globê, li merkeza cîhanê yî. Bergan miz didî, pelan diqulipînî, tîpan dişopînî û dilê te lê rûdinê, tu wê jî dixî bin çengê xwe. Weke ku parçeyekê ji cîhanê bi dest dixî. Wiha wiha ha tu dibînî li malê te bênderek dagirtiye.

Ev bedewiya di sêwirandina kitabên bi ingilîzî de, helbet sebebên xwe yên bi hêz û dewlemendiyê re heye. Lê bi tarîx û rabirdûyê re jî heye. Weşanxaneya yekemîn a cîhanê di 1584an de, dîsa li vî welatî û bi vî zimanî, bi weşanên Zanîngeha Cambridge, Cambridge University Pressê dest pê kiriye. Yanî hinga ku melayekî Kurdistanê mijûl bû bi nivîsandina berhemeke xwe yê ku qet nehata çapkirin û kişifkirin. Herçî ji alî nav û hejmara kitaben bi ingilîzî ye, berfirehî û rengîniyeke berbiçav heye di wan de. Di her mijarê de, ji her qunca cîhanê, ji her qewm û milletî berhem peyda dibin di vî zimanî de. Belkî di serdemên modern de cara yekem bêyî faktora wergêranê ev diyarde rû dide. Zimanê ingilîzî di nav zimanên cîhana rojava de yek ji wan zimanan e ku herî kêm wergêr bo wan tê kirin. Rêjeya wergêrê li Brîtanyayê %3-4an derbas nake û li DYAyê di biniya vê de ye jî, tevî ku li welatên wek Frensa ev digihêje heta %15an. Wate, em ê tişta malûm dubare bikin: ingilîzî bûye zimanê cîhanê, ne tenê zimanê ingilîzan e.

Bi kitabên ku min barê xwe duqat girantir kir li sê trênan siwar bûm heta ku bigihêjim balafirgeha Manchasterê. Di rêwîtiyan de tiştekî ji barê giran bêtir bêhna mirov teng bike tine ye, lê hîn jî kurmên kitaban dihatin min û min di dilê xwe de digot min çima wêya jî û a dî jî nekiriye. Li balafirgeha Manchesterê qiyametek mirov hebûn. Ez li bende bûm ku balafirgeheke wek a Charles De Gaull a li Parîsê be, aram û kêmkes be, lê gava ketim nav min fahm kir ku heta niha min balafirgeheke wiha qerebalix nedîtiye. Li qada xwarin û vexwarinê, ji mirovan, te derzî bavêta nediket erdê. Piştî xwarina etoreke Meksîkiyan a li ser piyan û bîrayeke wan a bi navê Desperados (tenê ji ber lîrîzma navê wê min ew hilbijart), min bi zorê li qehwexaneyekê kursiyeke vala dît û rûniştim.

Li ber maseyên balafirên Tirkiyê ên ji bo bilêtan û teslîmkirina valêzan ji tirkan bêtir ereb hebûn. Pirrên wan dê di ser Stenbolê re biçûna welatên xwe. Xuya bû welatê Brîtanya hîç ti şopek xwe li ser wan nehiştibû û hemû bi cil û kiras û çarşefên xwe, por û rîhên dirêj, ‘eyn wek li gundên bav û kalên xwe bûn. Çend roj berê li Barselonayê û çend meh berê jî li vî bajarê Manchesterê kuştara sivîlan qewimîbû û kiryarên van rûdanan bi kesên nêzîkî –û piştevanê– vê çand û girêdanê dihatin pênasekirin. Gelo di hişê çend kesên li wê derê re ev qewam derbas dibûn gava li wan kesan dimeyzandin? Qerebalixiya balafirgehan ji zêdebûna roj bi roj a koç û rêvingiya mirovan li vê dinyaya gewrik e. Bi vê re pevgirêdan, manendkirin, navûnûçik zêde dibin, mirov gava tiştekî dibîne hezar tiştan di bîr tîne.

Li qehwexaneyê rojnameya The Guardian dixwînim. Rojnameyên ingilîz, beramberî bedewiya kitaban, ne ewqasî xweşik in. Hîn di rûpelê pêşî de malpera The Guardianê tê bîra min û meseleyê fahm dikim. Rojnameyên li ser kaxetê çiqas qels bin jî, malperên wan bêhempa ne. Malpera The Guardianê û hesabê wê yê medyaya sosyal zor baş e û dibêjim xwezî rojnameya Bas jî rojekê bigihêje wê astê. Bêhnikekê difikirim, me The Guardianek, The New York Timesek, El Paisek, Le Mondeek hebûya…

Di rûpelên navîn de meqaleyeke dirêj a Khaled Khalifa (Xalid Xalîfe), romannivîsekî Sûrî, heye. Xalid di karesata Sûrî de, tevî ku der û dora wî hemû diteriqin diçin, bi inyad li Şamê dimîne, li vî welatê ku bi gotina wî 50 sal in ji rûyê rejîma Ba‘as welatiyên wî terka wî dikin, direvin diçin. Gotineke wî ya ku li ser pêla penaberan dike, xuziyê di qirika mirov de dihêle. “Penaber li xerîbiyê terka nasnameya xwe dikin, lê nasnameyeke dî jî wernagirin.” Şerê Sûriya ku 7 milyon mirovên wê neçar man dev ji malên xwe berdin û koç bikin, bobelateke wisa anî holê ku nizanim çendik û çend sal lazim in ji bo ku bêhna mirov were ber mirov û dawiyê bi bînahiyeke kûr lê binere û wê binivîse. Havîna par li festîvala edebiyatê a Maltayê gava nivîskarê Lubnanî Elias Khouri (Ilyas Xûrî) bi kezebeke şewitî behsa vê dramê kiribû û ragihandibû ku ew “piştî cenga cîhanê a duyemîn trajediya herî mezin e di tarîxa mirovahiyê de,” serê min ketibû ber min û çûbûm şeveke dûr. Şeveke dîsa li ser axa Brîtanya. Cara yekê bû hatibûm vî welatî. Li Londrayê, şevek berî ku ez vegerim, ligel helbestkar Ehmed Huseynî em çûbûn mala penaberan a ku mamosta û şêwekarekî kurd ê ji Şamê lê dima. Destpêka şerê Sûrî bû, lê wê demê kesî ji me nizanibû destpêk e, piştî ku mirov li dirêjbûna wê ya heta niha dinere. Şêwekarê ku navê wî naye bîra min li bende bû ku mafê rûniştinê wergire û dû re jina xwe û zarokên xwe ji Şamê derxe bîne bal xwe. Şevbuhêrkeke xweş û dirêj bû. Derbirrîna ku wê şevê Ehmed Huseynî li ser rewşa Sûrî û serhildana wê kiribû ji bîra min neçû. “Eger ew kesên ku serê pêşî ji bo demokrasî û azadiyê li hember Es‘ed derketin meydanê îro sax bûna,” Huseynî got, mirûzê wî yê wek teyrekî baz ê li çiyayên Kurdistanê ji nişka ve daketibû, “wê hezar nalet li wê rojê bikirina ku derketin derve.” Şoreşa azadiyê hatibû dizîn, û îro kes nema dikare li miriyê xwe jî bigirî.

Welatê çiyayên bi berf:

# Erzirom



MEHMET ALİ AYDIN

Geştiyarên rote-nenas dizanin, gelek gencîneyên ku hê dest li wan neketiye hene li deverên dûr. Cihên ku tu kes nizane, neçûyê û nedîtiye lê tu kîjan kevirî rakî di binê wê de mûcîzeyeke xwezayî derdikeve. Cihên herî bi gencîne cihên ku kêm kes çûnê ne. Cih û warên ku hatine jibîr kirin, kêm caran kes qala wan dikin, herî zêde ew dever heq dikin ku mirov wan hîs bike, biramûse û bêhn bike...

Erzirom jî warek ji wan waran e. Ji bo wan kesên ku wir ji xwe re kirine mesken diyariya herî mezin ya xwezayê ye. Gerdûnê weke tabloyekê çiya, kevir û ax nexş kiriye. Demsala herî sar jî bi delaliya xwe, xwe sipartiye axê. Heft alem ji vê deverê derbas bûne. Bajar weke festîvala çand û xwezayê bi çandên cuda hatiye xemilandin û ji xwediyên xwe re bûye diyarî.

Xwediyên bajêr jî xwedayîna gerdûn û çandê bê bersiv nehiştine û ji çanda mitbexê bigirin, zinaatên hêjayî şevên biharî, mîmarî û xweşikiyê bajarê xwe xemilandine. Bi keda xwe, xwêdana xwe xwedî li bajarê xwe derketine Ji ber vê yekê ye dema qala Erziromê tê kirin ji bo yê bajar dinase, çiyayên bi berf û dûxan, dehan gencîneyên çandî, kevirê oltû, kaşkirin û xwarinên pir bi lezzet tên bîra wan. Erzirom ji bo yên ku wê dinase, her ketre çargoşeyê wê bêyî gerê hîskirineke kêm ji jiyanê ye.

**Navenda geştiyariya zivistanê**

Erzirom bi taybetmendiya xwezeya xwe, bi dirêjahiya 5 mehan ji bo kaşkirinê misaîtbûna wê, qalîteya berfê, pîstên dirêj û tesîsên xwe li Başûrê bajêr bi dirêjahiya 70 km û bi firehiya 25 km ku deverekê digire nav xwe Çiyayên Palandokên cara yekem di sala 1993an de weke Navenda Geştiyariya Zivistanê hat îlan kirin. Ji wê rojê ve jî Palandoken, Konakli û Kandillî yên navendên kaşkirinê di xizmeta werzîşa kaşkirinê de ne. Bi salonên xwe yên qeşemê, quleyên xwe yên xweavêtinê her roj ev navendên kaşkirinê pêş dikevin û ji meha Mijdarê heta meha Nîsanê ji bo kaşkirinê misaît in.

Palandoken bi berfa xwe ya taybet ku ji bo kaşkirinê misaît e, avûhewaya xwe di dirêjahiya demsala kaşkirinê de misaît e. Taybetmendiyên avûhewayê ji bo werzîşa zivistanê gelekî misaît e. Demsala zivistanê nêzîkî 5 mehan didome û pileya germê jî di binê -5, -9 oC de ye. Çiyayên Palandokenê ji bo hereketên werzîşa zivistanê û geştiyariya zivistanê, ji bo Tirkiyeyê di pileya yekemîn de girîng in. Bi taybetmendiya xwe ya stîla azade û geştiyariya zivistanê jî weke îstasyoneke navnetewî ye Palandoken. Di sala 2011an de ji bo 25. Lîstikên Zivistanê yên Zaningehê yên Cîhanê mazûvanî kir û bû navenda sereke ya cîhanê ji bo geştiyariya zivistanê. Di cîhanê de pîstê herî dirêj û herî kaş li Navenda Kaşkirina Palandokenê ye. Ev yek jî ji bo Paraşûtvaniyê, çiyageriyê, Snowtube û paîntballê jî guncaviyê dide mêvanên xwe. Ji bo pêşbirkên kaşkirinê jî ji aliyê Federasyona Navnetewî ya Kaşkirinê (FIS) du pîst hatine tescîl kirin. Di hemû pîstan de 12 hezar kes bı hev re dikarin kaşkirinê bikin. Li hember metirsiya şepe bikeve jî pergala "Gaz-Ex" hatiye ava kirin. Li Navenda Kaşkirinê ya Palandokenê ji her sewiya mirovan re xizmet heye û gelek deverên ku mirov lê bimîne hene. Ji balafirgehê tenê 15 km dûr e û tenê 4 km ji navenda bajêr dûr e.

**Kevirê bi şîfa: Kevirê oltû**

Kevirê Oltû ji navçeya Oltû ya Erziromê derdikeve û bi kêrî çêkirina bazin, qolye, tizbî, gohar, pîpo û hwd tê. Kevirekî bi qedir e. Navên wê yên din jî Embera Reş, Înciya Reş in. Cûreyek ji lînyîtê ye ku bi karbonê dewlemend e. Ji ber ku derxistina wê peydakirina wê zehmet e qedrê wê pir ne zaf e. Bi giştî rengê wê reş e. Li Bakurê navçeya Oltû, li qeraxê çiyayê Dutlu, li gundên Başûr rezerva vî kevirî pir e. Li gel vê yekê ev kevir li Gurcistan û derûdora wê jî bê derxistin jî qelîteya wê ne zaf e. Pir dişibe kevirê Rûsî lê dema mirov li giraniya wan dinêre mirov dikare ji hev cuda bike. Kevirê oltû li gor kevirê Rûsî sivik e. Li seranserê cîhanê kevirê herî bi qelîte yê Oltû li navçeya Oltû ya Erziromê derdikeve. Gelê herêmê ligel cotkariya xwe di navbera mehên Cotmeh – Adarê de di ocaxên halîhazir de kevirê oltuyê derdixin û debara xwe pê dikin. Ji ber ku kevirê oltuyê bi demsalî tê derxistin pirsgirêka daringê jî derdikeve holê. Ji ber derxistina vî kevirî ji ocaxan zehmet e, hejmara kesên bi vî karî re mijûl in her diçe kêmtir dibe.

Li gor lêkolînan karîgeriya kevirê oltûyê digihîje çerxa bronzê. Karê kevirê oltûyê ji bavan derbasî lawan bûye û gihîştiye heta serdema me. Di serdema me de bi giştî ji atolyeyên yek kesek dixebitîne karê oltûyê derdikeve. Zanaatkar, bi hunera xwe, tecrûbeya xwe û bi xecer û pecerên oltûyê karekî zêrîn derdixin holê û vî karî ji nifşa xwe derbasî nifşekî din dikin.

Kevirê oltûyê dema ji bin erdê tê derxistin nerm e û heta ku temasî hewayê neke jî bi vî halî ye. Ji ber ku dema temasî hewayê dike hişk dibe, heta asta herî dawî ya karîgeriya wê di nava torbeyekî de di binê axa bi ritûbet de tê mihefeze kirin. Hosteyên herî serkeftî jî dema kevirê oltûyê dinexşînin dizanin ku wê gelekî fîre jê bidin, ji kîloyekî herî zêde 7 tizbiyên 33 morî jê derdixin. Di sala 1989an de veberhêner û zanaatkarên kevirê oltûyê hatine cem hev û Komeleya Kevirê Oltûyê ava kirine. Armanca avakirinê danasîna kevirê oltûyê li seranserê cîhanê û parastina kevirê oltûyê ye. Bi vî awayî bazar û qedrê kevirê oltûyê berfirehtir dibe. Ji bo bazirganiya navdewletî jî destê vebêrhêneran xurttir dike ev hevgirtin.

Kevirê oltûyê ji bo kêmkirina stresê, bidawîanîna depresyonê û şadiya mirov derdixîne holê ji berê de jî weke kevirê bextê (şans) tê zanîn. Ligel van taybetmendiyên xwe jî bi giştî di çêkirina tizbiyan de tê bikaranîn.

Dema hûn weke gerdenî bikar bînin jî enfeksiyona tîrotê ji holê radike û li hember derketina nexweşiya guatrê radiweste.

**Xelata bajarê herî bitendûrist gihîşt Erziromê**

Pêşbirka ji aliyê Yekîtiya Bajarên bi Tendûrîst ve ku her sal li dar dikeve di Pêşbirka Bajarên Herî Bi Tendûrîst de bajarê Erziromê xelat wergirt. Projeya bajarên bi tendûrîst ji xalên; Rolgirtina di projeyên berpirsyariyê, plansaziya bi tendûrîst, der û dora bi tendûrîstî û jiyaneke bi tendûrîstî pêk tên. Di vê pêşbirkê de 103 projeyan cih girt û Erzirom jî ligel Îzmîr, Samsun, Gebze û Ûrlayê bajarê herî bi tendûrîstî hat hilbijartin. Sedema serketina Erziromê her çiqasî bajar bûbe bajarê mezin jî cihê ku şênî lê dijîn biçûk, hatûçûna wê hêsan, ava wê zaf, hejmara şêniyên wê kêm in. Ev xal hemû jî dikin ku bajar ji xireciriyê dûr, xwezayî û bi tendûrîstî bijî. Rêjeya sûckirinê jî gelekî di binê rêjeya Tirkiyeyê de ye. Dê merasîma xelatdayînê di 25 – 27 ê Cotmeha 2017an de bi serpereştiya Şaredariya Mezin a Mereşê de di 'Konferansa bajêrên bi tendûrîstî û çavkaniyên avê' bê li dar xistin û xelat bên dayîn.

**Çaremîn bajarê çavdêriyê yê Cîhanê**

Li Navenda Kaşkirinê ya Konakliyê ku bi 25 km ji navenda bajêr dûr e li ser Palê Karakayayê ye ku bilindahiya wê digihîje 3 hezar 170 metreyî di sala 2013an de dest bi avakirina Navenda Çavdêriyê hat kirin. Maliyeta Navenda Çavdêriyê nêzîkî 200 Milyon lîra ye. Navê wê Navenda Çavdêriyê Rojhilata Anatoliyayê wê bike ku Erzirom bibe bajarekî çavdêriyê. Tê plan kirin ku DAG di sala 2020an de dest bi xebatên xwe bike. Ev navenda çavdêriyê li Tirkiyeyê yekemîn û li cîhanê jî di nava rêjeya herî pêş de ye. Projeya herî mezin a Tirkiyeyê ye ku niha birêve diçe. Li bendê ne ku ji derveyî welat û ji Tirkiyeyê gelek mirovên zanistê û geştiyar ji bo dîtina vê navendê werin Erziromê.

Dê li navenda çavdêriyê neynika 4 metre xwedî çap, taybetmendiya ku çavê mirovan jê diêşe lê ew dibîne hebe. Ev teleskop wê yekemîn çavdêriya ku dikaribe li ronahiyên sor binêre li Tirkiyeyê be. Teleskopên mezin bi tevahî li Hawaî û Şîlî ne. Dema Şîlî û Hawaî şevê dijîn li Erziromê navarojê ye, ev yek jî ji bo projeyên zanistî bidomin Erziromê girîng dike. Li aliyê din jî Erzirom li ser hêlipan û hêlîlarên (enlem-boylam) ku ferqa roj û şevê ji holê radike dimîne û barana berfê zêde ye, nem kêm e, serma hewayê jî taybetmendiyeke dixe bajêr. Ji ber ku ji bo ronahiyên ji sorê sortir (kırmızı ötesi) hewa sar, berf û paqijiya atmosferê rewşeke îdeal diafirîne.



## Erzirom û cîranên xwe

Bajar yek ji kevintirîn warê jiyînê ye. Di dîrokê de ji gelek şaristaniyan re bûye dergah. Medeniyetên Roma, Kimmer, Îskît, Med, Pers, Erep, Bîzans, Moxol, Sasanî û Îlhan li vî bajarî serwerî kirine. Bi çandên cuda ve hatiye harmankirin û gihîştiye serdema me. 15 navçeyên wê hene. Çat, Xinis, Xorasan, Qereçoban, Îspîr, Narman, Oltu, Olur, Pasînî, Şenkaya, Tekman, Tortum û Uzundere navçeyên vî bajarî ne. Li Bakurê Erziromê Rîze û Artvîn, Li Rojava Bayburt, Erzîngan li Başûr Bîngol û Mûş, li Rojhilat jî Agirî û Qers dimîne.

Ji sedî 63.7 axa wê bi çiya ye. Çiyayên Rîze, Çiyayên Anatoliyayê û Çiyayên Karasu - Arasê yên sereke ne. Li bajêr deşt tenê ji sedî 4 cih digirin. Deşta Erziromê, Deşta Pasînî û Deşta Xinis û Xirbê Karasu - Arasê hene. Di warê avê de gelekî dewlemend e. Karasu (Milên wê: Çaya Dereçeme, Ava Bi Xwê), Çemê Çoruhê, Çemê Oltu, Çemê Tortum, Çemê Aras û Çemê Xinisê di nav sînorê vî bajarî de ne. Li herêmê gola herî girîng a Tortumê ye.

Li Bajêr avûhewayeke zuwa heye. Zivistan gelekî sar û hişk e, havînê jî germ û zuwa ye. Avûhewaya wê bandor li aboriya bajêr jî kiriye. Li bajêr ajalvanî ji cotkariyê zêdetir e. Berhemên cotkariyê jî ji vê yekê bandor girtiye û cûreyên cotkariyê kêm in. Pêdiviya bajarên mezin ên goşt bi giştî ji vî bajarî tê peyda kirin.

Madenên ku ji aliyê MTAyê ve hatine diyarkirin ev in: İspir û Pasînî; Baqir û perlit. Şenkaya; Pirîta bi baqir. Navend: Krom. Aşkale: Kevirê alçiyê, daringê çîmentoyê, manyezit. Oltu: Kevirê Oltuyê, manganez. Çat, Aşkale, Xinis, Şenkaya, Tekman, Tortum: Xwê. Pasînî: Daringê tuxla û kîremîtê.

Pîşesazî li Erziromê pêş neketiye lê zanaat bi piştgiriya sektora dewletê birêve diçin. Ev sektor pîşesaziya qût, pîşesaziya pola, pîşesaziya caw û daristanê ne.

## Cihên taybet ên Erziromê

- Sulava Tortum
- Medreseya Yakutiye
- Çiyayê Palandokenê
- Medreseya Du Mînare
- Mizgefta Mezin
- Gola Tortumê
- Tabyayên Azîziyeyê
- Tirba Abdurrahman Gazi
- Muzeya Arkeolojî
- Bacayên Perîzadeyên Narmanê
- Kelha Hasan
- Sê Kumbet
- Kelha Erziromê



